



Naveroka hejmara 3

Sernivîsar: *Kanîzar* di piralîkirina vekolînên zimanê kurdî de berdewam e

Husein Muhammed: Peyvsazî bi dariştinê (II) û dubarekirinê

Rizgar Behadur: Saxtiman dese le kurdî kirmaşanî

Ferdinand Justi: *Rêzimana Kurdî* ji sala 1880

Dilyar Amûdî: Cînavên kesî di soranî de

Peter Trudgill: Komefnasîy ziman (wergêran: Hesenî Qazî)

Malperên zimanî

Erkên herfekê di kurdî de: A

Emîr Hesenpûr: Kêşey zimanî resmî / Pirsgirêka zimanê resmî

Michiel Leezenberg: Gorani influence on Central Kurdish (Tesîra goranî li soranî)

Zêrîn Xurşîd Selîm: Alomorf di zimanê kurdî de

Sernivîsar

Kanîzar di piralîkirina vekolînên zimanê kurdî de berdeyam e

Xwandevevanên ezîz, dîsa kerem bikin hejmareke nû ya kovara zimannasî û zimanê kurdî, *Kanîzarê* – vê carê hejmara sêyem.

Di vê hejmarê de em çend mijarên berê didomînin û çendîn mijarên nû yên zimannasî û zimanê kurdî radixin ber çavên we xwandevevanên hêja.

Husein Muhammed di vê hejmarê de jî vekolîna xwe ya dûr û dirêj a li ser peyvsaziya zimanê kurdî didomîne. Di vê hejmarê de ew beşa dariştinê (çêkirina peyvên nû bi pêşgir û paşgiran) bi dawî tîne û herwiha bi piralî li ser peyvsaziyê bi dubarekirinê dinivîse.

Rizgar Behadur vê carê jî mijareke kurdiya kirmaşanî li gor teoriyên zimannasî pêşkêş dike. Bi van vekolînên xwe ew hem lehceyeke kurdî ya kêr-vekolandî dide nasîn û hem jî yekem car bi kurdî behsa van mijarên zimannasî dike.

Nivîsara me ya dirêj a vê carê ya bi soranî, nasandina zimannasiya civakî (sosyolingwîstîk) bi qelemê profesor Peter Trudgill e ku Hesenê Qazî ji inglîzî wergerandiye. Em dilxweş in ku vê nivîsara berê bi alfabeke kurdî-erebî belavkirî li vê derê bi kurdî-latînî bixin xizmeta xwandevevanên xwe.

Mijara me ya din a vê carê bi soranî beşek ji nivîseke zimannasê hêja Emîrê Hesenpûr e. Bi armanca baştir sûdwegirtinê em wê hem bi soranî û hem jî bi kurmancî belav dikin. Li pey her paragrafa soranî, wergera wê ya kurmancî jî heye.

Di vê beşê de em du kitêbên zimannasî didin nasîn û berê xwandevevanên xwe didin xwandina wan. Yek jê teza masterê ya keçeke kurd e li ser alomorfan (awayên cuda yên heman pêşpirtik û paşpirtikan) di kurdî de. Ya din jî kitêbeke rêzimana kurdî ji sala 1880 anku berî 135 salan e.

Vê carê em cih didin vekolîneke li ser kurdî ya bi inglîzî jî. Dr Michiel Leezenberg ji me re behsa tesîra goranî li ser soranî dike.

Di hejmara 1 de me bi nivîsekê cih dabû erk û peywirên herfa E di kurdî de. Li vê derê em ê bi 28 nuqteyan behsa wezîfeyên herfa A bikin. Kerem bikin!

PEYVSAZÎ BI DARIŞTINÊ (II) Û DUBAREKIRINÊ

Husein Muhammed

Nasandina peyvsaziya kurdî û herwiha peyvsazî bi guhastin û pêkanînê di hejmara 1 de hatine behskirin. Peyvsazî bi dariştinê ji hejmara 2 ve didome û di vê hejmarê de diqede. Peyvsazî bi dubarekirinê ji destpêkê heta dawiyê di vê hejmarê de tê belavkirin.

II PEYVSAZÎ BI DARIŞTIN (*didome*)

2.3.3. ÇÊKIRINA NAVÊN TIŞTAN JI NAVÊN ENDAMÊN LEŞÎ

Ji navên hin endamên leşî, bi çend paşpirtikên cuda navên hin tiştan tên çêkirin:

- serik → serik
- dest → deste
- bazin → bazine / bazink
- çeng → çengil / çengal
- gerden → gerdenîk
- ser → serok, serek
- (soranî:) milwane (anku “ristik, gerdenîk” ji “mil” ku di soranî de maneya “sto” dide + -wane wek di peyva *sîwane* de)
- çav → berçavk

Paşpirtika herî çalak di vî warî de *-ik* e:

- dest → destik
- çav → çavik
- ser → serik
- pê → pêpik (bi dubarekirina P)
- sermil → sermilk (ritbe, stêrk)

- pişt+sto → pistok (bi kurtkirinê)

Herwiha paşpirtika –e jî di çend peyvan de rol heye:

- dest → deste

Herwiha paşpirtika –il jî bi kêmî peyvekê ji endamên leşî çêdike:

- çeng → çengil

Hem –ik û hem jî –il bi eslê xwe paşpirtikên biçûkkirinê ne. Lê li vê derê ew ne peyvan biçûk dikin lê tiştan dişibînin endamên leşî:

- “serik” anku tiştên wek seran in: “serikekî pîvazê, serikekê kelem”
- “serok” anku kesê di nav komeke mirovan de li serî

Ji bilî paşpirtikan, mirov dikare bibêje ku *dorpirtik* (circumfix) jî navên tiştan ji navên endamên leşî çêdikin. *Dorpirtik* ji du pirtikan yan beşan pêk tên ku yek jê li berî peyva serekî ye û ya din jî li dû wê ye. Di kurdî de *dorpirtika ber...k* di vî warî de li kar e:

- çav → ber-çav-k (eynik, *eyeglasses*)¹
- guh → ber-guh-k (mîkrofonên ku mirov dide ber guhên xwe, *earphones, headphone*)
- pê → ber-pê-k (parçeya ku pê ling tên parastin, *foot cover*)

Lê ev nimûne herwiha dikarin wek peyvên pêkhatî (*compound*) jî bên hesabandin.

2.3.4. ÇÊKIRINA NAVÊN CIHAN

Di zimanê me de navên cihan bi çendîn paşpirtikên ji hev cuda dikarin bên çêkirin, bo nimûne: *-geh*, *-istan* û *-xane* ku vê dawiyê xaseten di zimanê nivîskî de gelek çalak in û peyvên nû jê tên çêkirin: *pirtûkxane, mêvanxane, çayxane, meyxane, bîrexane, qehbexane; kargeh, girtîgeh, xwandingeh, fêrgeh; gulistan, Kurdistan, bûstan, daristan...*

¹ Herwiha li ber *berçavkê* mirov dikare peyva *berrojê* (ji ber+roj+) bi maneya *berçavkên rojê* (sunglasses) jî bi kar bîne.

Mirov dikare lîsteyên pir dirêj ji peyvên bi van paşpirtikan bide. Ev her sê paşpirtik îranî ne, ew bi heman awayî yan jî bi şeweyekî nêzîkî wan di zaravayên din yên kurdî û zimanên din yên îranî de jî hene:

- **-geh:** bi kurmancî herwiha *-gih, -ge, soranî -ge û -ga, farisî -gah, pehlewî -gah, hexamenişi gaðu, avestayî gatu, sanskrîtî gatú.*
- **-xane:** hevrehê kurmancî *xanî, soranî xanû, farisî xane / xanê, pehlewî xanek, îraniya kevn *hanek-*
- **-(i)stan:** hevrehê soranî *-(i)tan, -farisî -(i)stan, pehlewî -(i)stan, hexamenişi -stane-, sanskrîtî -tane-, hemû ji proto-hindûewropî *steh (sekinîn, rawestîn) ku herwiha di peyvên kurdî yên wek *stûn, rawestîn / rawestandin* de heye.*

Ev paşpirtik bi piranî dikevin pey navdêran anku bi wan navdêr ji navdêran tên çêkirin. Lê di çend peyvan de paşpirtik ji rehên cuda yên lêkeran tên avakirin:

- *firoş-geh* (ji rehê dema niha yê lêkera “firotin”)
- *xwandin-geh / xwendingeh* (ji forma ferhengî ya lêkera “xwandin / xwendin”)
- *xwand-e-geh / xwendegeh* (ji rehê demên borî yê lêkera “xwandin / xwendin” li gel navpirtika -e-)

Ji bilî van paşpirtikên çalak, herwiha hin gireyên din jî hene ku navên cihan çêdikin yan jî bi kêmî di dîrokê de çêdikin:

- **-an:** *Behdînan, Botan, Soran, Erdelan...* Vê paşpirtikê di dîrokê de nave hin deveran çêdikin. Di heman demê de wê navê eşîran saz dikir: *Milan, Kîkan, Hesenan, Heyderan...* Di rastiye de ev paşpirtika pirhejmariyê ye, wek *kitêb → kitêban*. Heta vê dawiyê ew di hin devokên kurmancî de di navê *Tirkan* ya bi maneya *Tirkiye* de jî li kar bû.
- **-iye, -ya, -iya, -î:** *Tirkiye, Sûriye, Almanya, Romanya...* Ev paşpirtik ji zimanên ewropî hatiye wergirtin (inglîzî, latînî, yûnanî *-ia*, fransî *-ie*). Ew di çendînan navên welatan de heye lê wek din di kurdî de ne çalak e anku di kurdî bi xwe de peyvên nû çênake. Formeke wê ya kurtkirî *-î* ye ku di navên hin bajarên Kurdistanê de jî heye: *Amêdî, Silêmanî, Urmî...*
- **-ava, -awa, -abad:** Paşpirtika kurmancî *-ava* ya bi maneya “avakirî, ne kavi, ne wêran, ne xopan, ne hilweşandî, ne ruxandî, ne herrifandî” di navê çendînan cihan de heye. *Zorava* navê çendînan gundan li çend deverên cuda yên welatê me ye. Formê heman peyvê ya soranî *-awa* bo nimûne di nave bajarokê *Şeqlawâ* û taxa *Rehîmawâ* ya Kerkûkê de peyda dibe. Forma

farisî –*abad* bo nimûne di navê bajarên Mehabad de heye û herwiha li derveyê Kurdistanê jî pir peyda dibe: bo nimûne Îslamabad li Pakistanê û Heyderabad li Hindistanê. Heman pêşpirtika kurmançî bi forma xwe ya devokî –*ova* ketiye tirkî jî, wek di navê bajarokê Geverê li Hekariyan ku bi tirkî *Yüksekova* ye yan jî *Deşta Çukurova*.

- **-lenda, -landa, -landiya, -land:** Ev varyantên paşpirtikekê ne ku bi inglîzî û zimanên din yê nermanî maneya “welat, -stan” didin û di navê çend welatên ewropî de heye: *Holenda, Îrlenda, Fînlenda...* Ev paşpirtik jî di kurdî bi xwe de ne çalak e anku di kurdî de peyv jê nayên çêkirin, tenê di hin peyvên ji zimanên din de wergirtî de li kar e.
- **-dax:** *Qerejdax, Kurdax, Qeredax, Girîdax / Gilîdax.* Paşpirtika –*dax* ji peyva tirkî *dağ* (çiya) ye. Heman peyv di navê *Kurdax* (“Çiyayê Kurdan/Kurdî” = Çiyayê Kurmênc), *Qerejdax* (“çiyayê qereçan”, Li nêzîkî Diyarbekirê), *Qeredax* (“çiyayê reş”, bi tirkî niha dê “Karadağ” bûya, li Başûrê Kurdistanê ye) de heye. Lê peyva “gilî-” di *Gilîdax* de ne ji “gilî=gazin, itiraz, şikayet” tê. Ew guherîna peyva “girî-” ye anku berê “*Girîdax*” bû. Lê li vir “girî” jî ne bi maneya “girîn, rondik barandin, hêsir barandin” e. Lê ew kurtkirina “*Agirîdax*” e anku “Çiyayê Agirî”.
- **-dizê:** *Qeladizê, Şêladizê, Dizê.* Paşpirtika –*dizê* bi eslê xwe maneya “keleh” dide û hevrehê peyva “dîwar” e. Ev paşpirtik di navê çend bajarokên Kurdistanê de heye: *Qeladizê* bajarokê wilayeta Silêmaniyê ye û *Şêladizê* jî li devera Behdînan e. *Dizê* navê berê yê bajarokê Geverê yê herêma Hekariyan e. *Qeladizê* di rastiyê de totolojî (bi inglîzî *tautology*) ye anku di heman peyvê de du peyvên bi heman maneyê hatine dubarekirin: *qela* (keleh) + *dizê* (keleh).
- **-tepe:** *Qeretepe* (li Başûrê Kurdistanê) û *Qiziltepe* (li Mêrdînê), *Seyrantepe* (li Diyarbekirê). Ev paşpirtika ji tirkî maneya *gir* (çiyayên biçûk) dide û di navên çend deverên Kurdistanê de hene ku li serdema osmaniyên hatine binavkirin.

Ji bilî paşpirtikan, herwiha çend pêşpirtik jî navên cihan çêdikin:

- **me-:** *medrese, mekteb, mesken, mekan...* Ev pêşpirtik ji erebî ye û di erebî de pêşpirtikeke berbelav û biber ya sazkirina navên cihan e. Di kurdî de peyvên ku ev pêşpirtik tê de heyî jî yekser ji erebî hatine wergirtin anku ne di kurdî de hatine çêkirin. Tevî ku ev pêşpirtik di kurdî bi xwe de di peyvsaziyê de ne çalak e jî, lê hejmareke mezin ya peyvên bi vê pêşpirtikê di zimanê me de niha li kar in.
- **dêr-:** *Dêrsim, Dêrelok, Dêrezor...* Ev pêşpirtika bi maneya “dêr” di nave çend deveran de li hemû beşên welatê me hene.

- **qere-**: *Qeredax* (li devera Silêmaniyê), *Qeretepe* (li wilayeta Mûsilê). Ev paşpirtika ji tirkî (bi tirkîya niha *kara*) maneya *bejahî, reşahî, ax, erd* dide û di navê çend deveran de peyda dibe, hem li Bakur û hem jî li Başûrê Kurdistanê.

3. LÊKERSAZÎ

Lêker di kurdî û gelek zimanên din yên îranî de herî zêde bi pêkanîna du yan çend peyvan çêdibin. Yek ji beşên wê lêker e (herî zêde “bûn” yan “kirin” û beşên din jî dikarin navdêr, rengdêr, hoker yan daçek-cînav bin yan jî du-sê ji van bi hev re bin. Li jor di beşa “Pêkanîn” de me bi dirêjahî behsa lêkersaziya bi pêkanîna kiriye.

Li vê derê mijara me lêkersaziya bi dariştinê ye anku bi alîkariya gireyan e. Di kurdî de lêkersaziya bi dariştinê dikare bi alîkariya pêşpirtikan (pêşgiran) yan paşgiran be. Bo nimûne (pirtik hatine qelwandin):

- **bi pêşpirtikan**: **ber**-dan, **da**-ketin, **hil**-girtin, **ra**-kirin, **ve**-xwarin, **wer**-gerandin...
- **bi paşpirtikan**: diz → dizîn, rev → revandin / revîn, xebat → xebitîn / xebitandin

Pêşpirtik û paşpirtik dikarin di heman demê de jî bikevin dor peyvê:

- diz → **ve**-diz-în
- rev → **ve**-rev-**andin**

Pêşlêker û paşlêker hin pêşpirtik yan paşpirtik in ku li gel lêkerên xwerû tînan bikaranîn daku maneyeke piçekê ji peyva xwerû cudatir yan deqîqtir bide peyvê. Ew pêşlêker û paşlêker bi piranî bi eslê xwe hoker in. Bo nimûne, pêşpirtikên “ber-, hil-, ve-” di peyvên “ber-dan, hil-girtin, ve-kirin” de pêşlêker in.

3.1. Lêkersazî bi paşpirtikan

Di kurdî de hin lêker ji navdêran tên çêkirin. Ew dikarin bi paşpirtika *-în* yan jî paşpirtika *-andin* bê avakirin.

Paşpirtika **-andin** herdem lêkerên gerguhêz anku transitîv çêdike:

- rev → revandin
- şewat → şewitandin
- cemed → cemidandin

Paşpirtika **-în** bi piranî lêkerên gerguhêz anku intransîtîv saz dika:

- rev → revîn
- şewat → şewitîn
- cemed → cemidîn

Wek ku tê dîtin, ji eynî peyvan (di nimûneyên me de “rev, şewat, cemed”) bi paşpirtika *-andin* lêkerên gerguhêz û bi paşpirtika *-în* jî lêkerên gerguhêz peyda dibin. Lê herdem herdu awayên lêkerên ne mimkin e ku ji eynî peyvê bê çêkirin:

- nirx → nirxandin
- nirx → *nirxîn (stêrka * li ber peyvê diyar dika ku ew peyv peyda nabe yan jî şaş e)

Carinan jî paşpirtika *-în* ne lêkera gerguhêz lê forma lêkerê ya gerguhêz çêdika:

- diz → dizîn
- diz → *dizandin (peyveke wiha nîne)

Wek encam, mirov dikare bibêje ku formên gerguhêz yê lêkerên wiha çêkirî herdem hene lê forma gerguhêz ya heman lêkerê hin caran peyda nabe.

Herwiha tê dîtin ku hin peyv îranî ne (diz, rev, nirx) û hin jî ji erebî ne (cemed, şewat). Bi marjînalî rehê lêkerê dikare ji derveyî îranî yan jî samî hatibe. Bo nimûne:

- xapandin / xapîn (ji ermenî: xap-êl)

Peyva “xapandin, xapîn” ji bilî kurmançiya navendî û belkî rojavayî, di ziman û zaravayên din yê kurdî û îranî de peyda nabe. Ew heta di kurmançiya rojhilatî de jî nedîtî ye.

3.1.1. Lêkersaziya bi dariştinê ji peyvên xwemalî

Çêkirina lêkeran bi vî awayî ji navdêrên xwemalî (îranî) ne diyardeyeke berfireh û çalak e. Mirov dikare bi hêsanî peyvên wiha di listeyeke kurt de rêz bike:

- bez → bezîn / bezandin
- diz → dizîn
- êş → êşîn / êşandin
- rev → revîn, revandin

Herwiha çend nimûneyên nادر yên bi paşpirtika **-tin** jî hene:

- mîz → mîstin (li gel guherîna Z-ya bilerz bi S-ya bêlerz di bin tesîra T-ya bilerz de)
- rîx → rîtin (tarîxiyên *rîxten*)
- *do- (wek di peyvên “dew/do” û “do[t]mam” de) → dotin

Niha wisa dixuye ku ev lêker (bo nimûne “bezîn, dizîn, revandin, mîstin, rîtin”) ji van navdêran (bo nimûne “bez, diz, rev, mîz, rîx”) peyda bûbin. Lê tarîxiyên ne wiha bûye: di rastiye de “bez, rev, diz, mîs...” jî rehên dema niha yên lêkerên behskirî ne û bi guhastinê herwiha bûne navdêr jî. Anku tarîxiyên ne ev lêker bi dariştinê ji van navdêran çêbûne lê ev navdêr bi guhastinê ji rehên dema niha yên lêkeran peyda bûne.

Piraniya van navdêran kar yan encamên kirinekê ne:

- kar: *bez, rev*
- encamp: *mîz, rîx*

Lê hin caran jî biker in anku ew kes in ku tiştêkî dikin:

- biker: *diz*

Çêkirina karan yan encaman bi guhastina rehê lêkerê ji lêkeriyê bo navdêriyê niha diyardeyeke neçalak yan jî nادر e. Lê bo nimûne vê dawiyê ev peyv hatiye çêkirin:

- nivîs (ji rehê –nivîs- yê lêkera “nivîsîn”)

Lê çêkirina bikeran ji rehê lêkeran di rastiye de di kurdî de diyardeyeke berbelav e:

- stran-bêj (ji rehê –bêj- yê lêkera “gotin”)
- kitêb-firoş (ji rehê –firoş- yê lêkera “firotin”)
- teşî-rêş (ji rehê –rêş- yê lêkera “ristin”)

Lê cudahiya van bikerên ji rehê lêkeran çêkirî li gel peyva “diz” ew e ku “diz” peyveke serbixwe ye lê “-bêj, -fir_os, -rêş” tenê bi hin peyvan ve erkê bikeriyê werdigirin û li kar in.

3.1.2. Lêkersaziya bi dariştinê ji rehên samî

Paşpirtikên –*andin*² û –în xwemalî (îranî) ne, hevrehên wan di zaravayên din yên kurdî de û herwiha di zimanên din jî yên îranî de hene: soranî –*andin* û –în / -an, kurdiya başûrî –*anin* û –în / -an, farisî –*anden* û –îden, zazakî –*yene* û –*nayene*, pehlewî –ent- û –îden, hexamenişi û avestayî –ent- û –*eyiteney*...

Berevajî çêkirina lêkeran ji peyvên xwemalî, dariştina lêkeran ji rehên samî di kurdî de gelek çalak e:

- şewat → şewitîn / şewitandin
- emel → emilîn / emilandin
- sekn → sekinîn / sekinandin

Ev rehên samî bi piranî ji erebî ketine kurdî lê hin jê ne ji erebî lê ji aramî ne:

- xebat (ji aramî ye û di erebî de peyda nabe) → xebitîn / xebitandin

Piraniya van rehan ji sê konsonantan û du vokalan pêk tînin. Gelek caran ew bi vê formûlayê ne: CVCVC (C= consonant, V= vokal). Konsonant dikarin ji bîst û çend konsonantên heyî bin. Vokala yekem adeten E ye, vokala duyem dikare E, A yan I be. Carinan tenê vokalek heye anku reh bo formûlaya CVCC ye:

- sekn, şuxl

Carinan hin vokalên din jî mimkin in:

- şux(i)l → şuxilîn / şux_ilandin

² Di çend peyvan de li gor hin devokan –*andin* (xwendin, stendin).

- ilm → elimîn³ / elimandin

Hin caran jî konsonanta yekem “eyn” (ع) e lê ji ber ku ew di kurdî-latînî de nayê nivîsîn, şiklê rehî bi awayê VC--- tê nivîsîn lê di rastiyê bi awayê CVC--- tê gotin:

- emel [‘emel] → emilandin [‘emilandin]

Carinan rehê lêkerê tenê ji du konsonantan pêk hatiye:

- hel- → helîn, helandin
- şid- → şidîn, şidandin
- tew- → tewîn / tewandin

Di van peyvên de jî bi eslê xwe sê consonant hebûne ku herduyên dawiyê wek hev bûn: h-l-l û ş-d-d- lê di kurdî de ew sivik bûne û tenê yek jê maye loma niha wisa diyar e ku ew tenê ji du konsonantan pêk tên.

Vokala kîteya duyem, eger ne ji xwe l be, dibe l:

- cemed → cemidîn / cemidandin
- xebat → xebitîn / xebitandin

Hêjayî gotinê ye ku hin ji van rehê samî wek navdêr jî di kurdî de hene lê ji hinan jî tenê lêker hene û wek navdêr beramberên wan di kurdî de peyda nabin yan jî peydabûna wan biguman yan nadir e:

- **wek navdêr di kurdî de heyî:** emel, ilm, cemed, şewat, şuxl⁴...
- **wek navdêr di kurdî de neyî:** şid(?), tew(?), sekn...

Lêkersaziya li ser rehên samî (bi piranî erebî) di kurdî de çalak e û sistematîkî ye jî: hem forma gerguhêz û hem jî ya gerguhêz ji her rehî tê çêkirin: gerguhêz bi paşpirtika –andin û gerguhêz jî bi –în. Ji peyvên îranî lêkersaziya wiha hem ne çalak e û hem jî ne sistematîk e: tenê çend navdêr wiha dibin lêker û ji wan jî tenê ji hinekan hem forma bi –andin û hem jî ya bi –în tê sazkirin.

Herwiha carinan –în ne lêkerên gerguhêz lê yên gerguhêz çêdike:

- nirx → nirxandin (lê ne *nirxîn)

³ Di hin devokan de herwiha bi forma “elimtin” heye ku bi paşpirtika –tin hatiye çêkirin. Me ev heman paşpirtik di peyva “mîstin” jî “mîz”ê de jî li jortir dît. Lê wek din çêkirina lêkeran ji navdêrên xwemalî yan ji rehên samî bi vê paşpirtikê diyardeyeke nadir e.

⁴ Di hin devokan de (xaseten li Behdînan) bi forma “şol” e bi guherîna: şuxl → şuhl → şol.

- diz → dizîn (lê ne *dizandin)

Ji çend rehên samî di kurdî de hem bi pêkanîn bi alîkariya lêkerên sivik (*light verbs*) “bûn, kirin” û hem jî bi paşpirtik “-andin, -în” lêkerên nû tên çêkirin. Maneya wan bi piranî ne tam wek hev e.

Carinan ew nêzîkî hev e lê hin caran pir ji hev dûr ketiye:

- qebûl bûn / kirin – qebilîn, qebilandin (xaseten dua ji aliyê Xwedê ve)
- hel bûn (çareser bûn) – helîn / helandin (bûn av yan ron)
- xetim kirin (Qur’an heta dawiyê xwandin) – xetimandin / xetimîn (asê kirin / bûn, sereder nekirin / nebûn, jê dernexistin / derneketin)

3.1.3. Neolojîzm bi paşpirtikên –andin û -în

Vê dawiyê çendîn peyvên bi paşpirtika –andin û hin yên bi paşpirtika –în jî di zimanê nivîskî de ji navdêr û heta carinan j rengdêran jî hatine çêkirin:

- çap → çapandin⁵ (çap kirin)
- tirk → tirkandin⁶ (kirin tirk yan tirkî)
- fehm → fehimîn⁷ / fehimandin (fehm kirin yan dan fehmkirin)

Wek ku tê dîtîn, ev peyv hem ji peyvên heyî yê xwemalî û hem jî yê biyanî tên çêkirin. Ev sazkirina peyvên hê diyardeyeke nû û rûneniştî ye. Herwiha peyvên wiha heta niha bi piranî tenê bi formên xwe yê ferhengî yan herî zêde bi formên ferhengî û rehê demên borî (çapand, kurdan, fehimî / fehimand). Lê çêkerên wan peyvên jî heta niha baş newêriyaye xwe li çemandina van peyvên li gor demên niha û bînan û bilanî û fermanî biceribînin. Niha hê zû ye em pêşbîniyê bikin ka ev peyv dê bimînin û bijîn yan jî wek pelîtankên rojê bimirin.

⁵ Nimûneyek ji bikaranîna vê peyvê: “Mewlûda ku Melayê Bateyî nivîsandiye, ji aliyê wesaxaneya “Firat”ê ve, di sala 1992’yan de, li Stenbolê hatiye çapandin.” <http://www.saradistribution.com/gahirbateyi.htm>

⁶ “Ji bo bihêzkirina nîjadê tirk, bedêl û bihayê wê çî dibe bila bibe divê kurd bîne tirkandin.” http://www.amidakurd.net/qunciknivis/hefteya_maf%C3%AA_mirovan_4

⁷ “Hawa tu dibînî ku, her saet mîna wê tebdîla diyar ku eqlê te qebûl nake pirr inqilaban û tebdîlan dibin. Ji vê berhevbûn, belawbûn û ji van halan tê fehimîn (fehmkirin) ku, di nav van ictima'an, belawbûnan, teşkîlan, texrîban ên bi sur'et ku xuyan dikin meqsedekî din heye.” <http://kurdinur.blogspot.fi/>

3.2. Lêkersazî bi pêşpirtikan

Pêşlêker (preverb) ji wan pirtikan re tê gotin ku dikevin pêş hin lêkeran in. Şertê hesibandina pêşpirtikekê wek pêşlêker ew e ku ew pêşpirtik ne tenê carekê dikeve pêşiya lêkerekê lê li gel hejmareke berçav ya lêkeran dubare dibe û kê-m-zêde heman maneyê yan yan ji çend maneyên dubarebar dide lêkerê.

3.2.1. Pêşlêker

Di kurmancî de hebûna van pêşlêkeran bêguman e:

- **ber**⁸:
 - ber-dan, ber-bûn, ber-ketin ...
- **da**⁹:
 - da-girtin, da-hatin, da-xistin, da-ketin...
- **der**¹⁰:
 - der-ketin, der-xistin, der-anîn, der-kirin...
- **hil**-, **hel**¹¹:
 - hil-girtin, hil-ketin, hil-kişandin, hil-weşandin, hil-avêtin, hil-dan, hil-anîn...
- **ra**¹²:
 - ra-bûn, ra-kirin, ra-ketin, ra-xistin, ra-girtin, ra-dan, ra-hiştin...
- **ve**¹³:

⁸ Di soranî û kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de jî wek "ber-" heye. Ji bilî "ber-" ya pêşlêker, "ber-" eke din heye ku maneya "berhem, tov, zarok, têtjik" dide ku ne pêşlêker e lê navdêrek e ku li gel hin lêkeran lêkerên pêkve (hevedanî, compound) pêk tîne, wek "ber avêtin, ber anîn". Ji aliyê etîmolojî ve "ber-" di peyvên bo nimûne "ber-dan" û "ber-avêtin" de ne eynî ye. Lê di nivîsînê de ew jî wek "ber-" a pêşlêker bi lêkera xwerû ve tê nivîsîn. Di vê nivîsarê de, ku mijara me ne etîmolojî lê bikaranîna peyvê ye, reftar û tevgera wan eynî ye anku wek hev diçemin û pêşpirtik, navpirtik û paşpirtikan werdigirin.

⁹ Di soranî û kurdiya başûrî de jî wek "da-" heye. Eslê wê ji paşdaçeka "da, de" ye, wek "ber bi jêr de/da".

¹⁰ Di soranî û kurdiya başûrî de jî wek "der-" heye. Di hin devokên kurdiya başûrî de (bo nimûne li Beyreyê / Bedreyê anku bi devoka beyreyî bûye "er-". Eslê wê ji daçeka yan hokera "der, derve, derê" (ne li hindir/ têt de) ye.

¹¹ Forma "hel-" di kurmanciya rojhilatî de heye (bo nimûne li Dihokê). Di soranî û kurdiya başûrî de jî wek "hel-" heye lê di hin devokên başûrî de bi forma "el-" e. Di zazakî de "er-" e. Di farisî de peyda nabe lê di pehlewî de "ul-", di avestayî de ærəδba, di sanskrîtî ûrdhvá, latînî arduus... hemû bi maneya "bilind, bilindahî" ji proto-hindûewropî * h₂erHd^h- ne.

¹² Di soranî û kurdiya başûrî de heye.

¹³ Di piraniya devokên soranî û kurdiya başûrî de wek pêşpirtik peyda nabe lê wek paşpirtik bi forma "-ewe" (ya formeke nêzîkî wê) heye. Bo nimûne, "ve-warin" ya kurmancî bi soranî "xwardin-ewe" ye û "ve_sartin" jî "şardin-ewe" ye.

- ve-bûn, ve-kirin, ve-dan, ve-gerîn, ve-gerandin, ve-girtin, ve-xwarin, ve-şartin...
- **wer**¹⁴:
 - wer-girtin, (tê) wer-dan, wer-bûn, wer-gerîn, wer-gerandin...

3.2.2. Pêşlêker?

Herwiha hin pêşpirtik hene ku dikarin wek pêşlêker bên hejmartin lê guman li ser pêşlêkeriya wan heye ji ber ku ew tenê li gel yek yan du-sê lêkerên xwerû tên bikaranîn:

- ba-:
 - ba-dan
- çê-:
 - çêbûn, çêkirin
- girê-:
 - girêdan / girê dan
- rû-:
 - rû-niştin
- we-:
 - we-şandin, we-şîn¹⁵, we-standin, we-stîn

"ba-, çê, girê-, rû-" ne pêşlêker bin jî, ew wek pêşlêkeran diçemin. Bo nimûne, pirtika neyînî "ne, na" û pirtika demî "di" dikarin bên navbera pêşlêkerê û lêkera xwerû:

- rû-niştin → rû-di-niştin, rû-ne-niştin, rû-ne-di-niştin
- ba-dan → ba-di-dan, ba-ne-di-dan

¹⁴ Di soranî û kurdiya bas:ûrî de jî wek "wer-" heye.

¹⁵ Pêşpirtika "we-" di peyva "we-şandin" de ji pêşpirtikên din yê berî wê rêzkişî cuda ye. Erê peyva "şandin" di kurmancî de heye (tevî ku ew di kurmanciya rojhilatî de peyda nabe) lê di rastiyê de peyva "we-şandin" ne ji wê ye, ew peyveke serbixwe ye, ne ji "we+şandin" hatiye çêkirin.

3.2.3. Pêşlêkerên dîrokî

Tarîxiyen di kurdî de hin pêşlêkerên din jî hebûn. Ji wan pêşlêkeran ya ji hemûyan berbelavtir mayî "ni-" ye ku maneya wê ya bingehîn liva ber jêr ve ye: "nivistin, nivîsîn, niştin, niximandin/nixamtin..." Bo nimûne, "niştin" ji "ni-" (jêr) + "*sed-" ya proto-hindûewropî ya bi maneya "rûniştin" tê ku di gelek zimanên hindûewropî de niha jî bi wê wateyê ye: sanskrîtî "sîdati", inglîzî "sit, latînî "sido", lîtwanî "sedeti"...

Ji bilî "ni-", herwiha "we-" û "zi-" di çend lêkeran de tarîxiyen pêşlêker in. Bo nimûne, "we-" di lêkerên "westandin/westîn" û "ra-we-standin/rawestîn" de pêşlêkerekê dîrokî ye. "st-" ya di wê de ji proto-hindûewropî "steh-" ya bi maneya "rawestîn, sekinîn" e di gelek zimanên hindûewropî de heye: farisî "istaden", ermenî "stanal", rûsî "stat", inglîzî "stand", latînî "stare", lîtwanî "stoti"...

Pêşlêkera tarîxî "zi-/zî-" di lêkerên "zivirandin/zîvirandin, zivirîn/zîvirîn" de heye. Ew teqrîben maneya "ber-" yan "der-" dide. "-vir-" ya di "zivir-" de hevrehê "ger-"a di "gerandin, gerîn" de ye.

Lê "ni-, we-, zi-" ji pêşlêkerên niha yê wêk "ber-, da-, der-, hil-, ra-, ve-, wer-" di bikaranîna xwe de cuda ne. Ew bi temamî bi lêkera xwerû ve zeliqîne û pirtikên neyînî yan demî tên berî wan, ne navbera wan û lêkera xwerû. Bo nimûne, "di-zivirin, na-nivîsim, ne-di-stand" rast in, ne "*zi-divirin, *ni-navîsim, *we-ne-di-stand".

3.2.4. Çi ne pêşlêker in?

Navdêr yan rengdêrên ku li gel lêkerên xwerû hin lêkerên pêkve (hevedudanî, compound) pêk tînin, ne pêşlêker in. Bo nimûne, "kar kirin" yan "nîşan dan" yan "mezin bûn/kirin" ne lêkerên bi pêşlêker in, lê lêkerên pêkve ne.

Herwiha lêkerên daçekdar (prepositional) jî ne pêşlêker in. Bo nimûne, "lê dan, pê kirin, jê kirin" ne pêşlêker yan lêkerên bipêşlêker in. Lêkerên bi daçekên cînavî jî, wek "pêk hatin, pev çûn, li hev kirin" ne lêkerên bipêşlêker in.

3.2.5. Ji yekê zêdetir pêşlêker li pey hev?

Du yan zêdetir pêşlêker li gel hev li lêkereke xwerû zêde nabin. Lê peyva "veberanîn, veberînan" yan jî forma wan ya sormancî "veberhênan" wisa ye wek ku ji du pêşlêkeran (ve-ber-) pêk hatibe. Lê di rastiye de "ber-"a wê ne pêşlêker e lê navdêrekî bi maneya "berhem, deramet" e.

Herwiha peyvên "daweşandin, veweşandin" wisa dixuyin wek ku ji "da-we-şandin, ve-we-şandin" pêk hatibin anku di wan de du pêşlêker pêk hatibin. Lê di rastiye de "we-" ne pêşlêker e û peyva xwerû "weşandin" e, ne "şandin" e.¹⁶

Lê pêşlêkerên niha dikarin di heman de li gel pêşlêkerên tarîxî peyda bibin:

- ra-we-standin
- rû-ni-ştin
- ve-ni-vîsîn

Di wan de pirtikên neyînî û demî dikarin bikevin navbera pêşlêkerên niha û beşên din yê lêkerê:

- ra-di-we-standin
- ra-ne-we-standin
- ra-ne-di-we-standin

3.2.6. Çemandina lêkerên bi pêşlêker

Di kurmançî de û di kurdî bi giştî de lêker diçemin anku ditewin. Ew pêşpirtikan û paşpirtikan werdigirin. Pêşpirtika dikarin demê, fermanê, mercê yan neyîniyê diyar bikin.

Lêker dikarin pêşpirtikên demî wergirin, wek "di-bêjim" ("di-" wek nîşana dema niha) yan "di-got" ("di-" wek nîşana berdewamiyê), "na-bêjim, ne-got" ("na-, ne-" wek nîşana neyîniyê) yan "bi-ke!" ("bi-" wek nîşana fermanê) yan "(heke) bi-kim" ("bi-" wek nîşana mercê anku şertî).

Herwiha bi pêşpirtikan kes li lêkerê tê zêdekirin, wek "di-k-im, na-k-im" ("-im" wek nîşana kesê yekem yê yekhejmar anku "ez") yan "di-k-î, na-k-î" ("-î" wek nîşana kesê duyem yê yekhejmar anku

¹⁶ Lê wisa diyar e ku "weşandin"ê maneya xwe ya neolojîzm anku wateya "çap kirin, belav kirin" ji tesîra "şandin"ê de û bi texmîna ku ji wê be wergirtiye.

"tu") yan jî "di-k-in, na-k-in" ("-in" wek nîşana kesên pirhejmar "em, hûn, ew"). Herwiha bi paşpirtikan dem tê diyarkirin, wek "kir-i-ye" ("-ye" wek dema borî ya dûdar) û "kir-i-bû" ("-bû" wek nîşana dema borî ya çîrokî).

Wek ku tê dîtin, pêşpirtik yekser anku dîrekt û rasterast bi lêkera xwerû ve tîr girêdan û nivîsîn. Lê me li jor dît ku pêşlêker jî yekser bi lêkera xwerû ve tê girêdan.

Madem ku hem pêşpirtik û hem jî pêşlêker yekser bi lêkera xwerû ve tîr girêdan, gelo heke ew di eynî demê de hebin, mesele dê çawa hel bibe? Kîjan ji wan dê yekem be û kîjan jî bikeve nava wê û lêkera xwerû?

Di piraniya devokan de û di hê jî zêdetir di nivîsînê de, lêkerên bi pêşlêker tîr keliştin û pêşpirtikên demî û neyînî dikevin navbera pêşlêkerê û lêkera xwerû. Peyrêzî di zimanê nivîskî de bi piraniyeke gelek mezin wiha ye:

pêşlêker + neyînî + pirtika demî + lêkera xwerû

Bo nimûne, lêkera "vekirin" dibe:

- ve-ne-di-kir

ku tê de:

- ve-: pêşlêker
- ne-: pirtika neyînî
- di-: pirtika demî
- kir: lêkera xwerû

Lê bi devkî du formên din jî mimkin in:

- nevedikir
- nedivekir

Lê pirtika neyînî divê herdem berî pirtika demî be, loma formên wiha ne mimkin in:

- *dinevekir
- *vedinekir

Herçi pêşpirtika fermanî yan mercî "bi-" ye, wek "bike, bikim", ew hema-hema di zimanê devkî de qet nayê bikaranîn:

- rûne (ne *rûbine)
- vexwe (ne *vexwê)
- (ez) rûnim (ne *rûbinim)
- (tu) vexwî (ne *vexwî)

Hin caran mirov bikaranîna "bi" di hin nivîsan de dibîne. Bo nimûne, li cihê "wergire, wergirim", formên wek "werbigire, werbigirim" tê nivîsîn. Lê wek ku me di nivîseke din de diyar kiriye, ev awayê bikaranînê hîperkorektî ye anku "zêde-rastî" ye ku bi xwe yek ji awayên xelet yên bikaranîna zimanî ye.

3.2.7. Wateyên pêşlêkeran

Wek ku me li destpêkê gotiye, pêşlêker wateya lêkera xwerû piçekê diguherînin. Lê gelo mirov dikare bibêje ku her pêşlêkerê bi xwe wateyek heye ku her cara tê pêşiya lêkerekê xwerû, eynî maneyê dide lêkerê? Yan jî gelo maneya ku pêşlêker dide lêkerê her carê cuda û nepayî anku pêşbînînekirî ye?

Bi kurtî, mirov dikare bibêje ku bersiva herdu pirsan neyînî ye. Anku ne her pêşlêkerê maneyeke neguhor ya herdemî heye û ne jî maneya wê bi temamî nepayî ye.

Lê maneya hin pêşlêkeran jî ya pêşlêkerên din zelaltir û kêmtir-guhor e.

Bo nimûne, pêşlêkera "der-" herdem maneya livîn yan livandina ji hindir ber bi derve diyar dike:

- derketin
- derxistin
- derçûn
- deranîn

Herwiha maneya pêşlêkera "hil-, hel-" (hilgirtin, hildan, hılanîn, hilhatin...) jî teqrîben herdem liva ber bi jor ve ye. Dîsa pêşlêkera "da-" (daketin) bi piranî wateya liva ber bi jêr ve dide.

Lê mirov dikare gelek lêkerên bi van pêşlêkeran bide ku van maneyên bingehîn nade. Bo nimûne, zehmet e ku mirov bibîne ka "dagirtin" bi maneya "tijî kirin" yan "damezrandin" bi wateya "ava kirin" çi têkilî bi liva ber bi jêr de heye. Mirov dikare heman tiştî bo peyvên "hîlbûn, hîlkin" yê bi maneya "agir vêketin/vêxistin" jî bibêje: çawa maneya liva ber bi jor ve dide?

"Wer-" bi maneya xwe ya bingehîn "qulipîn, serberjêr bûn" e, wek di peyvên "wergerîn, wergerandin" anku "qulipîn / qulipandin, serberjêr bûn / kirin". Lê dîsa jî mirov dikare bipirse, gelo çi têkiliya peyva "wergirtin" (bi dest xistin, bi dest ve anîn, standin) bi "qulipabdin / qulipîn"ê re heye.

Gelek caran tê gotin ku pêşlêkera "ve-" wateya dîsa û dubarebûnê dide. Bo nimûne, "vegerîn" dikare maneya "dîsa gerîn/hatin" dide. Lê mirov divê bipirse, gelo çi peywendiya peyvên "vebûn, vekirin" li gel dubarebûnê yan dubarekirinê re heye.

Pêşlêkera "ber-" bi piranî maneya "belav bûn, belav kirin" yan "rê lê vekirin"ê li lêkera xwerû zêde dike. Bo nimûne, "berdan" bi maneya "êdî negirtin, rizgar kirin". Lê heman peyva "berdan" wateya "agir vêxistin, agir avêtin"ê dide. Têkiliya di navbera "belavbûn"ê û "agirvêxistin"ê de hebe jî, ew maneyeke firehkirî ye ku bi dîtina yan bihîstina yekem ne zelal e.

Pêşpirtika "ra-" dikare wek di wateya "ber-"ê bêt hesabandin. Bo nimûne, "ragirtin" (rê li ber girtin). Lê hin caran jî maneya wê ne wisa zelal e. Bo nimûne, "rabûn, rakirin".

3.2.8. Heman wate bi pêşlêkerekê din

Li jor, di bin sernavê "wateyên pêşlêkeran" de, hatiye diyarkirin ku her pêşlêkerê ne tenê wateyeke zelal û neguhor heye lê belkî çend mane hene yan jî hin caran bikaranîna pêşlêkerekê li derekê bi maneyeke nediyar e. Di heman demê de, mirov dikare bipirse: gelo heman wate herdem bi eynî pêşlêkerê tê diyarkirin?

Wek ku hatiye gotin, wateya pêşlêkera "hil-" liva ber bi jor ve ye. Lê gelo liva wisa herdem bi pêşlêkera "hil-" tê diyarkirin. Bersiva vê pirsê neyînî ye: heman wate ne herdem bi eynî pêşlêkerê tê diyarkirin.

Bo nimûne, di lêkerên "rabûn, rakirin"ê mebest bê guman livîna yan livandina ber bi jor ve ye. Lê dîsa jî em dibêjin, "rabûn, rakirin", ne "hilbûn, hilkirin". Bi heman awayî, "da-" nîşana liva ber bi jêr ve ye. Lê dîsa jî "rûniştin" – ku bê guman livîna ber bi jêr ve ye – ne bi "da-" lê bi "rû-" ye.¹⁷

3.2.9. Lêkersazî bi paşlêkeran

Wek ku li jor diyar bûye, pêşlêkeran di kurmançî de û di kurdî bi giştî de jî roleke gelek giring heye. Lê rola paşlêkeran di kurmançiya nivîskî ya bi alfabeya latînî de heta niha kême yan heta mirov dikare bibêje ku nîne.

Sebebê kêmiya rola paşlêkeran di kurmançiya nivîskî de ew e ku di kurmançiya navendî¹⁸ de – ku di bingehê kurmançiya nivîskî ya bi alfabeya kurdî-latînî ye – paşlêker qet peyda nabin. Lê di kurmançiya rojhilatî de û herwiha di kurdiya navendî (soranî) û kurdiya başûrî de (feylî, klehurî, kirmaşanî) bi kêmî paşlêkerek heye.

Di kurmançiya rojhilatî de ew paşlêker "-eve" yan "-ve" ye. Di soranî de ew "-ewe-" ye. Di devokên kurdiya başûrî de li gor devokan ew "-ew, -aw, -ow, -ev, -eve, -ewe, -ewa, -a, -we, -wa" ye.¹⁹

Di soranî û başûrî de ew paşlêker hem maneya pêşlêkera "ve-" ya kurmançî dide (bo nimûne bi soranî "kirdin-ewe, gerran-ewe" bi kurmançî "ve-kirin, ve-gerrîn" in) û hem jî wateya dubarekirinê didin. Bo nimûne, "hat-ewe = dîsa hat, vegerrî".

Di kurmançiya rojhilatî de hem pêşlêkera "ve-" heye (wek "vekirin, veğerandin") û hem jî paşlêkera "-eve, -ve" heye, wek "hat-eve, hat-ve" anku "dîsa hat" yan "vegerrî". Berevajî "ve-" ya pêşlêker – ku gelek caran lê ne herdem maneya "dîsa" û "dubare" dide – "-eve, -ve" herdem wateya "dîsa, dubare" didin.

¹⁷ Di soranî de bi "da-" ye, "daniştin".

¹⁸ Bo parvekirina devokên kurmançî li ser sê pişkan (rojhilatî, navendî û rojavayî) li gor rêzimana wan, binêre: <http://kurdigeh.com/details.aspx?an=501>

¹⁹ Bo bikaranîna pêşlêker û paşlêkeran di kurdiya başûrî de binêre: Ismail KamandÂr Fattah: Les Dialectes kurdes méridionaux: étude linguistique et dialectologique. Louvain, Peeters, 2000, rûpel 456 – 464.

3.2.10. Pirsgirêk

Vê dawiyê bikaranîna "ve-" ya pêşlêker bi maneya "dîsa, dubare" li ber pêşlêkera "re-" ya inglîzî û hin zimanên din hatiye zêdekirin. Mirov dikare wê bi hêsanî li lêkerên xwerû zêde bike: "vedîtin, vedizîn, vegotin, venivîsîn".

Lê di kurdî de gelek lêkerên pêkve yan pêkhatî hene ku ji navdêrekê yan rengdêrekê û lêkereke xwerû pêk tînin, wek "ava kirin, nîşan dan". Yan jî heta lêker dikare ji daçekê, navdêrekê û lêkereke xwerû pêk bê, wek "bi kar anîn, ji bîr kirin".

Gelo em ê çawa bikarin "ve-" li gel wê bi kar bînin. Em dizanin ku mirov lêkera xwerû ya inglîzî "build" (ava kirin) dikare bi hêsanî bike "rebuild" (dîsa ava kirin, ji nû ve ava kirin). Lê gelo em ê çawa "ava kirin"ê bi "ve-"yê bikin dubare?

Dema ku lêker navdêrkirî be, anku mirov "avakirin"ê wek navdêr bi kar bîne (bo nimûne "avakirina xaniyan"), hingê zêdekirina "ve-" li wê ne dijwar e: "veavakirina xaniyan". Lê heke peyv wek lêker bê bikaranîn, hingê em ê "ve-" li kû zêde bikin? "Em xaniyan veava dikin" yan "em xaniyan ava vedikin"?

Heke zêdekirina "ve" li rengdêra "ava" hêsan be, gelo em ê çawa wê li gel daçekên we "bi, ji, li" bi kar bînin: "ve ji bîr kirin, ve bi kar anîn" yan "ji bîr vekirin, bi kar veanîn" yan çî?

Herçî bikaranîna paşlêkera "-eve, -ve" ya kurmanciya rojhilatî ye, ew wek li gel lêkerên pêkhatî ji "ve-" ya pêşlêker hêsanî e: "ava kirin-(e)ve, bi kar anîn-(e)ve" anku "dîsa ava kirin, ji nû ve ava kirin; dîsa/dubare bi kar anîn".

Lê pirsgirêka "-eve, -ve" ya paşlêkera îcar li gel bikaranîna lêkerên navdêrkirî heye. Mirov dê çawa bibêje "dîsa avakirina xaniyan"? Awayê "*avakirin(e)veya xaniyan" yan "bikaranîn(e)veya kompûterê" ne di ti devokên kurmançî de heye û ne jî normal dixuye.

Çareseriyek bo vê pirsgirêkê bikaranîna hem pêşlêkera "ve-" û hem jî paşlêkera "(e)ve" ye. Mirov dikare "ve-"yê li gel lêkerên pêkhatî yên navdêrkirî de bi kar bîne, wek:

- veavakirina xaniyan, vebikaranîna kompûteran

Lê paşlêkera "(e)ve" jî di haletê lêkerên pêkhatî wek lêker de di kar bîne:

- xanî ava kir(e)ve, kompûter bi kar anîve

Wek din jî, paşlêkera ”-(e)ve” ya kurmanciya rojhilatî hêja ye ku neqlî nav kurmanciya nivîskî ya bingeha wê kurmanciya navendî were

3.3. Lêker ji birrên din ên peyvên?

Heta niha me behsa çêkirina lêkeran ji navdêran yan jî ji rehên samî kiriye. Gelo lêker dikarin bi paş- yan pêspirtikan ji birrên din jî yên peyvên peyda bibin.

Vê dawiyê hin hewl hatiye dan ku çend lêker ji rengdêran (hevalnav, sifet, *adjective*) jî bîn çêkin:

- rast → rastandin²⁰ (bi maneya “rast kirin” yan “izbat kirin ku rast e”, gotin ku rast e”, bidin ber “derewandin”)
- aram → arimîn (aram bûn, rehet bûn, hedirîn, hedîn, vehesîn)²¹

Lê çêkirina lêkeran ji rengdêran heta niha diyardeyeke pir bisinor û nû ye. Çend peyvên ji wan çêkirî jî heta niha berbelav nebûne. Ew bi piranî di tekstên werger de hatine bikaranîn û bi piranî jî nehatine çemandin anku tenê bi forma xwe ya ferhengî mane.

Lêkersaziya ji daçek û hokeran jî pir bisinor e. Mirov dikare du-sê nimûneyan bide:

- der → derandin²² (derxistin, anîn derê/derve, nîşan dan, *to take out, to show*)
- hindir (hindur, hundir) → hindirandin²³ (tê de hebûn, hewandin, şamil bûn; kirin tê de, *to include*)

²⁰ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “rastandin”: <http://www.felsefevan.org/wesfen-zanayiya-zanisti.html>

²¹ Nimûneyek ji bikaranîna vê peyvê:

https://m.facebook.com/permalink.php?story_fbid=916301631750815&id=839485579432421&substory_index=0

²² Nimûneyek ji bikaranîna peyva “derandin”: “Rewşa nû, li herêmê di navbera hêzên alîgirê guherînê û hêzên statukoparêz de, têkoşîneke berfireh û sift derandiye holê.”

https://wikisource.org/wiki/Bernameya_Kongreya_Gel%C3%AA_Kurdistan%C3%AA_2003

²³ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “hindirandin / hundirandin”: “Khaled Khayati, bi xebata xwe ya ku xusûsiyetên lêgerîna cih û waran jî dihundurîna ya bi navê “Diasporic Narratives of Serhedî Kurds in France – Memory of Homeland, Refugee-hood and Social Exclusion”ê mexdûriyeta kurdên Serhedê yê li Fransa dijîn a ku li Kurdistanê dîtine, trawma û êşên xwe berdane bin hişmendîya wan bandoreke çawa li jiyana wan kiriye û ev êş û trawma bi çî awayî veguherîna mînakên girîng ên gilî û gazinên vegotina mexdûriyeta diyasporayê. Khayati bi vê xebata xwe di warê civakî de nimûneyeke xweser a lêgerînê pêşkêş dike.” <http://nubihar akademi.com/ji-editor-2.html>

- ji nişkê ve → nişktivîn²⁴ (mat kirin, ecêbgirtî kirin, surprîz kirin, bûn surprîz ji kesekî re, *to surprise*)

4. HOKERSAZÎ

Hoker (zerf, *adverb*) dikarin di kurdî de bi alîkariya pêşpirtik û paşpirtikan bên çêkirin:

- pêşpirtik:
 - o zor → bi zor: *Min bi zor karî wî karî bikim.* (bi zhemetî)
 - o çek → bê çek: *Dijmin revî û pêşmerge karî bê çek wî bajarî bigirin.* (bêyî ku çekan bi kar binin.)
- paşpirtik:
 - o roj → rojane (her roj): *Ew rojane kar dike.*
 - o hêdî → hêdîka: *Ev pîrejin hêdîka dimeşe.*

4.1. Hoker ji navdêran

Pirtika *bi*

Awayê herî berbelav ê çêkirina hokeran di kurdî de bi alîkariya navdêran li gel peyvika “bi” ye:

- bi roj (*daily*), bi şev (*at night*), bi xweşî (*joyfully*), bi şadî (*happily*), bi rehetî (*calmly, in a calm manner*), bi xirabî (*badly*), mêranî (*bravely*)...

Wek ku tê dîtin, hin ji van peyvên bingehîn di eslê xwe de pêşî ji rengdêriyê bûne navdêr û paşî jî bi alîkariya “bi” bûne hoker:

rengdêr →	navdêr →	hoker
xweş	xweşî	bi xweşî
şad	şadî	bi şadî

²⁴ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “nişktivîn”: “Ev babetên han, nişktivîn, gumanî û matbûnê hemiyê dixin di bizavekê de, bi hev ra dikevin livînê û divê mirov vêra biçê û li ser bifikire.” <http://da.netlog.com/kovansindi/blog>

rehet ²⁵	rehetî	bi rehetî
xirab ²⁶	xirabî	bi xirabî
mêr ²⁷	mêranî	bi mêranî

Cudahiya peyvika “bi” di çêkirina hokeran de ji “bi” ya daçek ew e ku peyva serekî li pey daçekê diçeme lê di hokersaziyê de naçeme:

- “bi” wek daçek: bi + hêz → bi hêz-ê (*by force, with power*)
- “bi” di hokersaziyê de: bi + hêz → bi hêz (*forcibly, powerfully*)

Carinan herdu form jî mimkin in:

- bi zor (hemû komik / fraz bi hev re = hoker)
- bi zorê (bi = daçek, zor = navdêr)

Cudahiya “bi” di hokersaziyê de ji “bi” di rengdêrsaziyê de ew e ku di hokersaziyê de ew ji peyva serekî cuda tê nivîsîn lê di rengdêrsaziyê de ew bi peyva pey xwe ve dizeliqe:

- rengdêr: bi + hêz → bihêz: *Ew kesekî bihêz e.* (ew xurt e, ew qewî ye)
- hoker: bi + hêz → bi hêz: *Ew bi hêz şer dike.* (bi xurtî)

Pirtika bê

Dijberên hokerên bi “bi”, bi alîkariya “bê” tên çêkirin:

- bê xweşî (*joylessly*), bê şadî (*unhappily*), bê rehetî (*uneasily*)...

Pirtika “bi” herwiha bi ketina nav peyveke dubarekirî jî hokeran çêdike:

- roj bi roj
- sal bi sal
- cih bi cih

²⁵ “Rehet” û “xirab” a li dûv wê ji erebî ne û bi eslê xwe di erebî de navdêr in lê di kurdî de ew wek rengdêr tên bikaranîn. Formên wan ên navdêr “rehetî, xirabî” ne.

²⁶ Binêrin têbîniya pêştir.

²⁷ Bi eslê xwe peyva “mêr” navdêr e lê li vê derê bi guhastinê bi maneya “wêrek, bicesaret, bisteh” wek rengdêr hatiye bikaranîn û forma wê ya navdêr wek “mêranî” hatiye çêkirin.

- ser bi ser

Em ê paşî di beşa li ser peyvsaziya bi dubarekirinê zêdetir li ser vê rawestin.

Navdêr ne tenê bi alîkariya peyvikên “bi” û “bê” lê herwiha bi hin paşpirtikan jî dibin hoker:

Paşpirtika –ane

Vê dawiyê paşpirtika –ane bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmancî jî û xaseten di zimanê nivîskî de pir tê bikaranîn bo çêkirina hin peyvan ji navdêran. Gelek ji wan peyvan hem wek hoker, hem wek hoker û hem navdêr tên bikaranîn:

- mehane:
 - rengdêr: *kovara mehane* (ya ku her mehê carekê derdikeve, *monthly*)
 - navdêr: mehaneya wî 3 000 dolar e (meaş, muçe, pareyê ku her mehê ji ber karkirina xwe werdigire, *monthly salary*)
 - hoker: em mehane hev dibînin (her mehê, her mehê carekê, di mehê de carekê, *every month*)

Tevî ku ev paşpirtik heta van dehsalên dawiyê di kurmancî de tine bû jî, ew niha di zimanê nivîskî de bi awayekî pir aktîv tê bikaranîn û bikaranîna wî roj bi roj zêdetir dibe.

Paşpirtika -kî

Paşpirtika –kî hin hokeran bi taybetî ji navên gel an deveran çêdike:

- erebkî (wek ereban, mîna ereban)
- ermenkî (wek ermenan, mîna ermenan)

Paşpirtika –kî herwiha dikeve pey peyveke dubarekirî jî û wisa hokeran çêdike:

- paşpaşkî, pêşpêşkî

4.2. Hoker ji rengdêran

Piraniya rengdêran yekser bi guhastinê bêyî ti pêşpirtik û paşpirtikan wek hoker tên bikaranîn (*li beşa li ser guhastinê li pêştir binêrin*). Lê çêkirina hokeran ji rengdêran bi alîkariya paşpirtikan jî mimkin e tevî ku ne pir berbelav e jî.

Bi paşpirtikên -î û -ê

Hin rengdêr di kurmanciya navendî de dikarin bi paşpirtika -î bibin hoker. Di kurmanciya rojhilatî de li cihê wê paşpirtika -ê tê bikaranîn. Di herdu komdevokan de jî mimkin e ku ew heman rengdêr bêyî ti paşpirtikê bi guhastinê wek hoker bînin bikaranîn:

rengdêr →	hoker bi -î	hoker bi -ê	hoker bi guhastinê
gelek	gel(e)kî	gelekê	gelek
hin(d)ek	hin(e)kî	hindekê	hin(d)ek
piçek	piç(e)kî	piçekê	piçek

Paşpirtikên -î û -ê di çêkirina hokeran ji rengdêran de êdî ne berhemdar û çalak in. Mirov nikare ji bilî van nimûneyên li jor (û belkî du-sê libên din) zêdetir hokeran pê ji rengdêran çêke.

Paşpirtika -ka

Çend rengdêr bi alîkariya paşpirtika -ka dibin hoker:

- dûr → dûrka
- hêdî → hêdîka
- zû → zûka

Bikaranîna vê paşpirtikê jî di hokersaziyê de nadir e û zehmet e ku mirov çend nimûneyên ji bilî bibîne.

Paşpirtika –en

Ev paşpirtika bi eslê xwe erebî ye û bi piranî tenê li gel peyvên ji erebî wergirtî heye. Ew hokeran hem ji rengdêran û hem jî ji navdêran saz dike:

- heqîqet → heqîqeten
- ihtimal → ihtimalen
- qetî, qet'î → qetiyen
- waqî' → waqî'en, waqiyen
- tarîxî → tarîxiyen

Carinan rengdêr bi xwe di kurdî de cih negirtiye yan pir kêr li kar e lê hokera jêçêkirî peyda dibe û berbelav e. Bo nimûne:

- teqrîb-en

Hin caran ev hem paşpirtik li peyvên ne-esil-erebî jî tê barkirin:

- dîrokî → dîrokiyen²⁸ (wek wergera “tarîxiyen”)

²⁸ Nimûneyek ji bikaranîn peyva “dîrokiyen”: “Lê ermenî jî hin peyv dane zimanên îranî, bi taybetî kurmancî û zazakî ku dîrokiyen bi ermeniyan re û di nav ermeniyan de hebûne.”
<https://zimannas.wordpress.com/2015/11/19/peyven-me-ji-ku-ten-2/>

III PEYVSAZÎ BI DUBAREKIRINÊ²⁹

Di kurdî û gelek zimanên din de jî hin peyvên nû bi alîkariya dubarekirina peyvên heyî tên çêkirin. Em ê ji vî awayê çêkirina peyvan re bibêjin **dubarekirin** (bi inglîzî *reduplication*).

Dubarekirin dikare temam anku kamil be (*full reduplication*) yan jî pişkî anku beşî be (*partial reduplication*). Di dubarekirina temam de peyva serekî bi temamî tê dubarekirin lê di dubarekirina pişkî de tenê beşek ji peyva bingehîn tê dubarekirin.

1. Dubarekirina temam

Di dubarekirina temam anku kamil (*full reduplication*) de peyva serekî bi temamî tê dubarekirin:

Di kurdî de dubarekirina temam dikare xwerû be (*pure*), binavber be (*medial*) yan jî bidûvik be (*final*).

²⁹ Mijara peyvsaziye bi kurdî baş nehatiye vekolîn. Ez ne haydar im ku heta niha ti lêkolîneke zimannasî li ser peyvsaziya bi dubarekirinê di kurmançî yan zazakî de hatibe kirin. Yek ji kêma lêkolînên di vî warî de nivîsareke Mihemed Mehend û Mesûd Mihemedradî ya bi farisî *بررسی صوری و معنایی تکرار در کردی سورانی (Vekolîna dirûvî û wateyî ya dubarekirinê di kurdiya soranî de)* ye ku di hejmara 3 ya kovara *زبان‌ها و گویش‌های ایرانی (Ziman û Zaravayên Îranî)* ya saziya ziman û edebiyata farisî Ferhengistanê de hatiye belavkirin. Li ser peyvsaziya bi dubarekirinê di kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de jî Ismaîl Kemendar Fettah çend rûpelên kitêba xwe ya bi fransî *Les Dialectes Méridionaux Kurdes* dide mijarê. Me ev lêkolîn jî li ber çavan girtine lê hêjayî gotinê ye ku ji ber zimanên pê nivîsandî (farisî û fransî) piraniya kurdan nikarin sûtê ji wan wergirin. Herwiha hem wan cih nedaye zaravayên din ên kurdî (xaseten zaravaya serekî kurmançî) û hem jî wan jî gelek ji tiştên bingehîn ên peyvsaziya bi dubarekirinê ya di zaravayên mijara wan jî nivîsandî hiştine. Loma em vê vekolîna niha li ber destê we wek zerûriyekê dibînin. Ji bilî lêkolînên behskirî, çavkaniya me ya serekî ya navneteweyî kitêba *Reduplication: Doubling Morphology* Sharon Inkelas û Cheryl Zoll e. Ji ber nêzîkiya gelek mijaran di kurdî û farisî de, me ji çendîn vekolînên li ser peyvsaziya bi dubarekirinê di farisî de jî wergirtiye. Lê dîsa jî di hin mijaran de dubarekirina peyvan di farisî û kurdî de ji hev cuda ye, herwiha gelek ji nimûneyên di kurdî de di farisî de peyda nabin û berevajî. Herçi nimûneyên di vê vekolînê de pêşkêşkirî ne, min bi xwe ew ji xwandinên berhemên kurdî bijartine. Eger nimûne peyveke naskirî û berbelav be, çavkaniya wê nehatiye dan ji ber ku mirov dikare di gelek ferheng û berhemên de bibîne. Eger peyva nimûne nadir an kêmnaskirî be, hingê çavkaniyeke bikaranîna wê hatiye dan.

1.1. Dubarekirina temam a xwerû

Di dubarekirina temam a xwerû (*pure full reduplication*) de peyva bingehîn tê dubarekirin lê ti tiştêkî din lê zêde nabe. Loma peyv xwerû ye û xwerû dimîne. Di nimûneyên me de wate û maneya peyvê di nav kevanan de ye. Li peyv wê peyv di hevokên mînak de hatiye bikaranîn:

- parçe → parçe-parçe (parçekirî, kirî çend parçe): *Kurdistan hatiye parçe-parçekirin.*
- hêdî → hêdî-hêdî (gelek hêdîka): *Ew hêdî-hêdî bi rê ve diçû.*
- yek → yek-yek (her yek bi çarekê, her yek bi tenê, yek li pey ê din): *Mêvan yek-yek hatin.*
- car → car-car (hin caran, carinan): *Em car-car hev dibînin.*
- cuda → cuda-cuda (ji hev cuda, ne wek hev, ji gelek cûnan/coran): *kitêbên cuda-cuda*
- bere (berre) → bere-bere (berre-berre): *Em kar dikin û bere-bere bêhna xwe vedidin.*

Hin peyvên dubarekirî tenê wek dubarekirî hene û peyva dubarekirî bi tenê peyda nabe. Stêrka * li ber peyvê diyar dike ku formeke wisa ya serbixwe di zimanî de peyda nabe:

- *piço → piço-piço (piçek, hinek, hindik, her hinek bi carekê)

Anku peyva “piço” bi tenê di kurmançî de peyda nabe, herdem tenê wek “piço-piço” mimkin e.

1.2. Dubarekirina temam a binavbir

Di dubarekirina temam a binavbir / binavbirr (*medial full reduplication*) de peyva bingehîn tê dubarekirin lê herwiha tiştêk dikeve navbera peyva dubarekirî jî. Ev “navbirk” (navbirrk) dikare pirtikeke girêdayî yan jî peyvikeke serbixwe be:

- pirtikeke girêdayî: *nalenal*
- pirtikeke serbixwe: *roj bi roj*

Çendîn navbirkên ji hev cuda di kurdî de beşdarî peyvsaziya bi dubarekirinê dibin. Li vê derê em wan li gor berhemdarî û çalakiya wan rêz bikin: yên destpêkê pir tîn bikaranîn, ên dawiyê kêmtir yan pirr kêmtir.

1) bi (soranî: be)

Ev peyvîk di peyvsaziya bi dubarekirinê de pir aktîv e û mirov dikare bibêje ku bikaranîna wê di vî warî de hema-hema bêsinor e:

- roj bi roj (her roj): *Roj bi roj lêkolînên li ser zimanê kurdî zêdetir dibin.*
- ser bi ser (beramberî hev, wek bedelên hev): *Me tirimpêlên xwe ser bi ser dan.* (Min a xwe da wî, wî ya xwe da min.)
- bajar bi bajar: *Ew bajar bi bajar çûn heta ku Diyarbekirê gihîştin Dihokê.*
- yek bi yek (her yek bi carekê, yek li pey a din): *Em ê rêbazên peyvsaziya bi dubarekirinê yek bi yek bidin nasîn.*

Piraniya gotinên wiha dubarekirî maneyeke diyar ya pêşbînîkirî didin. Lê hin peyvên wiha çêkirî bûne xwedî wateyên taybet:

- derbider ji “der(î) bi der(î)” anku ji ber deriyekî çûn ber deriyê din. Ew maneya “aware, penaber, bêmal, bêwar” û hem jî wateya “jar, hejar, perîşan, belingaz, şerpeze” dide (kesa/ê ku li ber deriyên xelkê digere û daxwaza alîkariyê jê dike).

Di soranî û zazakî de ev navbirk bi awayê *be ye*, di kurdiya başûrî de (feylî, kelhurî, kirmaşanî) li gor devokan *be yan we ye*. Di n peyvên ji soranî wergirtî de mirov carinan formên bi *be* jî li rex formên bi *bi* dibîne:

- corbecor, cor be cor
- corbikor, cor bi cor

2) -e-

Ev navbirk bi taybetî di dubarekirina denga (*onomatopoetîk*) de tê bikaranîn:

- xişexiş (dengê xişîna dubare yan berdewam)
- dingeding
- xirexir / xirrexirr
- gurmegurm
- miremir / mirremirr
- xuşexuş
- nalenal

Piraniya van dengan jî di kurmancî de yan tenê dubarekirî tên bikaranîn an bi paşpirtika –în yan –andin wek lêker tên xebitandin:

- wek lêkerên gerguhêz (intransîtîv): xuşîn, nalîn, xişîn...
- wek lêkerên gerguhêz (transîtîv): xuşandin, nalandin, xişandin...

Heman deng hin caran bênavbir jî tên bikaranîn anku bi dubarekirina temam a xwerû:

- xir-xir (xirr-xirr), nal-nal, mir-mir (mirr-mirr)...

Di soranî de ev deng dikarin bi alîkariya paşpirtika –e lê bêyî dubarekirinê jî bên bikaranîn:

- nafe³⁰ (nalenal, nalîn)

Lê wek din ev peyvên dengî bi tenê kêr caran tên bikaranîn.

Bi marjinalî -e- hin peyvên din jî dubare dike:

- gir (girs, gird, mezin, zexm) → giregir³¹ (mirovên mezin)

Ji aliyê etîmolojî ve navbirka –e- jî kurtkirina peyva *be* ye ku niha di kurmancî de bi awayê *bi* ye lê di soranî û zazakî de wek *be* maye û di kurdiya başûrî de jî li gor devokan *be* yan *we* ye.

3) -o-, -û-

Di navbera çend peyvên dubarekirî de navbirka “o” yan “û” heye. Gelek caran di nivîsên kurdî de bêbiryarî heye ka peyvên wisa bi kîjan ji van herdu navbirkan bên nivîsîn:

- seroser, serûser (bi lez, ji nişkê ve): *Seroser xwe avêt nav avê.*
- devodev, devûdev: *Devodev ket erdê.*

³⁰ Ev peyv bo nimûney di helbesta navdar a şair Hêmin Mukriyanî *Nafey cudayî* (Nalîna ji ber cudahiyê / xerîbiyê) de heye: <https://rojpress.wordpress.com/2011/06/04/mamosta-hemin-saqiya/>

³¹ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “giregir”: Hikûmeta Tirkîyeyê bi serokwezîrê xwe Erdogan û cihgirê wî Bulent Arınc û gelek giregirên xwe ve van salên dawiyê lêxebitî ko Şivan Perwer qane bike da vegere welatê xwe lê belê bi ser neket. http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=8&ArticleNr=7831#.VIH4wHbqiko

Ji van herdu awayên gelek caran forma bi “û” (serûser, devûdev) tê tercîhkirin ji ber ku texmînen ew ji peyva “û” (wek “ez û tu”) be. Hin caran peyv tenê bi awayê “û” tê nivîsîn û bi awayê “o” nayê dîtîn:

- hetaûheta, heta û heta, heta-û-heta, heta-heta (lê ne *hetaoheta)

Lê tarîxiyên ev navbirk di rastiyê de ne ji peyva “û” ya wek di gotina “ez û tu” de hatiye. Ji aliyê etîmolojî ve ew “o” ye û dîrkoiyên wiha peyda bûye:

- “-o-” ji “-ew-” ji “-we-” ji “we” ji “be” ya bi maneya “bi” wek di gotina “roj bi roj” de (*li jortir li beşa li ser -bi- binêrin*).

Lê formên bi “-û-” ya ji peyva “û” (wek “ez û tu”) di dubarekirina pişkî de heye, bi taybetî jî di dubarekirina bi M de (*li jêrtir binêrin*.)

4) -ê (nêr), -a (mê), -ên (pirhejmar)

Ev navbirk dikeve navbera peyva dubarekirî û wê xurt dike:

- dînê dîn (gelek dîn, bi temamî dîn û bêhiş)
- kerê ker (pir ker, pir bêaqil)
- dêla dêl (jineke/keçeke pir xirab)
- bêaqilên bêaqil (kesên pir bêaqil)

5) -an-, -a-, -ta-, -tan-, -dan-

Ev navbirk çend peyvên dubarekirî pêk tîne:

- seranser, seraser, sertaser³², sertanser³³, serdanser³⁴ (li her derê, li hemû deran, serekî/aliyekî heta sere/aliyê din, gişt, hemû, giştî)
- beraber, beraber

Di peyva “beramber” de N ji ber tesîra dengê li pey xwe anku B bi M guheriye.

Ji aliyê etîmolojî ve ev navbirk ji peyva “ta” bi maneya “heta” hatiye (wek di peyva “sertaser”). Di peyva “sertanser” de N li peyvê zêde bûye.³⁵ Lê T jê ketiye û di varyanta -an- de N lê zêde bûye.

6) -aw-, -a-

Ev navbirk di du-sê peyvên vê dawiyê ji soranî wergirtî de hene:

- corawcor (ji gelek coran, ji pir cûnan, çeşîd-çeşîd)
- rengawreng (rengîn, ji gelek rengan)

Ji aliyê etîmolojî ve ev peyv jî hevrehê “bi” ye û wiha pêk hatiye:

- -aw- ji -ew- ji -we- ji “we” ji “be” ku niha di kurmancî de bi awayê “bi” ye.

Carinan W ji A dikeve:

- rengawreng → rengareng

³² Nimûneyeke ji bikaranîna forma “sertaser”: “Li Başûr banga xwepêşandana sertaserî hat kirin”.

<http://www.rojnews.net/ku/dreje-hewal.aspx?id=25614&LinkID=26&Li-Ba%C5%9F%C3%BB-r-banga-xwep%C3%AA%C5%9Fandana-sertaser%C3%AE-hat-kirin>

³³ Nimûneyek ji bikaranîna varyanta “sertanser”: “Li sertanserê Rojavayê Kurdistanê nerazîbûna li dijî valakirina deverên kurdî xwepêşandan têne lidarxistin.” <https://www.rojawanews.com/kurdish/index.php/kurdistan/item/3383-rojava-news>

³⁴ Nimûneyek ji bikaranîna forma “serdanser”: “ji bo bicîhanîna karûbarên girêdayî parastina aramî û ewlekariyê li serdanserê Iraqê, hate kirin.” <http://www.gov.krd/a/d.aspx?a=28963&l=16&r=240&s=010000>

³⁵ Bo zêdebûna N li peyvan, bidin ber tac > tanc, çok > çok, çawa > çawan, dîsa > dîsan, wisa > wisan, çito (ji “çi tov”) > çiton. Lê li aliyekî din, N dikare bikeve jî: çilon (ji “çi lewn” anku “çi reng, çawa”) > çilo (çawa, çito).

7) -î

Ev paşpirtik jî du-sê peyvên kurmancî yên dubare ava dike:

- çendî çend (pir, gelek): *çendî çend salan*
- hindî hind (pir, gelek)

8) di, der

Navbirka “di” bi kêmî dikeve navbera vê gotina dubarekirî ye:

- dest di dest (bi hev re, pêkve, li gel hev)

Navbirka “der” a hevrehê farisî ya “di” ya kurmancî ye. Ew di çend peyvên ji farisî wergirtî de heye:

- sed der sed, seddersed (sed ji sedê, 100 %, bêguman)
- pey der pey, peyderpey (li pey hev, yek li pey a din)

9) -in-, -în-

Ev paşpirtik ihtimalen tenê di vê peyvê de heye:

- şahinşah, şahînşah (şahê şahan, şahê mezin)

1.3. Dubarekirina temam a bidûvik

Di dubarekirina temam a bidûvik (*final full reduplication*) de peyva bingehîn tê dubarekirin û paşpirtikek dikeve dawiya peyvê. Berevajî navbirkê, dûvik herdem bi paşgir e anku bi peyvê ve girêdayî ye.

Di kurmancî de di dubarekirina temam de du-sê dûvikên serekî û du-sê dûvikên nadir hene:

1) -î

Ev dûvik komeke navdêrên dubarekirî digire û wan dike rengdêr:

- gulgulî (tişta/ê ku wêneyên gelek gulan li ser heye): kirasekî gulgulî
- xetxetî: tişta/ê ku gelek xet li ser hatine nivîsîn yan nîgarkirin
- serserî: ehmeq, tûle, sûte

Hin peyvên dubarekirî yê bidûvik jî hene ku wek peyvên dubarenekirî peyda nabin:

- pinpinî (hem wek navdêr bi maneya “pelatînk, pelîtank, pîrpirîk” û hem jî wek rengdêr bi wateya “nuqte-nuqteyî, tişta/ê ku gelek nuqte li ser hene”, bi inglîzî *spotted*)
- çinçinî (tişta/ê ku nuqteyên ji rengê li ser rengê din hene, bi inglîzî *spotted*)

2) -ok

Ev dûvik hem navdêran ji navdêrên dubarekirî çêdike û hem jî navdêr û rengdêran ji rehên dema niha yê lêkeran saz dike:

navdêr ji navdêran:

- xal (nuqte, spot) → xalxalok (kêzîkek e, *lady beetle, ladybug, ladybird*)
- mar (*snake*) → marmarok (*margîsok, lizard*)

navdêr ji rehê lêkeran

- fir-în (firr-în) → firfirok (bafirok, teyarok, kaxez yan pêlîstokên din yên ku bi benekî ve tîn firrandin, *kite*)
- mêtj- (mêtin, mêtin) → mêtjmêtjok (mostik, mijmijik, êmzik, *soother, comforter, pacifier, dummy*)

rengdêr ji rehê lêkeran

- liv-în → livlivok (tişt/a/ê ku hêdîka yan piçekê dilive)
- hej-în → hejhejok (tişt/a/ê ku dihejheje, dilivlive, dilerize, *shaky*)
- leq-în → leqleqok (tişt/a/ê ne sabit, tişt/a/ê ku xwe baş li cihê xwe nagire, ne qayim e)
- bad-an → badbadok (tişt/a/ê ku li hev hatiye badan, *twisted*)

3) -kî

Dûvika –kî dikeve dûv çend peyvên dubarekirî:

- paş → paşpaşkî³⁶ (ber bi paşve, *backwards*): *birêveçûna paşpaşkî*
- dev → devdevkî³⁷ (dev li pêş, *face down*): *devdevkî ket erdê* (gava ku ket, devê wî bi erdê ket)

4) -e

Dûvika -e di van peyvên dubarekirî de heye:

- kenkene³⁸, girgire³⁹ (herdu peyv bi maneya “mîrovên mezin û xwedîgotin, giregir”, *magnificent, pompous*)

³⁶ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “paşpaşkî”: ji bo Kurdistan serbixwe û sînorên dewletên dagîrker parçe nebin, paşûpê û paşpaşkî li kerên xelkê siwar dibin. <http://www.lotikxane.com/2015/01/07/ji-xelke-re-hekan-ji-kurdan-re-zelqan-dikin/>

³⁷ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “devdevkî”: mixabin Mam Heyder devdevkî dirêjî erdê bû. <http://www.ummetiz.biz/index.php?topic=25214.0;wap2>

³⁸ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “kenkene”: “Erbîl û Mûsil û Kerkûk û Bexda têkvedan û giregir û kenkene neman neçû nik”: <http://www.kulturname.com/?p=56>

³⁹ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “girgire”: “Binêrin; çend parlementer û giregireyên BDPê pêşwazîya Barzanî kirin ya rast jî ew bû, lê heman demê li aliyê din Serokê BDP yê Amedê ber derê avahîya BDPê dijî vê seredanê daxuyanî dida.”

- debdebe, zepzepe (mirovên bi leşê xwe gir û zexm, *huge, giant*)
- zelzele (erdlerizîn, erdhejîn, *earthquake*)

Lê ti ji van peyvan – ji bilî gîrgîre – wek peyvên dubarenekirî peyda nabin loma ihtimalen ev ne dubare ne, tenê bi tesadîfî du kîteyên wek hev di van peyvan de hene. Herçi “gîrgîre” ye jî, guman ji rastiye wê heye ji ber ku ew bi forma “gîregîr” pir berbelav e û ihtimalen tenê ji nezanî wek “gîrgîre” hatiye bikaranîn.

5) -k:

Dûvîka –k di dubarekirinê de bo nimûne di vê peyvê de heye:

- got-in → gotgotk⁴⁰

Heman peyv bi awayê “gotegot⁴¹” jî heye ku bi dubarekirina binavbîrk hatiye çêkirin. Ew herwiha bi şêweyê “gotegotk” jî peyda dibe ku hem navbîrk (-e-) û hem jî dûvik (-k) tê de hene. Lê ji ber ku me ev awa tenê di hin ferhengên de dîtîye, guman ji hebûna wê ya rast heye. Loma em nikarin bibêjin ku ew delîleke bêguman e ku di peyvsaziya kurdî ya bi dubarekirinê de di heman demê de dubarekirina temam li gel navbîrkê û dûvikê peyda bibe.

6) -îk: çîçînîk, pinpinîk

Dûvîka –îk di dubarekirina temam de bi kêmî di van peyvan de peyda dibe:

- pinpinîk, çîçînîk

<http://www.yuksekovaguncel.com/kongereya-netew-amed-barzan-makale,600.html>. Lê forma serdest a vê peyvê “gîregîr” e anku bi dubarekirina bidûvik e (li jortir binêrin.)

⁴⁰ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “gotgotk”: “Mirov dijminê wî tiştî ye yê ku nas neke, vêca eva hanê neyariyekê hindek caran li cem xelkê peyda dike, we kir ku hindek gotgotkên neweyî û nerast li ser êzidiyan bêne gotin.”

<http://www.pen-kurd.org/kurdi/hejar-m/hevpeyvin-mueyed-teyib.html>

⁴¹ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “gotegot”: “Divê keç xwe ji gotegotên civakê rizgar bikin”.

<http://www.kurdistan24.net/ku/interview/23071560-aff5-4ddd-915f-16e1cd9327d8/Div%C3%AA-ke%C3%A7-xwe-ji-gotegot%C3%AAn-civak%C3%AA-rizgar-bikin>

7) -an

Bi qasî ku haydar im, dûvika -an di peyvên dubarekirî de tenê di peyva “carcaran” de heye. Ew jî peyveke çemandî ye û “-an” nîşana pirhejmara çemandî ye. Loma guman jê heye ku mirov bi rastî vê wek dûvikeke dubarekirinê hesab bike yan jî tenê wek paşpirtikeke çemandinê bihejmêre.

2. Dubarekirina pişkî

Dubarekirina pişkî anku beşî (*partial reduplication*) ji wê diyardeyê re tê gotin ku tê de ne hemû peyv lê tenê pişkek anku beşek jê dubare dibe. Di kurdî de adeten peyva serekî li destpêkê ye û di beşa duyem de hinek ji wê peyvê tê dubarekirin:

- tişt → tiştûmişt (hin tiştên, tiştên cuda-cuda)
- mal → malûhal (mal û tiştên têkilî malê, bo nimûne xanî, malbat, jin, zarok...)
- zar(ok) → zarûzêç (zarok û tiştên din ên malê, jin û zarok)
- teq-în → teqereq
- gurm-în → gurmegurm
- nav → navnîşan
- bivê-nevê
- kir → kir û nekir

Hin caran herdu peyv bi nixê xwe wek hev in, mirov nikare bibêje ka kîjan peyva bingehîn e û kîjan jî tenê dubarekirina wê ye:

- gul + giya → gulûgiya (bi mebesta hemû riwek, hemû nebat)
- dûr + dirêj → dûrûdirêj

Dubarekirina pişkî dikare xwerû yan jî binavbirk be. Du dubarekirina pişkî ya xwerû de ti peyvik an pirtik nakevin navbera peyva serekî û peyva bi pişkî dubarekirî:

- bivê-nevê, navnîşan
- teq-req, şeq-şeq, ding-ding

Lê adeten dubarekirina pişkî bi alîkariya navbirkekê peyda dibe. Navbirk di navbera peyvên onomatopoetîkî (zarvekirina deng) de adeten -e- ye:

- teqereq, dingeding, gurmegurm...

Wek din bi piranî peyvika “û” dikeve navbera herdu beşan:

- tiştûmişt, dûrûdirêj, heysûbeys...

Heman û dikare cihê “-e-” ya navbera dengan jî bigire:

- teqereq, teqûreq

Ew herwiha dikare bikeve navbera dubarkirinên pişkî yên xwerû jî:

- navnîşan, navûnîşan

2.1. Di dubarekirinên pişkî de beşa duyem çî ye?

1) Pişka duyem ji peyveke serbixwe

Beşa duyem dikare ji peyveke serbixwe ya ji xwe heyî pêk bê. Dubarekirin di vî haletî de tenê bi hindê ye ku beşek ji peyva duyem bi dengê xwe wek beşa yekem e. Wekhevî dikare li destpêkê yan jî li dawiyê be:

Wekhevî li destpêkê:

- gul + giya → gulûgiya (bi maneya hemû riwek, nebat, şînkatî)
- mişk + mar → mişkûmar (mişk, mar û hemû heywanên wek wan)
- dûr + dirêj → dûr û dirêj
- nav + nîşan → navnîşan / navûnîşan

Wekhevî li dawiyê:

- mal + hal → malûhal
- kar + bar → karûbar

Hêjayî gotinê ye ku peyvrêziya van peyvan sabit û xweragir e, cihê wan nikare bi hev biguhere:

- gulûgiya lê ne *giyaûgul
- mişkûmar lê ne *marûmişk
- dûrûdirêj lê ne *dirêjûdûr

- karûbar lê ne *barûkar

2) Pişka duyem ji peyveke “neyî”

Di hinek ji peyvên bi pişkî dubarekirî de beşa yekem peyveke serbixwe ye lê beşa duyem ji “peyvekê” pêk tê ku li derveyî peyva dubarekirî bi serbixweyî peyda nabe:

- “nîvûnor” (nîvco, tamamnebûyî, tamamnekirî) ji peyva “nîv” a serbixwe û “nor” pêk hatiye lê “nor” bi ti maneyeke têkilî vê mijarê nayê nasîn û zanîn
- “zarûzêç” (jin û zarok, malbat, aîle) ji peyva “zar” (zarok) û “zêç” pêk hatiye lê “zêç” wek peyveke serbixwe peyda nabe.

Hin caran beşa duyem dişibe peyveke serbixwe lê gava ku mirov li maneya peyva dubare difikire, mirov pê dihesa ku ne mimkin e beşa duyem di rastiyê de ji hevdenga xwe ya serbixwe be:

- “dengûdor”⁴² (dengên pîrr bilind û zêde, qerebalix) ji peyva serbixwe “deng” û wek prensîp ji peyva “dor” (dewr, gerr, nobet) a dîsa serbixwe pêk tê. Lê di rastiyê de peyva serbixwe “dar” ti têkilî bi “dor”a di peyva “dengûdor” de nîne.

Eger em peyvên dubare “dengûdor” û “zarûzêç” binêrin, em ê texmîn bikin ku şiklê pişka duyem (-zêç, -dor) tiştekî nepayî û derî qeyd û bendan e. Mirov texmîne dike ku nizane ka ji bilî konsonanta yekem – ku li gor peyva serekî ye – beşên din ne li gor ti rênima û rêbazan in.

Lê gelo ti rê û rêbaz ji beşa duyem re bi rastî jî nînin?

Wek ku me got, beşa duyem yekem dengê xwe ji yekem dengê beşa yekem digire:

- zar → zêç
- deng → dor

Lê beşên din jî ne bi temamî li derveyî qeyd û bendan in an jî qeyd û bendên wan veşartî ne. Kerem bikin li van nimûneyan binêrin:

⁴² Nimûneyek ji bikaranîna peyva “dengûdor”: “Di nav dengûdor û qerebalixê de gotina rastiyê li eniya wan diyar e.”

https://ku.wikiquote.org/wiki/Ronah%C3%AE_ji_dilek%C3%AE_bo_dilan

- dest → destûdar⁴³
- nîv → nîvûnor
- çep → çepûçûr(r)
- xêr → xêrûbêr
- mêş → mêşûmor

Ji van nimûneyan ev qeydên aşkere dibin:

- Di beşa duyem de herdem 3 deng / herf hene
- Dengê yekem ê beşa duyem herdem wek dengê yekem ê beşa yekem e
- Dengê duyem herdem vokalek e lê ne heman vokalek e
- Dengê sêyem ê beşa duyem herdem R ye.

Ev qeyd û bendên giştî ne û mirov dikare wan di hejmareke pir mezin a peyvên dubare yên beşa wan ya duyem ji peyveke neserbixwe pêkhatî de bîn dîtin.

Peyvên wek “zarûzêç”, ku dengê dawiyê yê beşa duyem ne R ye, bi rastî pir kêr in û mirov dikare bibêje peydakirina nimûneyên din gelekî jî dijwar e. Ji xwe mimkin e – lê ne bêguman e – ku “zêç” di rastiyê de ne peyveke “neyî” anku tineyî be lê formeke ji peyva “zewce” (jin, kabanî, bermalî) be ji ber ku “zarûzêç” tê maneya “jin û zarok” (herfiyên: zarok û jin) û peyva “zêç” pir dişibe “zewce”. Dibe ku ev etîmolojiya mihtemel sebebê awartetî û istisnaya wê ji qalibê li jor diyarkirî be.

3) Pişka duyem ji veguhastina bi M

Beşa duyem dikare dubarekirina pişka yekem be lê di beşa duyem de konsonanta pêşîn a peyvê bi M hatiye veguhastin:

- tiştûmişt, tişt-mişt
- ders-mers, ders û mers

Wek ku tê dîtin, dubarekirin dikare xwerû be (ders-mers, tişt-mişt) yan jî bi alîkariya navbirka “û” be (tiştûmişt, ders û mers).

⁴³ Bo wate û bikaranîna peyva “destûdar” binêrin: <https://ku.wiktionary.org/wiki/dest%C3%BBdar>

Hin peyvên wiha cihê xwe baş girtiye û pir li kar in, wek “tiştûmişt” û “hûrûmûr” lê gelek jî “serpê” û “ex tempore” ji hin qisekeran ve di dema axiftinê de tên çêkirin, wek “ders-mers”, “pirteqal-mirteqal”, “tirimpêl-mirimpêl”.

Eger li destpêka peyva serekî ti consonant tine bin, hingê dîsa M dikeve destpêka beşa duyem:

- agir-magir, evîn-mevîn, êvar-mêvar

Eger li destpêka peyvê komeke dukonsonantî hebe, hemû herdu konsonant cihê xwe didin M-yekê:

- şkeft → şkeft-meft

Lê eger zêdetir konsonant hebin, hingê tenê du dikevin, M cihê wan digire û i-yek li navbera M û konsonanta sêyem peyda dibe

- stran → stran-miran
- stratejî → stratejî-miratejî

Eger peyva serekî ji xwe bi M dest pê bike, hingê ew bi alîkariya veguhastina dubare nabe. Di rewşên wisa de hin rêyên din bo dubarekirinê hene:

- mal → malûhal (ne *malûmal)
- mişk → mişkûmar (ne *mişkûmişk)
- mêşûmor (ne *mêşûmêş)

Ji bilî M, carinan veguhastin bi alîkariya B yan P jî peyda dibe:

- karûbar
- darûbar (daristan, dehlûdirr)
- şildim bildim⁴⁴ (zarîvekirina zimanê tirkî)

⁴⁴ Nimûneyek ji peyva “şildim-bildim”: parlementera DTP a Amedê xaltîka me Aysel Tugluk, a ku ji şildim bildima tirkî pêve nizane û qet niyeta wê tune zimanê kurdî jî hîn bibe.” <http://www.lotikxane.com/arsiv/berivan%20a%20nu.htm>
 Ji aliyê etîmolojî ve ihtimalen ji “şöyle böyle” (wisa wiha) ya tirkî ye lê mimkin e ku ji “söyledim bildim” (min got, min zanî) jî be.

- qilo-pilo (pûç, bêkêr, bêwec, hewante)⁴⁵
- ? mêwe-pêwe (fêkî û tiştêk wek wan)
- ? têkil-pêkil (têkil û tevlihev)

Diyardeya guherandina konsonanta yekem bi M (an bi B, P) di beşa duyem a peyvên dubarekirî de ne tenê di kurdî de lê di çendîn zimanên cîran de jî li kar e. Bi kêmî di farisî, tirkî û ermenî de jî dubarekirina bi heman awayî çalak û berbelav e.

3. Dubarekirin bi şidandinê yan dirêjkirinê

Di kurdî de dubarekirin herwiha bi şidandina yan dirêjkirina dengê di nava peyvê de yan jî li dawiya peyvê jî mimkin e:

- gelek (pir, zehf, zor, mişe) → gellek (pir pir, gelek zehf, gelek gelek)
- tijî (dagirtî, ne vala, ne xalî) → tijjî (tam tijî, heta dawiyê tijî, bi tamamî tijjî)
- spas → spaaas! (gelek spas)
- hiş! (bêdeng be!) → hişşş! (bi tamamî bêdeng be! qet deng neke!)

4. Dubarekirin di zimanê zarokan de

Mebest ji zimanê zarokan ew peyv in ku zarok di dema ku biçûk in û hê baş hîn zimanê xwe yê dayikê nebûne bi kar tînin. Gelek caran jî ne tenê zarok wan peyvên dibêjin lê herwiha dêbab jî wan peyvên di axiftina xwe ya li gel zarokan de bi kar tînin.

Di zimanê zarokan de peyvên tîn kurtkirin. Adeten tenê du dengên destpêkê ji peyvê dimînin. Lê di heman demê de yek an herdu dengên destpêka peyvê jî tîn dubarekirin. Ev nimûne ji lîsteyeke Wîkîferhengê (<http://ku.wiktionary.org>) ya peyvên zimanê zarokan di kurdî de hatine wergirtin û analîzekirin:

- dest → tet / çeç (li gel guherandina D bi T an Ç)

⁴⁵ Nimûneyek ji bikaranîna peyva "qilo-pilo": "Siyaset bi qilo pilo nabe, divê bi Kurdperwerî bête meşandin cigerino."

<http://www.lotikxane.com/2015/09/23/xale-qafsiipi/>

- dayik (da, dê) → dadê (gazîkirina dayikê yan xwişkê)
- meme (şîr, av an her tişê vexwarinê), memik (bersîngên jinan ku zarok şîrî jê dixwin)
- kako, keko, kake (birayê mezin)
- bab, babo (paşî di hin devokan de bûye “bav, bavo”)
- mama (dayê, dadê, dayikê – peyveke navneteweyî ya zimanê zarokan e)
- pap (babo, bavo – peyveke navneteweyî ya zimanê zarokan e)
- cocê (şûştin, balavkirin, serşo – ji “şsûstinê” bi guherandina Ş bi C)
- çîçik (bersîngên jinan ku zarok şîrî jê dixwin)

Hin caran peyva bi xwe kurt jî di zimanê zarokan de ji ber dubarekirinê ji peyva bi zimanê mezinan dirêjtir dibe:

- pê (ling) → pepê

Ev heman diyarde di gelek zimanên din de jî di axiftina zarokan de bi eynî awayî ye. Loma peyvên wek “bab, kak, mama, papa” di pir zimanan de peyda dibin.

5. Dubarekirina bi vokalguhêziyê

Mebest ji dubarekirina bi vokalguhêziyê ew e ku peyv tê dubarekirin lê di peyva dubarekirî de vokala peyva serekî bi vokaleke din tê veguhastin. Peyva serekî dikare li destpêkê yan jî li dawiyê be

- naz → nazûnûz⁴⁶
- qal (behs, gotin) → qîlûqal⁴⁷

Di peyva navneteweyî “zigzag / zigzag” (çepûçûrr) de jî heman diyarde berçav e lê beşên vê peyvê “zig” an “zag” bi tenê ti maneyê nadin.

⁴⁶ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “nazûnûz”: “Îsraîl piştî hin naz û nûz him uzrê xwe xwest û him jî dana tazmînatê qebûl kir.” <http://zinarexamo.blogspot.fi/2013/12/roboski-di-dile-milete-kurd-da-birinek.html>

⁴⁷ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “qîlûqal”: “Qîl-û-qal pir in, lê agahiyên baş li ser diziya ku dibe, li cem kêman kesane hene.” <http://www.amude.net/nerin/sirwan-zerevan.html>

Dubarekirina bi vokalguhêziyê di kurdî de – bi kêmî di kurmancî de – diyardeyeke nadir û neçalak e. Çend peyvên heyî jî bi pîranî – eger ne hemû – ji zimanên din hatine wergirtin.

6. Dubarekirina paşveyî

Me li jor diyar kiriye ku peyv dikarin an bi temamî an jî bi pişkî dubare bibin. Di peyvên bi pişkî dubare dibin de an herdu peyv serekî ne (bo nimûne “gulûgiya” ji “gul” û “giya”) yan jî beşa yekem ji peyva serekî pêk tê û beşa duyem jî li gor wê hatiye eyarkirin û wek peyveke serbixwe peyda nabe yan eger peyda bibe jî ne bi vê maneyê ye (bo nimûne “tişt → tiştûmişt” an “naz → nazûnûz”).

Lê piçekê li jortir me diyar kir ku peyva dubare “qîlûqal” bi vokalguhêziyê ji peyva “qal” (behs, gotin) pêk hatiye. Anku ne li gor rêbazên giştî beşa duyem li gor a yekem lê pişka yekem li gor beşa duyem hatiye eyarkirin.

Gelo ev peyveke tenê ye û qeydşkên e?

Kerem bikin li van peyvan binêrin:

- nipînû⁴⁸ (pirr nû, bi temamî nû, aniha derketî)
- tikîtenê⁴⁹ (bi temamî bi tenê)

Di peyva “nipînû” de “nû” peyveke serbixwe ya watedar e. Lê beşa yekem anku “nipî” bi tenê ti maneyê nade. Anku beşa yekem li gor beşa duyem hatiye çêkirin. “Tikîtenê” jî bi heman awayî ye lê ew dikare herwiha eyarkirina gotinên “tek û tenê” li gor vî qalibê “nipînû” jî be.

“Nipînû” bi xwe peyveke nû ye û van salan di zimanê nivîskî de hatiye çêkirin. Ew di rastiyê de wergera *yepyeni* ya tirkî ye ku dubarekirina pişkî ya peyva *yeni* (nû) ye. Di tirkî û zimanên lêzimî wî de dubarekirina pişkî ya paşveyî (beşa duyem li gor beşa yekem) diyardeyeke berbelav û çalak e:

- kara (reş) → kapkara (pir reş, bi temamî reş)

⁴⁸ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “nipînû”: Ew li dû navbereke dirêj bi stranên xwe yên nipînû derket pêşberî muzîkhezan. <http://www.rizgari.com/modules.php?name=Content&pa=showpage&pid=1724>

⁴⁹ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “tikîtenê”: “Ahmet nayê girtin lê tikîtenê dimîne, hemû hevalên wî, hema bibêje kê nas dike yan ketiye girtîgehê yan jî li cîne ku nayê zanîn e.” <http://www.ahmetkaya.com/Hakkinda.aspx?ver=krt>

- beyaz (spî) → bembeyaz (sîs, bi tamamî spî)
- temiz (paqij) → tertemiz (bi tamamî paqij)

Wek ku tê dîtin, peyva dubare li destpêkê ye, yekem dengê wê wek yê peyva serekî ye û vokal A ya E ye (li gor harmoniya vokalan). Herwiha di peyva dubare de sê deng hene (tam wek di kurdî de – li jortir binêrin – lê di kurdî de peyva dubare adeten dikeve pey peyva serekî, ne berî wê). Ji nimûneyan diyar dibe ku dengê sêyem ê peyva dubare ne herdem eynî ye (kap-, bem-, ter-). Lê di rastiyê de bi pîranî ew deng P ye, M û R (û hin dengên din jî) nadir in.

“Nipînû” ne tenê li ber modela tirkî hatiye çêkirin ji ber wê yekê ku peyva serekî li dawiyê ye. Herwiha P jî wek dengê sêyem ê peyvên dubare yên tirkî ye. Lê dîsa jî “nipî-“ bo nimûne ji “kap-“ bi hindê jî cuda ye ku di “kap” de sê lê di “nipî” de çar deng hene. Ew bi heman awayî ji peyvên dubare yên kurdî bi xwe jî cuda ye ji ber ku di van rewşan de di kurdî de jî ew peyv sê-dengî ne.

Tevî ku “nipînû” li ber modela tirkî hatiye avakirin jî, ew ne bi her awayî wek wê ye. Heman peyvê “tek û tenê” ya ji du peyvên serbixwe jî nêzîkî xwe kiriye û şiklê “tikîtenê” daye wê. Wek prensîp ev awayê peyvsaziya dubarekirinê jî dikare di kurdî de belav bibe. Di rastiyê de ji niha ve hin ji peyvên din jî yên bi heman modelê di kurdî de hatine çêkirin (niha bi pîranî di wergerên berhemên tirkî de):

- reş → ripîreş⁵⁰ (bide ber tirkî “kara → kapkara” = tam reş, bi tamamî reş)
- şîn → şipîşîn⁵¹ (tirkî mavi → masmavi)
- zer → zipîzer⁵² (sarı → sapsarı)

Lê wisa dixuye ku ne mimkin e ku mirov peyva “spî” bi heman awayî xurt bike û bike *sipîspî.

Di kurdî de ji berê ve hin awayên din li cihê van hene, bo nimûne: reşê tarî, şîne esmanî, zerê zîq û hwd. Niha hê zû ye ku em pêşbînî bikin ka kîjan ji van herdu şeweyan dê serî ji yê din bistîne. Bi ihtimaleke mezin herdu awa dê heta demekê wek alternatîvên hev hebin.

⁵⁰ Bo nimûne: “Tariyeke ripîreş xwe li jiyana min pêçabû û ez di nav wê tariyê de difetisîm.” Di heman nivîsê de bi qasî deh caran peyva “ripîreş” hatiye bikaranîn. <http://www.kulturname.com/?p=3835>

⁵¹ “Demsal bihar bû, giya şîn bibûn, ezman şipîşîn bû û stêrk birqok bûn.” <http://www.artuklu.edu.tr/Upload/tyde/Tezler/388896.pdf> r. 21.

⁵² Bo nimûne: “Poyraz Mûsa, nezaniyê wê çi bikira li Abdulwahap Bêg vegeriya. Ew jî, zipîzer bûbû, wek pelê payîzê, bûbû wek mişmişê, qey dileriziya.” <http://arsiv.niviskar.com/content/f%C4%B1rat-kan-ak%C4%B1yor-baksana>

7. Dubarekirina bi hevwateryan

Di kurdî û gelek zimanên din de jî hin tişt bi du peyvên hevwater (hevmane) anku sînonîm tên dubarekirin. Hin caran yek ji van peyvyan (bi texmîna bikarînerên wan) xwemalî ye û ya din jî ji erebî yan ji tirkî hatiye wergirtin:

- îş û kar
- şert û merc
- vîn û îrade

Hin peyvên wiha êdî hind bi hev ve zeliqîne ku êdî kêr bi tena serê xwe tên bikaranîn:

- nav (navber) + beyn (navber) → navbeyn / navbên
- bar (rewş, hal) + dox (rewş, hal) → barûdox

Du sebebên bikaranîna wiha hene:

- Bikarîner dixwaze peyva xwemalî ya “kurdiya paqij” bi kar bîne lê li aliyekî din guman dike ku belkî xwandevean wê fehm nekin loma hevwatera wê ya bi eslê xwe biyanî jî li gel dinivîse.
- Bi dubarekirina heman tiştî bi du peyvên hevwaterê lê ji hev cuda dixwaze giraniyê bide ser meseleyê.

Lê ev ne tek awayê dubarekirina heman tiştî bi du peyvên ji hev cuda ye. Carinan herdu peyv ne bi tamamî hevwater ne û ji aliyê dengnasî ve jî ne dubarekirin in lê bi maneya xwe ya nêzîk heman tiştî dubare dikin û giraniyê didinê:

- navûdeng (meşhûriyet, navdarî)
- sal û zeman (demeke gelek dirêj)
- serûçav, devûlêv (bi maneya hemû “rû, dêm”)

Carinan peyv dikarin herdu jî xwemalî yan biyanî bin an jî rehê wan neyê nasîn:

- şeref û namûs
- govend û dîlan

- dawet û dîlan
- reş û tarî

Dubarekirin dikare herwiha bi bikaranîna formên yekhejmar û pirhejmar ên heman peyva bi eslê xwe ji erebî jî pêk were:

- hed û hidûd (“hidûd” di erebî de pirhejmariya peyva “hed” e)
- şert û şirût / şurût (“şurût” di erebî pirhejmariya peyva “şert” e)
- hal û ehwal (“ehwal” di erebî pirhejmariya peyva “hal” e)

Dubarekirina hin hevwateryan dikare bi peyvrêziya xwe azad be, bo nimûne “kitêb û pirtûk” an “pirtûk û kitêb”. Lê di dubarekiriyên qalibgirtî de peyvrêzî sabit e û cihê peyvan bi hev naguhere:

- şert û merc (lê ne *merc û şert)
- navbeyn (lê ne *beynav)
- reş û tarî (lê ne *tarî û reş)
- şert û şirût (lê ne * şirût û şert)

Ji van nimûneyan em dikarin van qeyd û bendên giştî yê peyvrêziya hevwateryên dubarekirî hîn bibin:

- Peyva yekem dikare xwemalî be û ya duyem biyanî / erebî be (bo nimûne “navbeyn”) yan jî peyva yekem biyanî û ya duyem xwemalî / îranî be (bo nimûne “şert û merc”).
- Eger dubarekirin bi forma yekhejmar û pirhejmar a heman peyvê be, hingê forma pirhejmar berî forma pirhejmar e (bo nimûne “şert û şirût” lê ne “*şirût û şert”).

Lê em hewceyî hê vekolînan daku tê bigihin ka hê rê û rêbaz hene ku çawa û çima hin hevwater berî hinên din tên an na. Û eger hebin, ew çi ne.

8. Dubarekirina bi dijwateryan

Ji bilî dubarekirina bi hevwateryan, di kurdî de peyvsazî herwiha dubarekirina bi dijwateryan anku antonîman jî mimkin e. Dubarekirina dijwateryan dikare ji du peyvên serbixwe yê dijî hev pêk hatibe (bo nimûne ji du rengdêran) yan jî ji forma erênî û forma neyînî ya heman lêkerê bin:

- reşûspî (ne rengîn): televizyoneke reşûspî
- biçûk û mezin, pîr û ciwan (kesên ji hemû jî û temenan)
- bi şev û roj (herdem, 24 saetan)
- kir û nekir (çi kir jî): Min kir û nekir, ew razî nebû (Min çi kir jî, ew razî nebû)
- bivê-nevê (illeh, çawa be jî, herhal)

Ji van nimûneyan em dikarin van qeyd û bendên giştî yê peyvsaziya bi dubarekirina diwateyan diyar bikin:

- Peyvên dubarekirî dikarin rengdêr bin (bo nimûne “reşûspî”) navdêr bin (şev û roj) an lêker bin (dikim-nakim = çi dikim jî, dîsa nabe).
- Peyvrêziya peyvan ne azad e lê qalibgirtî ye: “reşûspî” lê ne “*spîûreş”; “bi şev û roj” lê ne “*bi roj û şev”; “kir û nekir” lê ne “*nekir û kir”.

9. Peydabûna “dudu” û “sisê”

Di kurdî de – bi taybetî jî di kurmançiya navendî de – hejmarên 2 û 3 ji bilî navên “du” û “sê”, herwiha formên “dudu”⁵³ û “sisê” jî hene. Ew ne di devokên din ên kurmançî de, ne di zaravayên din ên kurdî de û ne jî di zimanên din ên îranî yan hindûewropî de peyda dibin tevî ku navên hejmarên 2 û 3 bi awayekî yan awayekî din di van ziman û zaravayan de jî hevrehên navên van hejmaran ên bi kurmançî ne. Ji vê jî diyar dibe ku “dudu, sisê” dubarekirinên formên “du, sê” ne, ne ku “du, sê” kurtkirinên “dudu, sisê” bin.

“Dudu” dubarekirineke temam e ya xwerû ye. Lê “sisê” hinekî ecêb û xerîb dixuye:

- Berevajî qeyda giştî, di “sisê” de peyva serekî “sê” ne li destpêkê lê li dawiyê ye.
- Tevî ku dubarekirina paşveyî (li jortir binêrin) wek di peyvên “nipînû” de niha di kurmançî de êdî mimkin e jî, ew bi piranî bi rengdêran ve – xaseten bi navên rengan ve – sinordar e lê “sê” ne rengdêr e.
- Di dubarekirina paşveyî de qalibê peyva yekem wiha ye: konsonanteke wek konsonanta destpêka peyva serekî (nipînû, tikîtenê, zipîzer) + i + konsonantek (bi piranî P) + î. Lê di peyva “sisê” de tenê “si-“ heye.

⁵³ Ji bilî “dudu”, ev peyv bi çendîn formên din jî di nivîsan de tê dîtin: “dido, didu, dudo...”

- Hemû peyvên bi dubarekirina paşveyî bi zelalî li ber modelên wan ên tirkî hatine çêkirin lê ti modeleke tirkî ji qalibê "sisê" re peyda nabe.⁵⁴

Di rastiye "sisê" jî wek "dudu" divê carekê "*sêsê" bûbe anku encama dubarekirina temam a xwerû be lê paşî ê-ya kîteya yekem kurt bûbe û "sisê" jê peyda bûbe. Bi heman awayî "dudu" jî êdî bi piranî wek "didu" tê gotin û gelek caran nivîsîn jî.

10. Çi ne dubarekirin e?

Carinan hin deng an kiteyên wek hev an nêzîkî hev dikevin pey hev lê dîsa jî ew ne dubarekirinên peyvsaz in:

- dan → didan
- ~~ne~~bêjin → bibêjin
- nivîsî → nenivîsî
- ~~ne~~nivin → nanivin
- dan → dadan

Pêşpirtikên wek "di-, bi-, na-, ne-" li vê derê pêşgirên giştî ne, dengê wan ne ji ber peyva li dûv wan e. Heman pêşpirtik dikevin berî gelek peyvên ne bi heman dengê dest pê dikin jî.

- di-kir, di-got, di-xwar...
- bi-kin, bi-rêjin, bi-çerînin...
- ne-girt, ne-livîn, ne-hatibû...
- da-ketiye, da-ûrand, da-girin...

⁵⁴ Di tirkî de navê hejmarê 3 "üç" e.

11. Çi birr dubare dibin û dibin çi?

Di dubarekirina peyvsaz de hin peyvên nû ji peyvên heyî tîn çêkirin. Hin caran birra peyvê wek xwe dimîne, bo nimûne ji navdêran navdêr an ji rengdêran rengdêr derdikevin. Lê gelek caran jî ji encama dubarekirinê birra peyvê diguhere, bo nimûne navdêr dibe rengdêr an berevajî.

Di vê beşê de em ê bi hin nimûneyan diyar bikin ka birrê peyva sade dikare bibe çi:

Navdêr → navdêr

- mal → malûhal (dubarekirina pişkî bi guherandina li destpêkê)
- mişk → mişkûmar (dubarekirina pişkî bi guherandina li dawiyê)
- xal → xalxalok (dubarekirina temam a bidûvik)

Navdêr → rengdêr

- parçe → parçe-parçe (dubarekirina temam a xwerû)
- der(î) → derbider (dubarekirina temam a binavbirk)
- gul → gulgulî (dubarekirina temam a bidûvik)

Navdêr → hoker

- car → car-car (dubarekirina temam a xwerû)
- ser → seroser (dubarekirina temam a binavbirk)

Rengdêr → rengdêr

- dûr → dûr û dirêj (dubarekirina pişkî li destpêkê)
- kûr → kûr û dûr (dubarekirina pişkî li dawiyê)
- tijî → tijjî (dubarekirina bi şidandinê)

Rengdêr → hoker

- hêdî → hêdî-hêdî
- hûr → hûr-hûr

Rengdêr → navdêr

- hûr → hûrûmûr (tiştên hûr, biçûk, ne giring...)

Lêker → lêker

- liv-în → livliv-în (dubarekirina temam)
- hej-andin → hejhejandin (dubarekirina temam)

Lêker → lêker

- nal-în → nalenal (dubarekirina temam a binavbirk)
- mêj- (mêtin, mihtin) → mêjmêjok (dubarekirina temam a bidûvik)

Lêker → rengdêr

- liv-în → livlivok (dubarekirina temam a bidûvik)
- hej-în → hejhejok (dubarekirina temam a bidûvik)⁵⁵

Hoker → hoker

- heta → heta-heta (dubarekirina temam a xwerû)
- heta → hetawheta, hetaûheta (dubarekirina temam a binavbirk)

⁵⁵ "Hejhevok, livlivok" wek prensîp dikarin rengdêr → rengdêr jî bin (hejok → hejhejok, livok → livlivok) lê ji ber ku dubarekirina paşveyî di kurdî de diyardeyeke nadir û nû ye, bi dîtina min ew wiha çêbûne: liv-în → livlivok an jî liv-în → livliv-în → livlivok.

- paş → paşpaşkî (dubarekirina temam a bidûvik)

Hejmar → hejmar

- du → dudu (dubarekirina temam a xwerû)
- sisê (bo awayê dubarekirinê li jortir li beşa *Peydabûna “dudu” û “sisê” binêrin.*)

Hejmar → hoker

- yek → yek-yek (dubarekirina temam a xwerû)
- yek bi yek (dubarekirina temam a binavbirk)

Hejmar → rengdêr

- sed → sed-der-sed” bi maneya “bêguman, bêşik” (dubarekirina temam a binavbirk)

Diyarker → diyarker

- çend → çendî çend

Bangeşan → bangeşan

- wey → wey-wey (dubarekirina temam a xwerû)
- ax → ax û ax (dubarekirina temam a binavbirk)
- ax → ax û ox (dubarekirina bi vokalguhêziyê)

12. Dubarekirin di asta hevokî de

Mijara me dubarekirin di peyvsaziyê de bûye. Me xwastiye diyar bikin ka çî û çawa peyvên nû bi dubarekirina peyvên heyî tîn sazkin. Dubarekirin li derveyî peyvsaziyê jî heye lê ew ne mijara me ya vê care ye. Lê dîsa jî em dixwazin bi çend nimûneyan berê xwandevanên hêja bidin dubarekirinê li derveyî peyvan jî.

Lê dixwazim diyar bikin ku ev nimûne tenê bi armanca diyarkirina diyardeya dubarekirinê di asta hevokan (risteyan, cumleyan) de ye. Armanca ne ew e ku em kûr û dûr meseleyê li vê derê vekolin.

- **hem ... hem ...:** Peyva “hem” di kurmancî de bi tenê peyda nabe. Her cara ku em wê di hevokekê de bi kar bînin, divê ew careke din jî were dubarekirin:
 - o *hem em û hem jî ew*
 - o *hem dixwe û hem vedixwe*
- “*Ez nakim, ez nakim*”a xwe *bihêle!* Anku: De bes bibêje “*ez nakim*”.
- Dubarekirina xemsar
 - o Qiseker 1: *Ew nayên.*
 - o Qiseker 2: *Ê nayên nayên.* (Ne xem e ku nayên, bila neyên.)

13. Dubarekirina îdiyomatîk an totolojîk?

Wek ku li jor diyar bûye, dubarekirin carinan maneyên cuda û carinan jî tamên cuda didin peyvan. Gelek caran, di heman demê de maneyê û tamê jî piralî û berfirehkirin. Dubarekirinên wiha biwêjê anku îdiyomatîk in û yek ji awayên zengîniya zimanî ne.

Lê dubarekirina carinan bêkêr û bêxêr e, tenê gotinê yan nivîsê dirêj dike bêtir ku ti maneyekê yan çêjekê lê zêde bike. Ji dubarekirinên wiha re di zimannasiyê de **totolojî** (bi inglîzî *tautology*) tê gotin. Gotinên wisa bêwec û bêkêr dubarekirî jî **totolojîk** (*tautological*) in. Li vê derê hemû diyardeya totolojîyê ne mijara me ye lê em ê tenê çend nimûneyan bidin daku mesele were fehmkirin û were zanîn ku herdem dubarekirin jî ne tiştekî erênî û hêvîkirî ye:

- **derketin derve:** Ev gotin di medyaya kurdî de pir tê dubarekirin. Lê ew totolojî ye anku dubarekirineke zêde ye ji ber ku di peyva “derketin” bi xwe de jî maneya “derve” heye. Lê ji

ber ku di tirkî de ev gotin “dışarıya çıkmak” e, li ber peyva “dışarı” di kurdî de jî “derve” lê tê zêdekirin. Lê “derve” ti tiştî li “derketin”ê zêde nake û tenê bi xwe zêde ye.

- **serbest berdan:** Dîsa li gor mentîqa tirkî “serbest” jî li peyva “berdan” hatiye zêdekirin lê bi xwe ti maneyeke zêdetir an tameke din nade peyvê, tenê bi xwe zêde ye. Di kurdî girtî an tîn “berdan” an jî tîn “serbestkirin” lê nayên “serbestberdan”.
- **di derbarê ... de:** Peyva “derbarê” ji farisî hatiye û ji peyvên “der” (tê de) “bare” (rewş, hal) hatiye. Lê di kurdî de hin caran “di ... de” jî lê tê zêdekirin. Lê li cihê “di ... de” ya kurdî ji xwe “der” a farisî di peyvê de heye. Loma “di derbarê ... de” biwêjeke totolojîk e. Çêtir e ku mirov tenê bibêje “derbarê filan tiştî”, ne “di derbarê filan tiştî de”.
- **“Pêkhevî”⁵⁶** navê straneke nû ya Şivan Perwerî ye. Ew hewldaneke têkilkirina kurmançiya navendî û kurmançiya rojhilatî ye yan jî kurmançiya navendî û soranî ye: bi kurmançiya rojhilatî *pêkve* (soranî *pêkewe*) û kurmançiya navendî *bi hev re* (kurtkirî *pevre*) ye. Lê di peyva “pêkhevî” de “pêk” a kurmançiya rojhilatî heye ku beramberî “bi hev / pev” a kurmançiya navendî ye. Beşa duyem jî ji peyva “hev” pêk hatiye. Eger mirov peyva “pêkhevî” li kurmançiya navendî “wergerîne”, ew dê bibe “bi-hev-hev-î” (kurtkirî “pevhevî”). Eger li kurmançiya rojhilatî jî “wergerîne”, ew dê bibe “bi-yek-yek-î” (kurtkirî “pêkêki”). Anku di peyvê de “bi êk / pêk” ya kurmançiya rojhilatî û hevbera wê “bi hev / pev” ya kurmançiya navendî li pey hev hatine dubarekirin û bûne totolojîk. Lê di heman demê de “ve” ya kurmançiya rojhilatî (pêk-ve) û “re” ya kurmançiya navendî (“bi hev re, pev re”) hatine jibîrkirin.

14. Wate û armancên dubarekirinê?

Wateya peyvên dubare ne herdem îkonîk e anku ne tenê maneya beşên dubarekirî didin. Bo nimûne, dema ku em dibêjin “gulûgiya”, mebesta me ne tenê “gul” û “giya” ne lê hemû riwek, nebat û şînkati ne. Dema ku em dibêjin “gulûgiya”, qesta me dar û devî û gelek tiştên din in jî ku şînkati dibin.

Em dikarin bi kêmî van armancên dubarekirinê destnîşan bikin:

1) Berfirehkirin (extension) an piralîkirin (diversification)

⁵⁶ Strana “Pêkhevî” dikare li vê derê were bihîstin û dîtin.

- zarûzêç (zarok û endamên din ên malê, bi taybetî jin)
- mêşûmor (mêş û hemû jînewerên biçûk ên wek wan: kêz, pêşû...)
- malûhal (mal, xanî, malbat û tiştên din ên têkilî wan)
- gulûgiya (hemû nebat, riwek)

2) Xurtkirin (intensification)

- dûr-dûr (pirr dûr)
- lez û bez (leza zêde)
- çendî çend (gelek, pirr)
- gellek (gelek gelek, pirr pirr)

3) Berdewamî (repetition)

- nalenal (nalîna berdewam)
- birdebird
- bi şev û roj

4) Sistkirin (attenuation)

- hêdî-hêdî
- piço-piço

5) Şibandin

- pêpik: piyên (lingên) maseyan yan textên xewê. Bi dubarekirinê ji peyva “pê” hatiye çêkirin ji ber ku ew hinekî dişibin piyên microvan.

6) Tinazîkirin

Bi armanca henek, tinazî, tirane, galte, laqirdî, qerf, mîzahî tên bikaranîn, bo nimûne:

- şildim-bildim: axiftina bi zimanê tirkî
- zaza: zimanê / zaravayê ku qaşo Z tê de pirr li kar e

- here-were: kurmancî (zimanê ku bi dîtina tirkan û zazayan ev gotin pit tê de tên bikaranîn)
- qiltû-miltû⁵⁷: axiftina bi zimanê erebî
- laq (ling, pê) → lûlaq (lingên rût û bêteşe)

15. Rastnivîsîna peyvên dubarekirî

Gelo peyvên dubarekirî çawa tên nivîsîn an em wan çawa binivîsin? Her beşek cuda, hemû bi hev e yan jî bi xetikên navberê:

- kar û bar, zar û zêç, roj bi roj, yek yek, hêdî hêdî, nav nîşan?
- karûbar, zarûzêç, rojbiroj, yekyek, hêdîhêdî, navnîşan?
- kar-û-bar, zar-û-zêç, roj-bi-roj, yek-yek, hêdî-hêdî, navnîşan?

Mixabin ti ji van her sê awayan herdem bikêrhatî ye. Hin ji peyvên dubarekirî bê navbirr bi hev re, hin bi temamî ji hev cuda û hin jî bi xetikan bi hev ve girêdayî tên nivîsîn. Anku em nikarin bibêjin ku bila hemû li gor heman rêbazê bên nivîsîn lê em dikarin çend şîret û rênimayan bidin. Heta ji min hatiye, min hewl daye ku guh bidin rastnivîsîna heyî anku awayê ku piraniya nivîskar û rojnamevanan di nivîsên xwe de bi kar tînin – min hewl nedaye ku dijî wan rêç û rêbazên xwe ferz bikim:

1) Bi xetikên navbir

- hokerên ji dubarekirina xwerû:
 - hêdî-hêdî, yek-yek, piço-piço
- dubarekirinên “demkî” (ex tempore) ên bi M yên bênavbirk: kitêb-mitêb, ders-mers

2) Bi hev re anku pêkve

- dubarekirinên temam ên îdyomatîk:
 - karûbar, zarûçêç, malûhal
 - seranser, beramber
- dubarekirinên pişkî yên cihê xwe girtî û îdyomatîk:

⁵⁷ https://ku.wiktionary.org/wiki/qilt%C3%BB_milt%C3%BB

- navnîşan, hûrûmûr, tişt û mişt

3) Ji hev cuda

- dubarekirinên temam ên bi daçeka “bi”:
 - roj bi roj, yek bi yek
 - ji bilî çend peyvên îdyomatîk: derbider
- dubarekirinên “demkî” (ex tempore) ên bi M yên bi navbirka “û”: ders û mers, kitêb û mitêb.

Saxtiman Dese le Kurdî Kirmaşanî

Řizgar Behadur

We baweř Çamski⁵⁸ (1957) sîntaks yanî pey birdin we řîwey duris bîn saxtiman⁵⁹ cumfte. Wextî kesîg bitüenî we zwan xwey xas qise bikey û cumfteyl durisîg büşî yanî xerîk e le ser bineway qanûneyl zwan xwey qise key. Be tam eger le merdim bipirsîm çün cumfte duris bû kesîg nîetüenî xas cwawman biyey, çün ewan lebarey zwan zanyarî agahane neyrin.

Herkes bî ewey xuey bizanî gi çîştîg derbarey zwan xuey zanî, yanî zanist naagahaneyg lebarey zwan dîrî. Îme tüenîm le řî qizawet merdim lebarey zwan pey we qanûneyl zwan biweym.

Eřa nimûne binûřin e î cumfteyle:

- (1) a. Meryem dařtya kitaw xuenya.
 b. *Kitaw dařtya Meryem xuenya.
 c. *Xuenya dařtya kitaw Meryem.
 ç. *Kitaw Meryem xuenya dařtya.
 d. *Meryem xuenya dařtya kitaw.

- (2) a. Elî xerîk e çû eřa mał.
 b. *Xerîk Elî e çû eřa mał.
 c. *E xerîk mał eřa çû Elî.
 ç. *Mał eřa e xerîk Elî çû.
 d. *Eřa mał e Elî çû xerîk.
 e. *Çû Elî mał xerîk e eřa.
 f. *Eřa e çû mał Elî xerîk.

⁵⁸ Chomsky

⁵⁹ structure

Le î nimûneyle cumleyl bîsitare xassaxt⁶⁰ in, yanî her Kurdzwanîg ki zwan dafigî xuey xas zanî î cûr cumleylîg üşî ya we řas zanîdeyan, beřam cumleyl sitaredar gensaxt⁶¹ in, yanî le naw qisey merdim î cumleyl peyda nîewn û we î xatire sitaredar bîne.

Helbet xassaxtî⁶² û gensaxtî⁶³ îş dereceylîg dîrî, yanî birîg le cumleyl herçend xassaxt nîn, beřam le layen merdim üşiryen û ta endazeyg qabiř qebûl in.

(3) a. ?Dařtya kitaw xuenya, Meryem.

b. ?Eřa mař, Elî xerîk e çû.

c. ?Elî eřa mař xerîk e çû.

Herçen î cumley bane binkul xassaxt nîn, beřam çün merdim manayan famin, tüenîm büşîm ta endazeyg qabiř qebûl in. Îme eřa ye nîřan biyeym cumleyg binkul xassaxt nîe ya řik dîrîm xassaxt bû le nîřany pirsyar (?) istifade keym.

Hîçkam le îme le medrese destûrzwan Kurdî nexuenîme û le mař îş î baseyle eřaman nekirdine. Dey çün tüenîm büşîm cumleyg le řü qanûneyl zwan Kurdî duris neüe û gensaxt e? Cwawegey ewe se îme insan îm û zwan îş beşîg e le zat insan.

We qewř Çamskî (1965), herkam le îme le naw zeyniman **Wesiley Yadgirdin Zwan**⁶⁴ dîrîm. Delîl î qise îş ewe se, minañ le herkûrey dinya bû zwan yad girî û giřt minañleyl îş teqrîben le yey sin zwanyan tekmlîew bû. Yanî minañ wegerd zwan nîetyey e dinya beřam wextîg hat e dinya werewere zwanîg yay girî. Eřa nimûne minañ Kirmařanî yad girî le düay' *dařtya*' bayed büşî '*xuenya*' û inca le lay xueyw tüenî büşî '*dařtya xuenya*' Kurdî Kirmařanî e beřam '*dařtya xuenî*' Kurdî Kirmařanî nîe.

Wey xatire wextîg xerîk îm sîntaks zwanîg řîwe keym, twaym ew çîşteyle ki eřa nimûne yey Kurd Kirmařanî we řîwey naagahane derbarey zwan xuey zanî desnîřan bikeym. Yanî zanyarîeyl îme lebarey sîntaks yey zwan le qizawet merdim le ser qabiř qebûl bîn ya qeyrqabiř qebûl bîn cumleyl pîřnehad kirya tyen. Yanî le îre kar îme tenya tewsîf zanist ew qisekereyle se, ne ye ki büçîm ewan bayed çü qise biken.

⁶⁰ well-formed

⁶¹ ill-formed

⁶² well-formedness

⁶³ ill-formedness

⁶⁴ Language Acquisition Device (LAD)

Wextîg dîrîm pitekeney zanist zwanî kesîg keym, bayed hûşman bû le ew qiseyle çewpûşî bikeym ki merdim le wext mesî, gîjî, şeketî, xew ya serzwan girdin ûşiney. Çün îme le îre haym e şûn zanist zwanî ne kirdey zwanî.

Cûreyl wite⁶⁵

Zanist zwanî binçîney ha le du çîşt, witedan⁶⁶ û qanûneyl hamîte kirdin. Witedan mînî e ferheñ ya emarîg piř le wite⁶⁷. Le witedan dyar kiryas her witeyg çün ûşiryey, manay çe s û çî cûr witeyg e (kar⁶⁸, naw⁶⁹...) (Çamskî 1995).

Herkam le cûreyl wite le naw cumle cîyan dyar e û nîew le cî yektir binîşin.

(4) {pya / mel / gurg / *zerd / *nîşt / *werceq}ege çîştîg dî.

(5) Kuřege düeke îware {hat / çî / řesî / *bîkar / *îware} e mař.

Le î nimûneye dyar e naw û kar cî xueyan dîrin û çîştîg tir cûr gerdnaw⁷⁰ ya gerdkar⁷¹ nîetüenî cayan bigrî.

Karnî⁷² (2001) eřa aşkîra kirdin cûreyl wite le zawn lñlîsî çen şîweyg bas kirdîe û min îş le îre le ewane eřa peyda kirdin cûreyl wite le Kurdî Kirmaşan istifade kem.

(a) NAW (N): Le destûr sunetî eřa kes, cî, ya çîşt we kar biryey. Belam we şîwey dabeşkerane⁷³le naw cumle, karker ya karlesr cumle s, gerdnaw tewşîfî key, ya werce dyarker (-ege, -îg) tyey.

Çwarçû: **A** melîg e, bařew nîegrî.

⁶⁵ parts of speech

⁶⁶ lexicon

⁶⁷ word

⁶⁸ verb

⁶⁹ noun

⁷⁰ adjective

⁷¹ adverb

⁷² Carnie

⁷³ distributionally

(b) KAR (K): Le destûr sunetî bas le encam karîg key. Bełam we şîwey dabeşkerane le naw cumle le düay karker û karleser tyey, le düay witeylîg cûr *xerîk* û *daştin* tyey. Xuey şî we tenya manay cumle dîrî.

Çwarçû: Minaley le maî **A**.

(c) GERDNAW (Gn): Le destûr sunetî bas le sifet û çünyetî çîştîg key. Bełam we şîwey dabeşkerane le naw cumle le düay naw ya witey *ferê* tyey.

Çwarçû: Awege ferê **A** bî.

(d) GERDKAR (Gk): Le destûr sunetî tewsîf gi çîştîg key bîcge le naw. Bełam we şîwey dabeşkerane le naw cumle le her cayg bîcge le düay kar tyey.

Çwarçû: Ew **A** le xew heîsa.

Dese⁷⁴

Cumle le wite duris bû, bełam î witeyle tenya nîn û wegerd yek tyen. Eîa ewey xastir bünîm ceryan çe s, binûrîn e î nimûneyle:

- (6) a. Pişîe büçkeîaneye le ban darege xeftü.
 b. * Pişîe _____ le ban darege xeftü.
 c. * ___ büçkeîaneye le ban darege xeftü.
 d. * Pişîe büçkeîaneye _____ darege xeftü.

Her ew cure le banew dyar e eger beşîg le cumle la biweym, cumle kelîmedar bû. Bełam binûrîn e î nimûneyle:

- (7) a. Pişîe büçkeîaneye le ban darege xeftü.
 b. _____ le ban darege xeftü.
 c. Pişîe büçkeîaneye _____ xeftü.

⁷⁴ phrase

Le î nimûneyl bane, herçen beşîg le cumle la biryas, befam cumle her xassaxt e.

Her leywa tûenîm le cyay karker ya karleser le cînaw istifade bikeym:

(8) a. Minateyl îme tawsanan nêçin e medrese.

b. Ewan tawsaneyl nêçin e medrese.

Eger çen wite wegerd yekew bûn û bitûenîm le cumle layan biweym, ya wegerd çîştîg tir canîşînyan bikeym, ewane wegerd yek dese duris kirdine. Eger xas binûrîm e ew cumleyle ta îse basyan kirdîme tûnîm bûnîm herkam le ewane le çen deseşy duris bîne:

(9) a. [Meryem] [daştya kitaw xuenya].

b. [Elî] [[xerîk e] [çû [eşa ma]]].

c. [Pişe bûçketanege] [[le ban darege] [xeftü]].

d. [Minateyl îme] [[tawsanan] [[nêçin] [e medrese]]].

Le ew nimûneyl bane kiruşe nîşaney dese s, yanî eşa nimûne herkam le *pişe bûçketanege*, *daştya kitaw xuenya* ya *le ban darege* le naw cumle eşa xueyan deseşy cyaganeyş duris kirdine.

Saxtîman dese⁷⁵

Le ser bineway serdarî⁷⁶ her deseşy bayed tenya xawin yey ser bû (Çamskî 1989) û gişt saxteyl sîntaksî le pel-kutan⁷⁷ ew sere durisew bûn. We î xatire her deseşy lan kem le yey ser ya le ser û tamamkerîg duris bû. Inca eger bineway duliqî⁷⁸ (Keyn⁷⁹, 1984) peyrew bikeym, le naw her deseşy ser ya le nway tmamker tyey ya le düay ew.



⁷⁵ phrase structure

⁷⁶ headedness

⁷⁷ projection

⁷⁸ Binary branching

⁷⁹ Kayne



Wextîg le naw dese yg ser werce tamamker bay, we ew dese ûşîm nwaser⁸⁰ û wextîg îş ser bikefî e düay tamamker we pî ûşîm düaser⁸¹.

Cûreyl dese⁸²


Pîştir bas cûreyl wite kirdîm, herkam le cûreyl wite tüenin bûne ser dese yg û eña xueyan des yg we naw xueyan duris biken.

1. Dese y nawî (DN)

Naw tüenî gerdnaw girî biyey e xuey û dese y nawî duris bikey, yanî:

DN → N Gn

(10) Ew kuř xasîg e.




⁸⁰ Head initial


⁸¹ Head final

⁸² phrase categories

(11) Ew mał gewre hin kî e?



(12) Dar berzîg ha naw hewşegeyan.




2. Deseş karî (DK)

Deseş karî we deseşg üşîm karîg ser ew dese bû. Hem deseş nawî û hem îş deseş gerdnîşî tüenin bûn e temamker deseş karî.

Deseş nawî hemîşe werce kar tyey:

DK → DN K

(13) Ew kitaw xuenya.




Desey gerdnîşî hem werce kar û hem le düay kar tyey:


DK → DG K

DK → K DG

(14) Kitawege le ban mîzege bî.



(15) Defterege ha jîr mîzege.




3. Deseş gerdnawî (DGn)


Deseş gerdnawî deseşg e gerdnawîg serî bû. Yekîg le řeyl durs bîn deseş gerdnawî hatin gerdkar endaze werce gerdnaw e:

DGn → Gk Gn

(16) Şûrwage xeylî xes bî.



(17) Řeņege fere řaw e.




4. Deseş gerdnîşî (DG)


Gerdnîş tüenî naw girî biyey e xuey û desey gerdnîşê duris bikey, yanî zûrim gerdnîş werce tamamker nawî tyey:

DG → G N


(18) Min imrû le mał bîm.



(19) Ew çî eřa kirmaşan.



(20) Mîzege wegerd çû duris kiryas.




5. Deseş gerdkarî (DGk)

Deseş gerdkarî we deseşg üşîm gerdkarîg ser ew dese bû. Deseş gerdnîşî tüenî bû e temamker deseş gerdkarî.

DGk → Gk G


(21) Ew xastir le min qise kirdya.



Kan

1. Carnie, Andrew (2001). *Syntax*. Oxford: Blackwell.
2. Bahadur, M (2012). *The Syntax of Qasri Kurdish Based on Generative Grammar (written in persian)*. M. A. Thesis. Razi University of Kermanshah.
3. Jomsky, Noam. (1957). *Syntactic structures*. The Hague: Mouton.
4. _____. (1965). *Aspects of the Theory of Syntax*, MIT Press.
5. _____. (1989). 'Some notes on economy of derivation and representation ', MIT workingPapers in Lingu istics, vol. 1 0, 43-75 (also in *Principles and Parameters in ComparativeGrammar* (Freidin (ed), MIT Press).
6. _____. (1995). *The Minimalist Program*. MIT Press, Cambridge, MA.
7. Kayne, R. S. (1984). *Connectedness and Binary Branjing*, Foris, Dordrecht.

Rêzimana kurdî ji sala 1880



Di dîroka zimannasiya kurdî de bi berdeyamî behsa yekem rêzimana kurdî tê kirin ku kitêba qeşeyê îtalî Maurizio Garzoni ya bi navê *Grammatica e vobolario della lingua Kurda* (Rêziman û ferhengoka zimanê kurdî) ye sala 1787 hatiye çapkirin. Piştî binavkirina wê, lêkolerên zimanê kurdî adeten xwe di ser 150 salan re çeng dikin û tên behsa rêzimanivîsîna Celadet Bedirxan di nav kurdan de û lêkolînên D. N. MacKenzie di nav vekolerên kurdî yên biyanî de dikin.

Ne tek lê yek ji kesên ku di vê lezûbezê de tên jibîrkirin zimannasê alman **Ferdinand Justi** ye ku li nîva duyem a sedsala 19ê bi berfirehî li ser kurdî nivîsiye. Wî berhemên xwe yên li ser kurdî bi fransî û almanî nivîsîne. Çar berhemên wî yên giring – ên ku em jê haydar in – ev in:

- Dictionnaire Kurde – Français (Ferhenga kurdî – fransî)
- Les mots étrangers en Kurde (Peyvên biyanî di kurdî de – bi fransî)
- Les noms d’animaux en Kurde (Navên heywanan di kurdî de – bi fransî)
- Kurdisje Grammatik (Rêzimana kurdî – bi almanî)

Hem di herdu nivîsarên xwe yên bi fransî û hem jî di kitêba xwe ya almanî de Ferdinand Justi dide xuyakirin ku ew hem şarezayekî bilind ê zimanê kurdî û hem jî yên zimanên lêzim û cîranên kurdî jî bûye.

Di vê kurtenasandinê de em dixwazin bi taybetî bala xwandevevanan bikêşin ser kitêba wî ya bi almanî *Kurdisje Grammatik* ku di sala 1880 de derketiye û zêdeyî 250 rûpelan dirêj e. Kitêb li gor gelek kitêbên rêzimana kurdî yên heta vê dawiyê jî biserketî ye. Ew behsa gelek tiştên giring û kûr di kurdî de dike ku heta niha jî di piraniya kitêbên rêzimana kurdî de (çi bi kurdî û çi jî bi zimanên din) nayên dîtin.

Justi kitêba xwe bi pêşgotineke dirêj dest pê dike ku behsa têkiliyên kurdî û xizm û cîranên wî dike. Paşî ew kitêba xwe dike du beşên berfireh: dengnasî (Lautlehre) û peyvsazînasî (Wortbildungslehre). Bi taybetî beşa dengnasiyê ya bi qasî 100 rûpelan dirêj giring e û heta niha jî yek ji berfirehtirîn vekolînên li ser dengnasiya kurdî ye.

Di kitêbê de ti zaravayên kurdî nehatine bijartin lê piraniya nimûneyan bi kurmancî ne. Hin caran çend nimûneyên bi soranî jî yan bi kurmanciya nêzîkî soranî jî di pirtûkê de tên dîtin. Peyv û nimûneyên kurdî li gor nivîna wê demê ya bi alfabeya erebî hatine nivîsîn û transkrîbeyî alfabeya latînî hatine kirin.

Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku Ferdinand Justi bi kitêba xwe ya bi almanî *Kurdisje Grammatik* (Rêzimana kurdî) pêşengê dengnasiya kurdî ye û herwiha bi nivîsara xwe ya bi fransî *Les mots étrangers en Kurde* (Peyvên biyanî di kurdî de) jî piyonerê etîmolojiya kurdî ye.

Kitêb dikare li vê derê were xwandin: <https://archive.org/details/kurdischegramma00justgoog>

Cînavên kesî di soranî de

Dilyar Amûdî

Cînavk ew peyv in yên ku şûna navdêran di hevokê de digirin û di soranî de ji wan re **cênaw** tê gotin.

Em dê bi giştî soranî li gorî rêzimana kurmancî rave bikin anku tevî ku carinan termînolojiya rêzimana soranî û kurmancî ji hev nagire jî lê belê bi giştî ji bo pêşgirtina tevliheviyê em ê termînolojiya kurmanciyê bi kar bînin û car-car eger pêwîst bû em ê ya soranî jî binivîsin an wek nîşe diyar bikin.

Wek ku tê zanîn di kurmancî de du cûreyên sereke yên cînavkan hene ku di tabloya jêrîn de hatine destnîşankirin:⁸³

Xwerû	Tewandî
Ez	Min
Tu	Te
Ew (Yekjimar)	Wî/Wê
Em	Me
Hûn	We
Ew(Pirjimar)	Wan

Herwiha eger em bi awayekî din dabeş bikin anku li gorî axiver em dê bikarin tabloyeke wisa çêkin:

Kes/	Yekjimar	Pirjimar
Kesê yekem axiver	Ez/Min	Em/Me
Kesê duyem guhdar	Tu/Te	Hûn/We
Kesê sêyem yê neamade	Ew/(Wî/Wê)	Ew/Wan

Eger em bi heman awayî hewl bidin cînavkên soranî dabeş bikin em dê çend nîşeyan bibînin ku ya baş ew e ku ez pêşî wan diyar bikim:

⁸³ Hin caran cînavên kesane dikarin bi awayin din jî werin lê ew kêma in wek mînak cînavên **lihevxiştî** wek di **“bi wî”** dibe **“pê”** lê ji ber ku mijara me cînavkên kesane yên soranî ne em dê di vir de tenê li ser van bisekinin.

Nîşe

-Di soranî de du cûreyên cînavkan hene ku yek ji wan wek **SERBIXWE** tê binavkirin û bi giştî em dikarin di şûna yên kurmancî yên xwerû de bi kar bînin û ya dî **LIKAW** e ku em dikarin wek pêvekîrî jî wergerînin kurmancî û ew jî bi giştî şûna cînavkên tewandî digirin⁸⁴

Eger em bînin û heman tabloyan ji bo soranî jî çêkin tabloya me de wisa be:

SERBIXWE	LIKAW
Min	-m/-im
To	-t/-it
Ew	-î/-y
Ême	-man
Êwe	-tan
Ewan	-yan

Nîşe

Di soranî de, çertafên kesane û lêkerên bûnê jî wek cînavk tên diyarkirin lê belê em ê wan di nivîsên bê de û wek ku me li jorê diyar kiriye li gorî metoda kurmanciyê rave bikin.

Eger em tabloyê li gorî kesê axiver çêkin dê wisa be:

Kes/	Yekjimar	Pirjimar
Kesê yekem axiver	min/-m	Ême/Man
Kesê duyem guhdar	to/-t	Êwe/Tan
Kesê sêyem yê neamade	ew/(-î/y)	Ewan/Yan

Danberheva bikaranîna cînavkan

Ta ku em çêtir fêm bikin em dê çend hevokên kurmancî û yên soranî bidin ber hev em bawer dikin dê wisa çêtir were fêm kirin:

⁸⁴ Helbet dê awarteyên vê nîşeyê hebin lê di vir de armanc ew e ku em rêbazên giştî diyar bikin ta ku em dûre awarteyan bi awayekî hêsantir fêm bikin.

1. Serbixwe

Soranî	Kurmancî
Min deçim bo zanko	Ez diçim zanîngehê
Ême deçîn bo zanko	Em diçin/diçîn zanîngehê
To diçî bo zanko	Tu diçî zanîngehê
Êwe deçin bo zanko	Hûn diçin zanîngehê
Ew deçêt bo zanko	Ew diçe zanîngehê
Ewan deçin bo zanko	Ew diçin zanîngehê

2. likaw

Soranî	Kurmancî
Min namekem nard	Min (ew)name şand
Ême namekeman nard	Me (ew)name şand
To nameket nard	Te (ew)name şand
Êwe nameketan nard	We (ew)name şand
Ew namekey nard	Wi/wê (ew)name şand
Ewan namekeyan nard	Wan (ew)name şand

Nîşe

Wek ji van herdû tabloyan diyar dibe, cînavkên serbixwe di dema neborî⁸⁶ de û di demên borî de gava ku lêker negerguhêz be tên bikaranîn lê belê yên likaw di dema borî gava ku lêker gerguhêz be⁸⁷

Çend mînak

Kurmancî	Soranî
Min bir	birdim
Min xwar	Xwardim
Te anî/hanî	Hênat
Ez hatim	Min hatim

Ew ketin	Ewan ketin
Em ketin	Ême kewtîn

⁸⁵ Di vê tabloyê de cînavkên serbixwe ku bi rengên sor hatine diyarkirin berevajî rewşa tewandî ya kurmancî di soranî de dikarin werin nivîsîn/gotin lê ne giring in ji ber hebûna cînavkên likaw yên ku bi rengê reş û tarî hatine diyarkirin.

⁸⁶ Di soranî de ji aliyê morfolojîk ve tenê du dem hene ku ew jî dema borî û dema neborî lew em ê dema borî û dema neborî bi kar bînin.

⁸⁷ Helbet rewşin din jî hene ku cînavkên **Likaw** tê de tên bikaranîn û em ê behsa wan jî bikin.

Komefnasîy ziman – Ziman û Komef

Profêsor Peter Trudgill



Wergêran le inglîsiyewe: Hesenê Qazî

Hemû kes dezanê çî dekrê rû bida katêk dû kesî inglîsî ke qet pêştir yektiryan nedîtuwe le tirênêk da rûberûy yekdî dadenîşin – ewan be basî keşuhewa dest be qise kirdin legef yektirî deken – le hêndêk nimûnanda, ewe rege leber ewe bê babeteke bo herdûkyan xoşe. Egerçî, zorbey xelik zor be taybetî mirxyan lewe niye dest be lêkdanewey barudoxî hewa biken, ca boye debê hoy dîke bo legef yek duwanî lew çeşne hebê.

Yek le şîkirdinewekan eweye zor car rege tewaw naxoş bê miro be tenê hawseferî kesêk bê û neynasê û qisey legef neka. Eger herdûk la bédeng bin û çî miteqyan le ber derneye fezake lewaneye be tewawî zorekî û girij bê. legef eweşda, be qise kirdin legef kesekey dîke sebarete be babetêkî bêlayen, wekû keşuhewa, deretanî ewe pêk dê miro dostayetî û pêwendiyek dest pêbika be bê ewey naçar bê şitêkî zor bilê. Qise kirdinî ew core le tirên da- ke zor car rû deda, helbet nek ewende zorîş ke efsaney gelî pêy waye - nimûney başe bo coreyek le erkî komelayetî ke zor car ziman cêbecêy deka û raydeperênê. Ziman her tenê amrazî pêwendî û guwastinewey agadarî niye-, sebarete be awuhewa yan her babetêkî dîke, belkû amrazêkî zor girîngîşe bo damezrandin û pêk hênanî pêwendî legef xelkî dîke. Renge şitî here girîng sebarete bew pêkewe qise kirdiney ew dû kese inglîsiyey ême ew wuşane nebin ke ewan bekaryan dehênin, belkû layenî here girîng eweye ewan be yekewe qise deken.

Şîkirdineweyekî duwemîş heye. Tewaw delwê yekem kese inglîsiyeke, rege be anqestîş nebê, biyewê hêndêk şitî dîkeş sebarete be ew kesey duwem ke qisey legef deka bizanê- bo nimûne karî çiyê, yan helkewt û piley komelayetî çilone. Be bê ew core zanyarîyane ew nazanê legef kesî duwem çon bicûlêtewe, helbet kesî yekem, detuwanê be rêgey ciluberg û serepetî dîkey ruwaletî ra hêndêk

guman sebarete be kesî duwem le zeynî xoy da gelale bika – ewe le ser inglîstan raste û pêwîst naka le cêgay dîkeş awa bê – belam boy zor zehmete rastewrast, her nebê lew qonaxey nasiyawîda, sebarete be paşxanî komelayetî ew pirsiyarî lê bika, ewey ke ew detuwanê bika – û hemû şitêkî ke le doxî awa da dekrê be anqest niye - ewey ke we qisey bihênê û legefî bidwê. Duwaye kesî yekem lewaneyê be hasanî hêndêk şitî sebarete be kesî duwem bo derkewê. Ew şitaney ziyatir beweyra ke kesekey dîke delê çî bo dernakewê belkû ewey ke çonî delê, çunkû her katêk ême qise dekeyn natuwanîn hêndêk şit bo gwêgirî xoman sebarete be reçekî xoman û ewey ke çî core kesêkîn nedirkênîn. Rawêj (aççent) î ême û qise kirdinman be giştî nîşan deden ême xelkî kweyn, û çî core paşxanêkman heye. Lewaneyê ême hêndêk nîşaney bîr û ra û boçûnî xoşman derbibrîn, û gişt ew zaniyarîyane dekrê le layen ew xelkey ême qiseyan legef dekeyn bekarbihêndrê bo ewey yarmetîyan pêbika bîrurayek sebarete be ême gelale ken.

Ew dû layeney akarî zimanî le ruwangeyekî komelayetiyewey zor girîngin: yekem, erkî ziman bo damezrandinî pêwendî komelayetî, û, duwem, ew dewrey ziman deygêrê le guwastinewey zaniyarî sebarete be axêwer. Ewe aşkiraye ke ew her dû layeney akarî zimanî rengdanewey ew rastiyan ke pêwendiyekî dû layeney nêwxoyî zor nizîk heye le nêwan ziman û komef da, û lem kitêbeda be wurdî le ser herdûkyan cext dekeynewe.

Carê, ba le ser layenî duwem rawestîn wate dewrî ziman wekû' helgirî serepet 'clue-bearing'. Kesî yekem be rêgey geran be duway serepet da sebarete be kesî duwem, lew rêgeyê kelik werdegirê ke xelkî ser be paşxanî ciyawazî komelayetî û ciyawazî cugrafîyayî zimanî ciyawaz bekarî dehênin. Bo nimûne, eger kese duweme inglîsiyeke xelkî dewerî Norfolk bê, ew rege be zimanêk qise bika ke xelkî ew beşey wulat be karî dehênin. Eger kesî duwemekeş bazrganêkî ser be çînî nêwerast bê, ew be 'şêwe zimanêk' qise deka ke be î ewan denasrêtewe. Ew 'şêwe qise kirdine' zor car wek lehce, hêmay pê dekrê, lew nimûnaneda ewey yekemyan lehcey herêmî û ewey duwemyan lehcey komelayetî ye. Zaraway lehce, zarawayekî nasrawe û zorbey xelk pêyan waye ewan baş dezanin manay çiyê. Egerçî, le rastîda, be taybetîş zor hasan niye manay ew zarawaye diyarî bikirê – û eme sebarete be dû zaraway dîkeş ke pêştir basman kird wate ziman language û rawêj 'aççent' îş her waye.

Ba carê serincî xoman le ser zarawegelî ziman 'language' û lehce 'dialect' ko bikeynewe. Hîç kamyar nêwênerayetî çemkêkî be taybetî diyarî û bê emlawewla naken. Bo nimûne, ta ew cêiyey degerêtewe ser lehce 'dialect', le inglîstan ewe delwê, ke basî ' lehcey Norfolk ' yan ' lehcey Suffolk' bikirê, le layekî dîkewe, miro bo nimûne deştuwanê basî lehcey ziyatirî Norfolk bika - wate ' rojhelatî Norfolk

' û yan ' Başûrî Norfolk '. Tenanet ciyawazî nêwan ' lehcey Norfolk ' û ' lehcey Suffolk ' îş ewende bederewe û aşkira niye ke miro bîrî lê dekatewe. Eger êwe le Norfolkewe berew suffolk sefer biken, ew dewr û berey ke berew Başûr da pêyda deçin eger lêy bikolnewe gwêtan le lehcegelî gundaney xoparêz debê, û be lanî kemewe le hêndêk şwên botan derdekewê, ke xesletekanî zimanî ew lehcaney bere bere degordirên le cêyekewe ta şwênêkî dîke. Le nêwan lehcegelî Norfolk û Suffolk da dabiranêkî aşkiray zimanî bedî nakirê. Ewe nalwê be rêgey zaraway zimannasane da diyarî bikrê û rabigeyêndirê ke le kwê îdî xelk be lehcey Norfolk qise naken û le kwê dest deken be qise kirdin be lehcey Suffolk. Lêre da, zincîreyekî lehceyî cugrafîyayî le gorê daye, eger ême bêyn û ewey ke ew dû lehcaney le yektirî dadebirê be sinûrî nêwan dû estaneke dabinêyn, biryarekeman le ser binemay komelayetî (lem nimûneye da hukûmetî nawçeyî – siyasî) ye ta ewey ke le ser binemay rastiye zimaniyekan bê.

Heman core gîrugirft leget zarawe û kutey ziman dête gorê. Bo nimûne, Holendî û Almanî be dû zimanî ciyawaz dadendirên, leget eweşda, le hêndêk şwên le ser sinûrekanî Holend – Alman ew lehcaney lember û ewberî sinûr qiseyan pê dekrê yekcar zor we yektirî deçin. Eger ême bilêyn ke xelik le berêkî sinûr be zimanî Almanî û lew berî be zimanî Holendî qise deken, biryar danekeman dîsan le ser binemay komelayetî û siyasiye ta ewey ke be pêy hokare zimannasiyekan bê. Ew pinkte ewendey dîkeş be hoy ew rastiye dadegîrêtewe ke axêweran le her dûk berî sinûr zor car zor ziyatir le yektirî têdegen ta ewey ke axêweranî Almanî ew nawçeye le axêweranî lehcekanî Almanî şwêne dûrtirekanî Utrîş yan Swîs têbigen. Ke wabû, le hewldan bo ewey da ke miro biryar bida kesêk be çî zimanêk qise deka, ême detuwanîn bilêyn eger dû axêwerî ke tûşî yek dên le yektirî têngen, ewan be zimanî ciyawaz qise deken. Her awaş, detuwanîn bilêyn eger ewan le yektirî têbigen ewe be heman zimanî wek yek qise deken. Aşkiraye, ewe deman geyênête akamêkî seyr sebarete be Holendî û Almanî, û le rastîda, le zor nimûney dîkeş da.

Boye, bekar hênanî pêwaney ' le yek têgeyştinî dû layene ', yan pêwaney dîkey be tewawî zimannasane le hokargelî siyasî û kultûrî kemtir girîngn ke dû xesletî here girîngiyan birîtin le otonomî (serbexoyî) û hêtronomî (pê bestiranewe). Ême dekrê bilêyn zimanî Holendî û zimanî Almanî otonomin çunkû her dûkyan serbexon, şêwezarî standard kirawî zimanêkin, ke her kameyan jiyani le mer xoyan heye. Le layekî dîkewe lehce standard nekrawekanî Alman, Utrîş, û beşî Almanî axêwerî Swîs hemûyan be nîsbet Almanî standardewe hêtronomî, wate pêy bestirawnewe, sereray ew rastiye ke deşê ewan zor we yektirî neçin û renga hêndêkyan zor we lehce Holendiyekan biçin.

Emeş le ber eweye ke axêweranî ew lehce Almanîyane zimanî Almanî wek zimanî standardî xoyan çaw lê deken, be Almanî dexwênnewe û denûsn, û le radyo û têlêvîzîon da gwê le Almanî degirn. Axêweranî lehcekan le berî Holendî sinûr, be heman şêwe rojname Holendiyekan dexwênnewe û be Holendî name denûsn, û her core goranêkî standard kirdin le lehcekanyanda rû bida be arastey Holendî standard da dekrê, nek be rêbazî Almanî standard da.

Nimûneyekî zor tîjper ke tebî'etî komelnasîzimananey ew dû zaraweye wate ziman û lehce derdexa dekirê le Skandînaviya werbigîrê. Norwêjî, Swêdî û Danmarkî giştyan otonom û zimanî standardin, û her kameyan zimanî sê dewlet netewey ciyawazin. Serbaqî eweş, xelkî xwêndewar û perwerdedîtûy her sêkyan detuwanin be hasanî le yektirî têbigen. Belam sereray ew têgeyîştin û le yek halî bûney dû layeneş, çî manay niye bigutrê Norwêjî, Swêdî û Danmarkî le rastîda yek zimanin. çunkû eme nakokiyekî rastewxo le mer rastiye siyasî û kultûrîyekan saz deka.

Em lêduwan û qise le ser kirdiney tenê bekarhênanî pêwerî zimannasane bo dabeş kirdinî şêwezare zimaniyekan be zimanan yan lehcegelî ciyawaz, ke ême duwatir dîsan lem kitêbe da lêyan dedwêyn, yekem rûberûhatinî ême legel gîrugirftêke ke le lêkolînewe û twêjînewey ziman û komeş da zor bawe- ewîş gîrugirftî napeywestî û berdewamêtî ye, wate daxuda dabeşbûnî diyarde zimanî û komelayetiyekan be ser hebûnî ciyawaz derasteqanî da çî binaxeyekî heye, yan tenê birîtiye le efsaneyekî xoş. Lêre da başe hêmay pê bikrê ewe gîrugirftêke çunkû zarawey wekû ' çoçkney ' , ' Brooklynese ' , ' Yorkşire aççent ' , inglîsî Awstiraliyayî' Austiralan Engliş ' zor car bekar dehêndrên wek ewey ke ewan şêwezarî xo selmên û xobesî cwê cwê bin be xesletî be tewawî sinûr diyarîkirawî aşkirawe. Zor car hasane miro bilê ewe waye, belam miro debê hemîşe le bîrî bê ke wêney rasteqîne dekrê ta radeyekî berçaw zor lewe aloztir û pêçelpêçtir bê. Bo nimûne, ême detuwanîn basî' inglîsîy Kanadayî' û ' inglîsîy Emrîkayî' bikeyn wek ewey ke be tewawî dû hebûnî ciyawaz bin, belam le rastî da zor zehmete nîşaneyekî taqaney zimannasane peyda bikrê ke le gişt şêwezarekanî inglîsî Kanadayî da hawbeş bê û le hîç şêwezarekî inglîsî Emrîkayî da nebê.

Eger lem nuxtaye da tenê her badeynewe ser rastiye zimaniyekan, lêre da cwê kirdineweyekî dîkeş debê bikrê. Mebest le zarawey lehce, eger zor be çirî basî lêwe bikeyn, amajeye bew şêweye le ciyawazîyan de nêwan zimanda ke ciyawaziyekanî wuşeyî û rêziman û her weha telefuz kirdin weber degirê. Le layekî dîkewe zarawey aççent (rawêj) tenê hêmaye be ciyawazî le telefuz kirdin da, û zor car girînge ke em duwane be tewawî le yektirî bikrênewe. Ewe be tewawî le basî zimanî inglîsî da raste, sebarew bew lehceyey ke be inglîsî standard denasrê. Le zor layenî girîngewe ew lehceye le

lehcekanî dîkey inglîsî ciyawaze, û le cêda zor kes lewaneye pêyan seyr bê ke wek lehce amaje be inglîsî standard bikirê. legeŀ eweşda, ta ew cêgeyey ke inglîsî standard le rûy rêziman û qamûsiyewe le şêwezarekanî dîkey inglîsî ciyawaze, tewaw rewaye ke wek lehce le ber çaw bigîrê: zarawey lehce bo amaje kirdin be hemû şêwezarekan dekirê bekar bihêndrê, nek her tenê bo amaje kirdin be şêwezare nastandardekan. (serinc biden ême zarawey variety (şêwezar) wekû zaraweyekî bêlayan bekar dehênîn bo amaje kirdin be her' şêweyekî ziman' ke bimanewê qisey le ser bikeyn.)

inglîsîy standard ew şêwe şêwezareye ke be asayî le çap kirdin da dekar dekirdrê, û be asayî le medresan be deris degutrêtewe û be ew kesaney ke axêwerî xocêyî zimanekê nîn û deyanewê fêrî bin fêr dekirê. Her weha ew şêwezareşe ke be asayî xelkî xwêndewar û perwerde dîtû qisey pêdeken û le bilaw kirdinewey dengubas û barudoxe haw şubarekanda bekar dehêndirê. Debê ew xale cext bikrêtewe, ciyawazî le nêwan zimanî standard û nastandard, le pirênsîp da hîç pêwendî niye be ciyawazî nêwan zimanî resmî û zimanî qise pêkirdin û zarekiyewe, yan çemkî wek 'zimanî xirap'. Inglîsî standard hem şêwey resmî û hem şêwey zarekî heye, û axêweranî inglîsî standard wek axêweranî şêwezarekanî dî cinêw deden. (ewe pêwîste amajey pêbikrê çunkû wa wêdeçê hêndêk kes pêyan wabê eger kesêk zarawey remekî (slang expressons) yan destewşe û ristey naresmî dekar kird îdî ewe be standardî inglîsî qise naka.)Le rûy mêjûyîewe, şêwezarî standardî zimanî inglîsî le ser binemay ew lehce inglîsîyane pêşkewit ke le Lenden û dewr û berî qiseyan pêdekra û ew lehcanê be dem sedeyanewe be bekar hênanyan le layen axêweranewe le dadgeyan, le layen zanayanî zankokan û nûseranî dîke alugoryan têda kira, û duwatirîş le xwêndinge giştîyekan da (publiç şools) (birwane xwarewetir). Be têperînî zeman, ew inglîsîyey le layen endamanî çînî serewey komeŀ da le şarî pêtext dekar dekira be şêweyekî tewaw çawrakêş le zimanî deste komelayetiyekanî dîke dûr kewtewe û le rewî xoyda bû be modêl û sermeşqêk bo gişt ewaney deyanewîst be "başî" qise biken û binûsn. Katêk çapkirdin be berbilawî dahat, ew forme inglîsîyey be berbilawî de kitêbanda dekar dekira, û egerçî zor goranîşî bexoyewe dî, hemîşe xesletî xoy wek beriztirîn sîmay zimanî inglîsî parastuwe.

De nêw inglîsî standard da jimareyek ciyawazî herêmi hen ke serincî miro berew lay xoyan radekêşin. Bo nimûne inglîsî standardî Skatlendî be hîç cor 'eynî heman inglîsî standardî inglîsî niye, û inglîsî standardî Emrîkayî le hêndêk ruwewe tenanet zor le inglîsî standardî inglîsî ciyawaztire. Ciyawaziyekan birîtin le jimareyekî zorî wuşey nasraw wek lift (asansor)î Birîtanyayî, elevator î inglîsî, û hêndêk wurderîşalî rêzimanî: Birîtanyayî: I have got (werim girtuwe). Emrîkayî. I have gotten,

inglîsî: It needs waşing. Skatlendîlt needs waşed. Her weha jimareyekî dîkeş corecoreyî heye ke taybetî herême piçûktirekanin, wekû hêndêk beşî Bakûr û Nêwerastî inglîstan be berawerd kirdin legel şîwezarî Başûr. Bakûrî inglîstan You need your hair cutting (pêwîstî be mûy ser qule kirdinewe heye). Başûr: You need your hair çut, legeş eweş da, be giştî, inglîsî standard rêzimanêkî be berbilawî pejrêndiraw û kokirawey heye. Le nêw xelkî perwerdedîtû û xwêndewar, û be taybetî ew kesaney ke pile û payeyekî pitewyan heye û bedestelatin, - tewafuqêkî giştî heye ke çî inglîsî standarde û çî inglîsî standard niye - inglîsî standard eweye, ke le serewera be ser zincîreyek lehcegelî herêmî dasepawe - zincîrey lehceyî – û her boyeş dekrê be şêwezarêkî zimanî leserewera dandiraw nêwzed bikirê.

Legeş eweşda, ew tewafuqî giştîye sebarete be telefuzkirdin (pronunçiaton) le gorê da niye. çî standardêkî hemûgirewey didanpêdahêndiraw bo rawêj (aççent) î inglîsî standard le ara da niye, û be lanî kemewe, be qise, ewe dest deda ke inglîsî standard be her rawêjêkî herêmî yan komelayetî qisey pê bikirdrê. (le kirdewe da hêndêk rawêjgel (aççents) hene ke zor nawçeyîn û î ew core destanen ke berêje kemyan xwênduwe û perwerdeyekî ewtoyan nebuwe, û emeş le inglîsî standard da zor rû nada, belam be pêwîstî hiç pêwendiyek le nêwan rawêj yan rawêjgelêkî taybetî da niye.) Her weha tenê rawêjêk heye ke le inglîsî standard da debîndrê. Ewîş rawêjî inglîsî Birîtanyayîye, yan zor wurdîrî bilêyn rawêjî inglîsîy inglîsî, ke zimannasan be RP ('received pronunçiaton') wate (telefuzî wexo kiraw) î denasn. Eme ew rawêjeyê ke ta radeyekî zor le 'xwêndinge giştîye' şew û rojî û girane inglîsiyekanda pêş xira û eşraf û twêjî serewey çîne serewekan layengiryan lê dekird, her nebê bo kurekanî xoyan, û her ew rawêjeş ke ta ew nizîkaneş pêwîst bû bo ew kesaney le BBÇ da bêjerî biken. Em rawêje le zimanî xelik da nêwî cor be corî heye wek 'inglîsî Aksfordî', 'inglîsîy BBC' û hêştas ew rawêj (aççent) ye ke fêrî ew kesaney dekirê ke zimanî zigmakiyan inglîsî niye û deyanewê telefuzî Birîtanyayî fêr bin.

RP le rûyekewe be rêje naasayî ye çunkû jimareyekî kem lew axêweraney bekarî dehênin xoyan be herêmêkî cugrafiyayî taybetiyewe debestinewe û xoyanî pêwe denasnewe. RP ta radeyekî zor her be inglîstanewe bertenge, egerçî le paşmawey durgekanî Birîtaniya (Britîş Isles) (û ta radeyekî kemtir, le Australia, Newzealand û Efrîqay Xuwarû) ş da be pirêstîje. Ta ew cêgey bigerêtewe ser inglîstan, RP rawêjêkî na nawçey ye, legel eweşda, be pêwîstî qisekirdin be RP be manay qise kirdin be inglîsî standard niye. Inglîsî standard dekrê be her kam le rawêje herêmiyekan qisey pê bikirdrê, û le jimareyekî here zorî nimûnanîş da be asayî her awaye.

Le ber ewey ziman diyardeyekî komelayetî ye zor le nizîkewe be binaxey komef û sîstmekanî nirx û behay komelewe bestirawetewe, lehce û rawêjgeli ciyawaz be rêgey ciyawazewe heldesengêdrên. Bo nimûne, inglîsîy standard pile û pirêstîjî zor le her kam le lehce inglîsiyekanî dîke ziyatire. Eme lehceyeke ke xelkêkî zor zor be berzî denirxênin, û hêndêk berjewendî abûrî, komelayetî û siyasî bo ew kesane be diyarî dehênê ke bew lehceye qise deken û denûsn. RP îş pirêstîjêkî yekcar berzî heye, her weha hêndêk le rawêj (aççent)[s[e Emrîkayiyekan. Le rastîda ' 'eqlî nerîti' zorbey komele inglîsî axêwerekana zor lewey ziyatir têdeperênê. Inglîsîy standard û rawêje be pirêstîjekan ewende be pile û paye û şan û şewketin ke ewan be berbilawî be 'durust', 'cuwan' , ' xoş', ' pak' û htd. dadendirên. Şêwezarekanî dîkey na standard û bê pirêstîj zor car be 'hele', 'nahez', 'têkçû' û 'naxoş' denirxêndirên. Leweş ziyatir, inglîsîy standard car car her xoy be zimanî inglîsî dadendirê û bes, eweş bê ewey xoy lê biparêzdirê degate ewey ke şêwezarekanî dîkey inglîsî be coreyek ladan le pêwer bijmêdrên, û ew laderiyêş be tenbelî, nezani û nebûnî huşyarî û jîrî deqebîndrê. Be şêweyekî ewto be mîlyonan însan ke zimanî daykîyan inglîsiye han dedrên wa bîr bikenewe ke ewan' natuwanin be inglîsî qise biken'.

Legef eweşda, rastî eweye, ke inglîsî standard tenê şêwezareke le nêw jimareyekî zor şêwezar da, egerçîş yekî be taybetî girîngiyane. Le ruwangey zimannasane, ewe nakrê rewayetî ewey bidatê ke le şêwezarekanî dîke be baştir da bindirê. Lêkolînewey zanistîyaney ziman zanayanî geyanduwete ew bawerey ke gişt zimanan, û peywest be wan gişt lehcekan wekû sîstimgelî zimanî be yeksanî 'baş'in. Hemû şêwezarekanî zimanêk xawenî sîstimgelî binaxe darêjraw, pêçelpêç û aloz, û xo berêweberin ke betewawî becê û lebarin bo raperandinî pêdawîstiyekanî axêweryan. Ewe degate ew xaley ke dawerî kirdin sebarete be nirx û behay durustî û pakî şêwezare zimaniyekan komelayetî ye ta ewey ke zimannasane bê. Hiç şitêkî ewto le zatî şêwezare nastandardekanda niye ke kem nirixtir û piçûktiryan katewe. Her core kem nirxî û piçûktir bûnî ruwaletî yan le ber eweye ke ewan zimanî axêweranî kem îmtiyaz û destey pile nizmin. Be gutinêkî dî boçûn û dîtin sebarete be lehcegelî nastandard ew boçûn û dîtinanen ke binaxey komelayetî komef têtayanda reng dedenewe. Be heman şêwe, nirx û bayexe komelayetiyekan dekirê lew dawerî kirdinaneda reng bidenewe ke sebarete be şêwezare zimaniyekan dekirên. Bo nimûne, le şwênêkî wekû Bîrîtaniya ke şarnîşînî tewaw têtayda pêşkewtuwe, rawêje gundiyeکان, wekû rawêjekanî Devonşîre, Northumberland yan berzayiyekanî Skatlend Şçottiş Highlands, be le gwêyan xoş, dilgir, serncrakêş û betam dabindrên. Le layekî dîkewe rawêjgelî şaryane, wekû ewaney Birmingham, Newçastle yan Lenden, zor car wek nahez, serçil û naxoş deqebilêndrên. Ew core boçûne sebarete be şêwey qise kirdinî gundiyan le Dewlete

Yekgirtuwekanî Emrîka zor baw niye, û ew ciyawaziye dekrê be başî lewe da reng bidatewe ke nixxandinî jiyânî derewey şarî lew dû wulatane da ciyawaze.

Em nimûnaney xuwarewe radey ewey ke dawerîkirdin sebarete be durust bûn û pakî şêwezar û xeslete zimaniyekan çende komelayetîyanen ta ewey zimannasane bin derdexen. Gişt rawêjekanî (aççents) inglîsî dengêkî /r/ yan le wuşey wekû rat, rice da heye û zorbeyan le wuşey wekû carry, sorry da /r/ e yekeyan debîstirê. Le layekî dîkewe, jimareyek rawêj hen ke le wuşey wekû cart û car da dengî /r/yan niye. Ew wuşane le rabirdû da, wek nûsînekeyan nîşan deda dengêkî /r/ yan hebuwe, belam lew rawêjaneda ew denge kilor buwe cige lew wuşaneda nebê ke ber le vawêlêk heldekewê. Dengî /r/ le bestênî dîke da – wekû le kotayî wuşey (çar) yan ber le konsonant (çart)- dekirê wekû /r/ êkî ' na ber le vokal' basî lêwe bikirê. Ew rawêjaney ke /r/î na – ber le vokal yan niye birîtîn le hêndêk le rawêjan le Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka û Hêndî rojawa, zor le rawêjekanî inglîstan, zor le rawêjekanî Weylz û Nîwzîlend, û gişt rawêjekanî Australiya û Efrîqay Xuwarû. Lew rawêjane da cûte wuşey wek ma û mar be tewawî wekû yek telefuz dekirên. Ca êsta ême eger rawêjekanî inglîstan û Emrîka lemer ew nîşaneye beyekewe berawird bikeyn, rastiyeke çawrakêşman bo rûn debêtewe. Le inglîstan, leger yeksan bûnî şitekanî dîke, ew rawêjaney ke /r/î na-ber le vokal yan niye pileyeyan berztire û be 'durust'tir lew rawêjane dadendirên ke heyane. RP(telefuzî wexo kiraw) wate rawêjî be pirêstîj ew /r/ey niye, û /r/î na- ber le vokal zor car le radîyo û tîlêvîzîon û tiyatir da be kar dehêndrê bo nîşandanî ewey ke keseke xelkî derewey şar, perwerdenedîtû yan herdûkyane- zor car miro le zincîrey komêdî radîyowe deybîstê bo ewey xesletî galteamalî bidrkêndirê. Le layekî dîkewe, egerçî barudoxî ew denge le Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka zor aloztire, le hêndêk le beşekanî wulat da tewaw be pêçewaney raste. Le şarî New York, leger yeksan bûnî şitekanî dîke, ew rawêjaney ke /r/î na-ber le vokal yan heye zor be pirêstîjtir û 'durust' tir lew rawêjaney dadendirên ke nîyane. Telefuz kirdinî wuşey wek car û cart be bê /r/ le rûy komelayetiyewe be nizmî dezandirê û be giştî, axêweran ewendey le terazûy komelayetî da le serwetir bê, ewendeş rêy tîdçê ke ziyatir /r/ na- ber le vokal bekar bihênin. Le şarekanî inglîstanda ke her dû core telefuz kirdineke dekirê bibîstirên, wek le Bristol û Reading, ew nimûnaye tewaw be pêçewaneye. Be gutinêkî dî, dawerîkirdinî nixx û beha sebarete be ziman, le ruwangey zimannasane, be tewawî xoserane û bê hoye. Le /r/ î na-ber le vokal da şitêkî zatî baş yan xirap, durust yan hele, helkewtû yan bê kultûr niye. Dawerî kirdinî ew şêwe ye dawerî kirdinî komelayetîn ke le ser binawanî manapêdanî komelayetî helnirawin le mer xesletêkî zimanî taybetî le nawçeyekî berbas da.

Ew rastiye ke awaye, bew manaye niye zimannasan pê lewe nanên ke komeş şêwezare zimaniye ciyawaziyekan be şêwey ciyawaz denrxênê. Şêkirdinewey zimanî basî lebarbûnî şêwezarekan û ('nek durust bûnyan) bo helumercî ciyawaz dehênête gorê, û bernamey fêrkirdinî zimanî bêgane be asayî wa pêşxirawe ke şêwezarî standardî zimanêk fêrî fêrxwazan bika. Le heman katda, zorêk le zimannasan lew baweredan ke ew core boçûn û dîtiney le serewe da basî lêwe kira hêndêk car dekrê sedeme bigeyênê. Bo nimûne detuwanê akamî dilnexwazî derûnnasaney komelayetî û perwerdeyî lê bikewêtewe eger ew mamostayaney ke inglîsî standard fêrî axêweranî şêwezare nastandardekan dekan sebarete be şêwey qisekirdinî şagirdekanyan dujmnayetî binwênin (biruwane bendî 10î em kitêbe).

Zimannasan her weha le ber hoy dîke serinc dedene ser boçûnî zeynîş sebarete be ziman. Ew core boçûnane girîngn, bo nimûne le lêkolînewey goranî zimanda, û zor car detuwanin yarmetî biken bo şêkirdinewey ewey boçî lehcekan degordirên, kengê û çon degordirên. Lêkolîneweyek sebarete be şêwey axawtinî şarî New York le layen komelzimannasî pêşeng Wiłam Labov nîşan deda le şerî Dinyagirewey Duwem bemlayewe dengî /r/î na-ber le vokal lew şare da le qisekirdinî twêjî serewey çînî mamnêwncî da yekcar zor ziyadî kirduwe. Ewey bûte hoy ew gorane dekrê leber hatinî be lêşawî axêweran lew core şwênanewe bê bo şar le mawey şer da ke le qisekirdinî ewanda /r/î na-ber le vokal standard yan nîşaneyekî pirêstîj buwe, belam ew gorane zor aşkiratir leber goranêkî pêwendîdare le boçûnî zeynîda sebarete be telefuzkirdinî ew core le layen gişt axêweranî şarî New Yorkewe. Be dem lêkolînekewe boçûnî zeynî zanyarîderekan taqî dekirawe bo ewey bizandirê daxuda ewan /r/ î na-ber le vokal be nîşaneyekî pirêstîj dadenên yan na. Ewaney ke wulamekanyan nîşanî deda ke ew /r/ e boyan nîşaneyekî pirêstîje be 'r- pozîtîv' be nêw kiran. Xiştey jimare 1 le sedî twêjî serewey axêweranî çînî mamnêwncî le sê destey temenî nîşan deda ke 'r – pozîtîv' bûn leget lesedî mamnêwncî bekarhatinî /r/ î na-ber le vokal le qisekirdinî asayî le nêw her heman sê destê da. Le xişteke da debîndrê bo ew axêweraney ke temenyan le xuwarewey çil salan buwe bekarhênanî /r/ î na-ber le vokal le qisekirdinyan da zêde bûnêkî zorî pêwe diyare. Tenanet be kar hênanî /r/ / le layen axêweranî cewantirîşewe zor ziyadî kirduwe. Belgekanî dîke deyselmênin ke goranî boçûnî zeynî hoy ew gorane bûn ta ewey ke akamî bin. Wate goran le boçûn û dîtinî zeynî da, geywete goran le nimûney qise kirdin da, egerçî le rastîda tenê ewe twêjî serewey çînî mamnêwncî buwe ke goranêkî girîngî le qisekirdinî xoyda pêk hênawe.

Xiştêy 1. boçûn sebarete be bekarhênanî / r /î na- ber le vokale: le nêw twêjî serewey

çînî mamnêwncî le şarî New York da

Le nêw 100 zanyarîder da ke temenyan le nêwan 8-19 salan buwe 48 kesyan /r/î ber- le vokalyan bekar hênawe

Le nêw 100 zanyarîder da ke temenyan le nêwan 29 – 39 salan buwe 34 kesyan /r/î ber- le vokalyan bekar hênawe

Le nêw 62 zanyarîder da ke temenyan le serewey 40 salan buwe 9 kesyan /r/î ber- le vokalyan bekar hênawe

Boçûnî zeynî sebarete be şêwe zimaniyekan hemîşe ew core kartêkeriyey nabê. Nimûney serewe nîşan deda eger telefuz kirdinêkî taybetî de nêw komelgeyekî taybetîda be nîşaney pirêstîj dabindrê, îdî ew demî lasay dekirêtewe û gewre dekrêtewe. Ew core pêvajoye dekrê berew arastey pêçewaneş birwa. Le Vineyardî Martha, ke le rabirdû da durgeyekî terîk bû le nizîk qeraxî New Zealand le Bakûrî Rojhelatî Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka, le akamî zêde bûnî serdanî xelk lew durgeye ke le mangekanî hawîn da bo hesanewe deçûne ewê goranî çawrakêşî komelayetî pêk hat. Ew gorane komelayetîyane alugorî zimanişyan be dû dahat. Ew lêkolînewaney ke kirawn, dîsan le layen Labovewe, nîşan deden dengî vawêl le wuşekanî wek house, moute, loud da lew durgeye da be dû corî ciyawaz telefuz dekrên. (ewe le ser telefuz kirdinî wuşey wek ride û right îş her waye.) Yek lew telefuzane kemtir be pirêstîj û telefuzî konebawî taybetî le mer durgekeye û be teqrîb awa telefuz dekirê [hus] , ke yekem kutî diftongeke , zor we dengî vawêlî wuşey şirt deçê yan yekem vawêl le wuşey about [ibawt] da. Ew telefuzey duweme le durgekeda zor taze ye, û zor le nizîkewe we şêwey derbirînî vawêl le RP (telefuzî wexokiraw) û hêndêk le rawêjekanî be pirêstîjî bejayiyekanî Emrîka deçê: wek [haws] û [ebawt]. Seyre, ew karaney le salanî 1960 kanda kirawn nîşan deden şêwey ' kone baw'î telefuz kirdin le ziyad bûn buwe. Telefuzî [aw] gewre dekrayewe û zor ziyatir le axawtinî xelkêkî ziyatir da debîtsra. Derkewt ke ew alugore zimaniye le ber boçûn û dîtinî zeynî axêweranî durgeke sebarete be ew şêwe zimaniye buwe. Xelkî xocêyî durgeke hestî bêzarîyan beranber hêrşî belêşawî xelkî derewe û ew goran û dadoşîne abûriyey le tek xoyda hênabûy têda pêk hatbû. Ca boye ew xelkaney ke zor le nizîkewe xoyan be şêwey jiyânî durgekewe denasiyewe destyan kird be gewre kirdinewey telefuzî taybetî durgeke, bo ewey nasêney ciyawazî komelayetî û kultûrî xoyan nîşan biden, û bawerî xoyan be nirx û behay kon cext bikenewe. Ewe manay ewe bû ke telefuzkirdinî

'kone baw' le rastîda le layen hêndêk beşî cewantirî komelgeke bûjêndirayewe û we birew xira. Ew meyle zor zeqtir be şêwe qisekirdinî ew cewananewe diyar bû ke le durgekewe bo kar çûbûne şaran û gerabûnewe - be wedwadanewey jiyân le wanda. Belam ewe le nêw ewaney da arezûyan bû le durgeke barken û le bejayiyekan bijîn lanî here kem bû. Ew pêvajoye ta radeyek layenî wuşyaraney hebû leweyda ke axêweran bew rastiyezan dezanî ke rawêjî durgeke ciyawaze, belam ew wuşyariye nedegeyşte nasînî girîngî dîftongeke xoy. legeŀ eweşda, axêweran, bê ewey hestî pêbiken sebarete be girîngî komelayetî ew telefuz kirdineyan dezanî, û boçûnyan sebarete bew le ber boçûn û dîtinî komelayetîyan erêyî bû. Be gutinêkî dî, goranî zimanî hemîşe be arastey pêwerî be pirêstîj da naçê. Be pêçewane, hemû core dîtin û boçûnî dîkey sebarete be ziman debê le ber çaw bigîrên. Ziman detuwane hokarêkî zor girîng bê bo nasînewey desteyî, hawpêwendî desteyî û derbirîn û nîşandanî ciyawazî, û katêk desteyek bikewête ber hêrşî derewey xoy, nîşane û derbirî ciyawaziyekan lewaneye girîngiyekî zortir peyda biken û gewretir bikrênewe.

Le bendekanî duwatirî em kitêbe da ême hêndêk le pêwendiyê aloze nêwkoyiyekanî ziman û komet dekolînewe, ke le nêw ewanda boçûne zeyniyekan her rehendêkyanin. Ew core pêwendiyê nêwkoyiyane zor şêweyan heye. Le zor nimûnanda ême haw-çeşnawçeşnî zimanî û diyarde komelayetiyekan bedî dekeyn, bawekû ewe, le hêndêk nimûne da, zor becêtire pêwendiyêke her tenê berew arasteyekewe le ber çaw bigîrê – wate baladestî û karlêkerî komet le ser ziman, yan be pêçewane. ême lêreda dekirê le nimûneyekî ew pêwendiyê yek layeneyewe dest pêbikeyn ke wa dandirawe lemer kardanewey zimane le ser komel. Ruwangeyek heye, ke be şêwey ciyawaz le layen zimannasanî corbecorewe pêş xirawe, ke zor car wekû ferziyey sapîr- orf ' Sapir- Whorf hypothesis ' amajey pêdekirê, û nêwî dû merdmnas û zimannasî Emrîkayî wate Edward Sapîr û Bênyamîn Worf î lêndrawe, û zor car pêwendî dedrêtewe be nêwî ew dû zanaye. Ew ferziyeye teqrîben delê axêweranî xocêyî ziman zincîreyek katagorî pêk dehênin ke wekû coreyek şebeke heldesûrên û be rêy eme da le dinya têdegen, her weha ew şebekeye şêwey polênkirdin û çemkandinî diyarde ciyawazekan le layen ewanewe berteng deka. Zimanêk detuwane be rêgey kartêkirdin yan tenanet kontrol kirdinewe form bida be ruwangey cîhanî qisepêkeranyewe. Lew bareyewe zorbey zimane be reçek Urûpayiyekan zor weyektirî deçin, ewîş rege le ber pêwendî hawbeşî jênêtîkîyan û, zor girîngtir leweş, pêwendî û têkelawî dûrudrêjî kultûrî ewan legeŀ yektir û ew komelane da bê ke têtayanda qiseyan pêdekirdê; rege dîtin û ruwangey cîhanî axêweranyan û komelekanyan le ber ew hoye be hîç cor zor le yek dûr nebin. Ca, eger, ciyawazî zimanî ciyawazî têgeyştin û nasîn berhem

bihênê, ême debê ewe be rêgey le ber yek ronan û berawurd kirdinî komelêk le zimanan lêk deynewe ke le rûy kultûriyewe zimananî zor ciyawaz û leyektirî dabirawin.

Bo nimûne, zimane Urûpayiyekan, zeman bekar dehênin. Diyarê ew bekarhênane wenebê be tewawî wekû yek bê, belam be asayî zor dijwar niye, ba bilêyn şeweyekî inglîsî werbigêrdirête ser hawtakey be Feransewî yan Almanî. Le layekî dîkewe, hêndêk le zimanan le beşekanî dîkey dinya, zemanan niye, be lanî kemewe bew şeweyey ême deyzanîn. legeŀ eweşda, ewan de zimanekanyan da dekrê dû şewey kirdar û şewey çalakiye ciyawazekan le yektirî bikenewe ke axêweranî Urûpayî eme be şeweyekî dîke nîşan deden û be dewrî da dexulênewe. Bo nimûne, şewey kirdar, dekrê ferq be ciyawazîyan bikrê be pêy ewey ke axêwer basî barudoxêk degêrêtewe yan çawerêy barudoxêk deka, yan be pêy mewday rûdaweke, xêrayî, yan xesletekanî dîke. Ca boye, ewe seyr niye, eger têruwanîni ew xelkey ke zimanekeyan 'zemanan' gerdan naka le têruwanîni ême bo cîhan ta radeyek ciyawaz bê: Têgeyîştinî ewan le kat, û tenanet le mer 'îlet û me'lûlîş, lewaneye taradeyek ciyawaz bê.

Nimûneyekî zor be wurderîşaltir ew barudoxe rûn dekatewe. Em şewaney kirdar le xuwarewe le berçaw bigirn le zimanî Hopî da ke yekêk le zimane resenekanî Emrîkayî ye: cami wate 'şîtêk' lew ser ew serewe berew nêwewe dirawe', camimita wate 'şîtêk' 'perawêzî lëndrawe', hani wate 'şîtêk' 'be şewey alqeyî xuwar buwetewe 'haririta wate ' le ser hêlêkî pêçawpêç helkewtuwe', paci wate 'heldrawe', pacicita wate ' şîtêk' mişar mişar kirawe', roya wate ' heldegerêtewe', royayata wate ' desûrêtewe' ber le hemû şit, bo axêweranî zimananî Urûpayî serncrakêşe , bo nimûne, le zimanî Hopî da: it is bent wate 'xuwarbuwetewe' kirdarêke û awelnaw niye. legeŀ eweş, şitî here serincrakêş, ew şeweyeye ke zimanî Hopî bo derbirîni pêwendiyekî rêzimanî bekarî dehênê, be rêgey pêvajoyekî asayî ziman da (wate' dûpate kirdinewey sîlabî kotayî û lê ziyad kirdinî ta') le nêwan ew manayane da ke ême debîni pêwendîyan beyekewe heye; eger bîryan lê bikeynewe, ke ême be asayî nayanbîni ke pêwendîyan beyekewe hebê. Rîşû le rastî da zincîreyekî lêk dabirawe, didane didaneyetî(mişar mişarî)le rastîda le jimareyek qelişt pêk dê, pêçêk helbet le berdewamî xuwarbûnewe pêk dê. şiteke eweye, le ber ewey zimanî Hopî rêgeyekî zimanî dehênête gorê bo ewey ew pêwendîyane damezrênê, ême dekrê way danêyn ke axêweranî zimanî Hopî zor ziyatir le axêweranî zimananî dî lew pêwendîyane agadarin.

Mebest lem nimûneye eweye nîşan bidrê ke le hêndêk nimûnanda ciyawazî nêw zimanekan dekrê bigate ciyawazî le têgeyîştinî dinya. Ewe derî dexta ke zimanî Hopî be şewey asayî le pêwendî manayî

ew çeşne birêk be ciyawaz le axêweranî inglîsî têdega, ke hêndêk boyan diware bo sereder kirdin lew pêwendîye rêzimanîyaney ke le zimanî Hopî da şiyawin. leget eweşda, betewawî bo ême delwê lew pêwendîyane ser der bihênîn. Leweş ziyatir, wergêran le nêwan zimanî Hopî û zimanî inglîsîda be tewawî heldesûrê û guncawe. Ewe nîşan dededa ke her core şêweyekî pitewî ferziyey Sapir-Whorf – le mer ewey - ke, ba bilêyn, ziman bîr berteng dekatewe- nakrê bipejrêndirê û qolî le ser bikêşrê. leget eweşda, ew nimûneye dekrê awa dabindirê ke bîrî 'adetî ta radeyek le layen zimanewe be sinûr dekirê. Axêweranî zimanî inglîsî be şêwey asayî lew pêwendîye manayîyaney wa le serewe da nîşan dira agadar nîn- belam bertengî ewto eger pêwîst bê dekrê zor be hasanî yekla bikirênewe.

Ferziyey Sapir- Whorf le egerî ewe dedwê ke boçûn û têruwanîni însanekan sebarew bew dewruberey têyda dejîn dekrê be rêgey zimanekanyanewe sinûrî bo dabindirê. Ewey ke kemtir qise heldegirê pêwendî yeklayeneye ke be arasteyekî pêçewaneda heldesûrê – wate kardanewey komeî le ser ziman, û ew şêweyey ke dewr û ber le zimanda reng dedatewe. Yekem, zor nimûne hen bo ew dewrubere fîzîkiyey ke komeî têyda dejî ke le zimanekey da rengî dabêtewe, be asayî le binawanî henbaney wuşanî da- bew şêweyey ke ciyawazî nêwan manakan be wuşey sadewe derdebîdrê. Bo nimûne, le katêkda zimanî inglîsî, tenê taqe wuşeyekî heye bo reindeer, beranekêwî, zimanî Samî (zimanî Laplandî) le Bakûrî Skandînavîa çendîn wuşey bo ew ajale heye. Hoy eme aşkiraye, bo zimanî samî pêwîste bituwanê be şêweyekî karîger çeşne ciyawazekanî beranekêwî le yektirî bikatewe. helbet, zimanî inglîsîş, tewaw le wuzey da heye heman le yek kirdineweye bika, bo nimûne bilê 'immature reindeer' beranekêwî sawa, 'two- year-old reindeer' , berane kêwî dûsale, û htd. Belam le zimanî Samî da ew le yek kirdinewane wuşêndrawin lexicalized – wate be wuşeyekî sade û takane derdebîdrên.

Nuxtey duwem eweye, ke dewruberî komelayetîş dekrê le ziman da reng bidatewe, û detuwanê zor car karlêkerî le ser binawanî peyv (voçabulary)îş da hebê. Bo nimûne, sîstimî xizmayetî le komelêk da be giştî le peyvekanîda bo diyarîkirdinî xizmekan reng dedatewe, û ewe yek lew hoyaneyey ke merdimnasan radekêşê berew ew rehende taybetiyey ziman. Bo nimûne, ême dekrê way dabinêyn, ke ew tayaney ke pêwendî xizmayetî girîng le komelekanî inglîsî zimanewe beyekewe debestinewe be rêgey peyvî sadey serbexowe nîşan dedrên: son kur, daughter kiç, grandson newey kur, granddaughter newey kiç, brother bira, sister xuşk, father bab, mother dayk, mêrd husband, wife jin, grandfather bapîr, grandmother nenk, unçle mam, xal, aunt pûr, çousin amoza. Helbet, ême detuwanîni basî xizmayetî dîkeş bikeyn wek eldest son kurî gewre, matenal aunt pûr le layenî

daykewe, great uncle mame gewre û second cousin bin amoza, belam ciyawazî nêwan pûr ' le layen daykewe' û pûr ' le layen babewe' le komelî êmeda girîng niye, her boyeş le henbaney wuşey inglîsî da reng nadatewe û niye.

Ew nuxteye dekrê be amaje kirdin be peyvekanî ke bo xizmayetî le komelgey dîke da bekar dehêndirên be wurde rîsaltir şî bikrêtewe. Bo nimûne le zimanî xocêyî resenî Australiyayî Njamal (niyamal) da, wekû zimanî inglîsî, pazde wuşey wuşêndiraw (Lexiçalized)bo le yek kirdinewey xizmayetî hen, belam ew şêweyey ke ew zaraweyane leget hawta inglîsiyekanyan berawurd dekrên ciyawaziyekî zor le nêwan ew dû komelane da aşkira deken. Zarawey 'mama' le zimanî Niyamal da pêwendiyekî sadey xizmayetî derdebirê, belam debê be zimanî inglîsî be pêy ew çuwar çêweyey basî lêwe dekrê be manay ciyawaz werbigêrdirê wekû: bab, mam, amozay nêrîney daykubab û îtir. Be gutinêkî dî, ew zarawey bo gişt ew nêrînane dekar dekirdrê ke xizmî babin û ser be wecêkn. Bo axêwerî inglîsî, rastî here çawrakêş lêre da eweye ke dû wuşey inglîsî father bab û uncle mam be zimanî Niyamal dekrê wekû yek be zaraweyek werbigêrdirên. Aşkiraye ke le yek kirdinewey father bab û father's brother biray bab le komelî Niyamal da nakrê heman girîngî hebê ke le komelî xomanda heyetî. Le layekî dîkewe, le katêkda zimanî inglîsî zarawey unçle bo biray bab û mêrdî xuşkî dayk, û her weha biray dayk û mêrdî xuşkî bab bekar dehênê, zimanî Niyamal bo cûtokey yekem, zarawey mama û bo ewî duwemyan 'karna' be kar dehênê. Zarawekanî dîkey nêwlênanî xizman wekû inglîsî wec le yektirî nakatewe, belkû dûrî wecan le yektir dekatewe. Bo nimûne, le zimanî Niyamal da piyawêk detuwanê heman zarawey maili bo nêwhênanî babî babî xoy û xuşkî jinî kurî kiçî xoy bekar bihênê, lêreda mebest eweye ke kesî ber bas le dû wecanî têperanduwe û boye ew zarawe xizmayetîyane dû layenen – ca eger emin 'maili' to bm, etoş maili emnî û be pêçewane. Le inglîsîş da ême zarawey dû layeneman heye, wekû çousin amoza û brother bira, belam ewane tenê le nêw 'eynî wec da awan.

Her wek komeş bew şêweyey le zimanda reng dedatewe, goranî komelayetîş detuwanê goranî zimanî lê bizêtewe. Bo nimûne, eger binawanî komelî Niyamal be şêweyekî rîşeyî goraba û zor ziyatir û niziktir we komelî inglîsî zimanî Australiyayî çûba, ew demî ême çaweruwani eweman dekird ke sîstimî zimanî xizmayetîş her awa goranî be ser dabê. Ewe le mer zimanî Rûsî rûydawe. Le mawey serubendî salanî nêwan 1860 ta em rojgare binawanî sîstimî xizmayetî Rûsî le akamî çendîn rûdawî girîng da alugorêkî rîşeyî têda pêk hatuwe: rizgarî Sêrfekan le salî 1861, şerî Yekemî Dinya girewe, şorşî Komonîstî 1917, herwezîkirdinî kiştukal, şerî Duwemî Dinya girewe. şorşêkî berçawî komelayetî

û her weha siyasî ruwîdawe, û ewe goranî pêwelkawî zimanîşî legeŀ xoyda hênawe. Bo nimûne, le nêwerastî Sedey Nozdehemda, be biray jinyan degut 'şurin', le katêk da êsta delên brat zheny wate biray jin. Her awaş pêşû be jinî birayan degut 'nevestka', êsta delên zhena brata jinî bira. Be gutinêkî dîke, ew le yek kirdinewaney ke le pêşû da wuşêndrabûn (Lexicalized), le ber ewey ke girîng bûn, êsta be rêgey deste wuşewe derdebirdirên. Nemanî girîngî ew xizmayetiye taybetîyane, û ew gorane zimanîyaney le tekyan da hatûn, le ber ew rastiyan ke goranî komelayetî le Rûsiye akamî geyişte sazûnî binemaley piçûkî nawkî.

le Sedey Nozdehemda zorbey Rûsekan le xêzanî babmeznî gewre da be yekewe dejyan. Lew serubendî da, dişan(jinanî birayan) hemuyan ser be xêzanêk bûn, belam êsta be asayî be ciyawazî dejîn û herkes malî xoy heye. Her awaş, zarawey 'yatrov', ke be manay jinî biray mêrd bû be tewawî kwêr buwetewe û bizr buwe. Le zemanî kon da ewe zaraweyekî dû layeney girîng bû, manay, bo jinêk hebû ke bo nêwlênanî kesêk bekarî bihênê ke le şanî xoyda bû- wate jinêk le derewey rayeley ser be bab meznî xêzan ke hatbuwe nêw xêzaneke. Le ber ewey ke girîngî ew şan û pileye îdî bizir buwe (helbet xizmayetiyeke xoy na), boye peyve pêwelikênekeş nemawe.

Nuxtêy sêhem eweye, cige le dewruber û binaxey komelayetî, bayex û behakanî komelîş detuwanê karlêkerî le ser zimanekey hebê. Şêwey here serincrakêşî ke ewe rûdeda be rêgey diyardeyekeweye ke be taboo (bive) benêwbange. Bive dekrê awa binasêndrê mebest akarêke ke wa dezandirê be şêweyekî serewey xorskî qedexe bê, yan be naexlaqî û nabecê dabindirê, bive serukarî legeŀ akarêke ke pawane yan be ruwalet kirdeweyekî namentîqî têdaye. Le ziman da, bive bew şitanewe bestirawetewe ke nagutirên û dernabirdirên, be taybetî ew core wuşe û zaraweyaney ke be karnahêndirên. Helbet, le kirdewe da, ewe be sadeyî manay waye ke sebarete be bekarhênanî asayî ew core şitane qeyd û bend hene- eger ewan her qet negutrên asteme le ziman da bimênnewe!

Wuşey bive le zorbey zimanekanda hen, û eger zor car ew rêsa sinûdiyarî kirawaney ke bekarhênanyan berbest deken reçaw nekirên ewe dekrê bigate siza diran yan şerm û şûreyî le nêw komeŀ da. Zor lexelik qet wuşey ew çeşne bekar nahênin, û zor xelkî dîş tenê le barudoxî zor besnûr da bekaryan dehênin. legeŀ eweşda, bo ew kesaney wuşey bive dekar deken 'şikandinî rêsayan û pê le berey xo ziyatir rakêşan' lewaneye narastewxo be nîşaney tuwanayî yan azadî dabindirê ke ewan be awatî dexwazin.

Be giştî, ew core wuşeyey ke le zimanêkî taybetî da bivawî ye, rengdaneweyekî başe be lanî kemewe le sîstimî ew bayex û baweraney le komelî berbasda hen. Le hêndêk komelgeyanda, wuşey cadûyî dewrêkî girîng degêrê le dîn da, û hêndêk wuşey taybetî ke be behêz dadendirên le efsûn û cadû da dekar dekirdirên. Le beşe ciyawazekanî dinya wuşegelî bive birîtîn lew wuşaney le mer destî çep, pêwendî mê, yan le mer hêndêk ajelî kêwî be kar dehêndirên. Hêndêk wuşes, zor tund bivawîtirn le hêndêk wuşey dîke. Le dinyaî inglîsî zimanda, zor le wuşe here bivawîyekan êsta ew core wuşanen ke pêwendîyan be sêks, be duway ewda ew core wuşaney ke pêwendîyan be pîsayî û dînî mesîhiyewe heye dên. Eweş rengdanewey ew cexte gewreyeye ke le rûy nerîtîyewe le kultûrî ême da le ser exlaqî sêksayeti kirawe. Le kultûrekanî dîkeda, be taybetî de naw pêroyanî Roman – Katolîk da bive here behêzekan dekrê pêwendîyan be dînewe hebê, û le Nowêj û Swêdî protêstantîşda, bo nimûne, zarawe û kutey be pitewî bivawî ew core wuşanen ke le ser îbilîs degutirên.

Ta em duwayiyane, rêsay zor tund û tîj sebarete be bekar hênanî hêndêk wuşey bive le zimanî inglîsîda le barî qanûnîyewe le gorê da bû û le rûy komelayetîşewe piştî ew core rêsayane degîra. Hênde lemêj niye, bekarhênanî wuşey wekû 'fuck' kirdewey sêksî, û 'çunt' cêyî şermê, le çap da dekra bigate rawedûniranî qanûnî û tenanet zîndanî kiranîş, û ew wuşane hêştas le zorêk le rojnamekanda be berbilawî bekar nahêndrên. Helbet, radeyekî zor 'le dîsan bîr le ser kirdinewe' sebarete be bekarhênanî ew çeşne wuşane le gorê daye. Egerçî bekarhênanîyan le rûy têknîkiyewe le hêndêk nimûnanda qedexe bû û êstas detuwanê qedexe bê, belam ew core wuşane le qisekirdinî rojaney hêndêk beşî komelgeda be berbilawî dekar dekirdirên. Eweş ta radeyekî zor le ber eweye ke wuşe bivekan zor car wekû wuşey cinêw bekar dehêndirên û her leber eweş behêzin. Zor le xelik le komele modêrnekanî ke le rûy têknolojiyewe pêşkewtûn îdî'a deken baweryan be sîhr û cadû niye. Ilegel eweşda, hêştas, şitêk heye ke zor le nizîkewe we dewruberî cadûyî deçê be bekarhênanî wuşey bivawî le zimanî inglîsîda. Bekarhênanî wuşey bivawî le bestên û çuwarçewey mawe pênedraw da, wek le bernamey tîlêvîzîonî da, kardanewey zor tund û tîjî zor xelik dewrûjênê û be ruwalet debête mayey ratilekan û bêz û qêzî zor le xelik. Leweş ziyatir, ew bertek nîşandane, bertek nîşandanêkî najîraneye le ast wuşeyek, nek çemkêk. Le bernameyekî tîlêvîzîonî da be tewawî mawe dedrê bigutirê 'sexual intercourse' cûtûnî sêksî'. Ca boye wuşey bive be rûnî hem rastiyekekî zimanî û hem derûnasaneye. Ewe wuşekanin ke hestyan pêdekrê hele bin û her boyeşe ewende behêz û bekarin.

Tuwanayî û destelatî ew sîhre le Birîtaniya bew rêgeye da derdekewê ke BBC le hêndêk bonan da ta ew radeye le amadeyî têknîkî da çuwete pêşê ke beşdarîy telefonî gwêgiran le hêndêk bernamey

zîndûy radyoyî da bibrê eger le qisekanyanda wuşey bive hebin. Û kanale têlêvîzîyoniye serekiyekanî Emrîka be şewey berdewam deng dexene ser wuşey bive û kipî deken. Miro detuwanê way lê têbiga ke ewan le akamî bekar hênanî hêndêk wuşe yan kardanewey bekarhênanyan peşewin û tenanet tirsîşyan rê denîşê. Wuşey bivey ew çeşne lewaneye le hêndêk barudox da tewaw le cêy xoyanda bin, belam ewan hêştta le zorbey amrazî rageyênerî giştî bilaw kirdinewe da qoliyan le ser nekêşrawe.

Deste wuşey ' hêştta carê na' ew xêrayiye nîşan deda ke nimûnekanî wuşey bivawî dekrê bigordirên. Sizay qanûnî be dijî wuşegelî herze û qêzewen le dinyay inglîsî ziman da xerîke bizir debê û meylêkî zor le mer hebûnî boçûnêkî zor jîranetir, û kemptir sîhrawî le ast wuşe bivekan le peresendin daye-êsta' şikandinî rêsakan'kemptir diramatîke lewey ke hebû, her nebê le hêndêk barudoxanda. Nimûneyekî Birîtaniyayî benêwbangî ewe bekarhênanî awelnawî 'bloody' xwênawî, le layen Bernard Şaw raye wekû wuşeyekî hejêner le filmî Pigmalion da, ke îdî êsta kes lêy narewêtewe. Lêreş da, goranî komelayetî, le goranêk le akarî zimanîda reng dedatewe. Le layekî dîkewe, hawkat legef ewey ke cîhanî inglîsî ziman zor nasktir debê be dijî ew core babetaney ke ferq û ciyawazî nayeksanane dexene nêw xelik le ser binemay xesletî komelayetî yan fîzîkîyan, wuşey wekû 'niger' qulereş, 'cripple' seqet, 'poof' qunder, heta dê ziyatir bivawî debin û bekarhênanyan heta dê ziyatir hejênerin.

Pinktêkî dîkey serincrakêş ew karlêkeriye duwemeye ke wuşey bive dekrê le ser ziman xoy heyانبê. Le ber bêmeylî zorî axêweran bo derbirînî wuşey bive, yan wuşegelî nizîk le wan, le hêndêk barudox da ew wuşaney ke le rûy dengsaziyewe we wuşe bivekan deçin lewaneye le ziman da nemênin û derhawêjrên. Bo nimûne, zor car degutrê le zimanî inglîsî da le ber ew hoye wuşey rabbit [kerwêşk] cêy wuşey coney [ke wek kenî telefuz dekrê] girtûtewe. Her heman şêwe şîkirdinewe lemer bekarhênanî berbilawî wuşey 'rooster' keleşêr le inglîsîy Emrîkayî daye le birî 'cock' keleşêr, ke em wuşeyey duwem le rûy dengsaziyewe le wuşey endamî zayendî piyaw zor nizîke. Sebaret bew takaney ke dû zimanen, be ruwalet ewe dekrê le nêw dû zimananiş da rû bida. Mamostayan basyan kirduwe ke axêweranî kiçî Emrîkayî Indiyenî zimanî Nûtka be tewawî pêyan naxoşe û nayanewê wuşey inglîsî 'suj' [awa] bekarbhênin le ber we yekçûnî dengî ew wuşeye legef wuşey 'vagina' cî şermê le zimanî Nûtka da. Her awaş, bas dekrê xwêndkaranî Taylendî le inglîstan katêk be zimanî xoyan be yekewe qise deken eger axêweranî inglîsîyan belawe bê le bekar hênanî hêndêk wuşe xo deparêzn wekû [kha:n] ke le zimanî Tayî da be manay'rûxan' e û le inglîsîda be corêkî dîke debîstirê, neka ewe be sûkayetî bizandirê.

Emaney bas kiran, hêndêk lew rêgeyanen ke pêyanda komef kar le ser ziman deka, û deşê pêyanda zimanîş kar le ser komef bika. Ême wek dîtman jimareyek şêwe û rêge hen ke ziman û komef be yektirî debestinewe, û le bendekanî dabêy em kitêbe da ême le hêndêk layenî ziyatirî ew be yekdî bestiraneweye dekolînewe. Le mawey çil û kusûr salî rabirdû da, zanîn û ferq pêkirdinî le zêdey girîngî ew pêwendî û be yek bestiraneweye geyişte pêgeyîştin û peydabûnî rêbaz û bin- dîsîplînî nwê le zimaninasî da: ewîş komelnasîziman e. Ewe renga giştandinêkî berbilaw belam becê bê eger bigutrê ke zorbey beşekanî pêkhênerî zimannasî ber le firçik girtin û seqamgîrbûnî komelnasîzimanî be tewawî çawyan le pêwendî nêwan ziman û komef heldebuward. Le zor nimûnanda ewe le ber hoy baş bûn. Cext kirdinewe le ser 'îdîolêkt' – qise kirdinî take kesêk le katêk da û be şewazêk – sade kirdineweyekî pêwîst bû ke geyişte peydabûnî çendîn berewpêş çûnî tîyorî. Legef eweşda, her wek ta êsta nîşanman dawey, ziman zor ziyatir diyardeyekî komelayetî ye. Lêkolîneweyek le ser ziman le ser yek be bê amaje kirdin be çuwarçêwe komelayetiyekey bimanewê û nemanewê degate fit kirdin û derhawîştinî hêndêk le rehendekanî zor aloz û serincrakêşî ziman û le kîs danî derfet û deretan bo berewpêşçûnî ziyatirî tîyorîk. Yek le hokare serekiyekanî ke geywete peregirtin û geşe sendinî lêkolînewey komelnasaney ziman têgeyîştin û ferq pêkirdinî girîngî ew rastiyeke ke ziman diyardeyekî zor legoranhatû ye, û ewey ke ew legoranhatuwîye dekirê ewendey ke le ber goranî komele awaş le ber goranî ziman bê. Ziman her kodêkî sade û hasan niye ke be yek şêwe le layen gişt xelkewe le hemû barudoxêk da bekar bihêndrê, û êsta zimannasan lewe têdegen ke hem heldesûrê û hem be qazance hewil biden bo pêweçaran û lêk kirdinewey ew pêçelpêçîye.

Ke wabû, komelnasîziman, ew beşeye le zimannasî ke ziman wekû diyardeyekî komelayetî û kultûrî şî dekatewe. Ew zanste buwarî ziman û komef detwêjêtewe û pêwendiyekî nizîkî legef zaniste komelayetiyeke heye, be taybetî derûnnasî komelayetî, merdimnasî, cugrafiyay însanî, û komelnasî. Lêkolînewe lew dîtin û boçûnaney ke sebaret be formekanî ziman hen, wekû bekarhênanî /r/ î na-ber le vokal, yek le nimûney ew karane ye ke le bin banî derûnnasî komelayetî ziman da kirawe. Le layekî dîkewe, lêkolînewe le zarawegelî xizmayetî le zimanî Niyamal da, nimûneyekî başe ke dekewête buwarî zimannasî merdmnasane, û lêkolînewe lew rêgeyey ke pêyda lehcekan bere bere le herêmêkewe ta herêmêkî dîke le yek dûr dekenewe, wek le Norfolkewe ta Suffolk, yan le Holendewe bo Alman, dekewête ber buwarî zimannasî cugrafiyayî, her wek jimareyek lew babetaney ke ême le bendekanî 8 û 9-î em kitêbeda lêyan dedwêyn. Bendî 6 ew şêwe û rêgey bekarhênanî ziman tawtuwê deka, wek ewey le nimûney seferî tirên da basman kird, wate têkelawî û hawkirdeyî komelayetî, lewane hêndêk layenî şîkirdinewey dîskors û êtnogirafi axaftin. Le bendî 7

Malperên zimanî

Lîsteyeke malperên ferheng û rêzimana kurdî

Ferhenga mezin a kurdî-kurdî Wîkîferheng: <http://ku.wiktionary.org>

Mala Ferhengên kurdî: www.ferheng.org

Ferhenga kurdî-tirkî: <http://www.turkcekurtcesozluk.com>

Ferhenga kurdî-tirkî-İnglîzî ya peyvên teknîkî:

<http://www.endezyar.org/index.php>

Ferhenga peyvên qanûnî:

<https://zimannas.wordpress.com/2015/07/07/mafname-ferhenga-dadnasi-ya-kurdi-İnglizi/>

Ferhengeke kurdî-tirkî: <http://yekbun.com/f.asp>

Ferhengeke kurdî-tirkî-kurdî: <http://www.hakkarim.net/cgi-bin/yenisozluk.cgi/>

<http://kurdis.net/index.php?topic=234.0>

Ferhengeke kurdî-almanî: <http://www.dicts.info/dictionary.php?l1=German&l2=Kurdish>

Pîrozname bi ziman û zaravayên kurdî:

<http://www.kurdish-bible.org/>

Kurdziman (ferhengên elektronîkî û mobîl): <http://kurdzman.com/>

Kîborda / klavyeya kurdî:

<http://www.lexilogos.com/keyboard/kurdish.htm>

Ferhenga swêdî-kurmancî û swêdî-soranî: <http://lexin.nada.kth.se/lexin/>

Ferhenga wênedar: <http://lexin.nada.kth.se/lang/trio/nk/nordkurdiska.htm>

Peyvên matematîkê bi kurdî: <http://www.matematikakurdi.com>

Rastnivîsîn: http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/arif_zerevan_bingehen_rastnivisandine_02.pdf?N

[R:60](#)

Erkên herfekê di kurdî de: A

a

1. yekem herfa û yekem vokala alfabeya kurdî ye û nîşana dengê dirêj e
2. ax!, ox!, of!, oy!, wey!, heyha! weyla!: *A çi hewayek xweş e!* 'Ax çi rojek xweş e!' *A çi zalim e!* 'Wey çend zordar e!'
3. e, erê, belê, bersiva erênî
4. 'Çi?' '(Min nebihîst ka) te çi got?'
5. li şûna peyvên yekjimar yên zayendmê yên diyar: *A min sor e* 'Sêva min sor e.'
6. li şûna navdêrên zayendmê daku navdêr neyê dubarekirin: *Roj a wan e* 'Roj roja wan e.'
7. dikeve navbera du diyarkeran yên ku li dû peyvek yekjimar ya zayendmê tên: *pirtûka sor a li erdê*
8. li şûna "ew tişt (ku)": *A ku wî got, me ji mêj ve dizanî* 'Ew tişt, ya ku wî got, me ji mêj ve dizanî.'
9. ji çend kesan yan tiştan yeke diyar ya zayendmê: *Du keç bûn. A bejndirêj pirçreş bû* 'Du keç bûn. Keça bejndirêj pirçreş bû.' *Sê kes bûn: yek şabanû, yek dotmîr û yek jî xidam. Navê a xidam Xecê bû* 'Navê xidamê Xecê bû.'
10. bi gotina, li gor gotina, bi şîreta, li gor şîreta, li gor pêşniyaza: *Ger bi a min bikî, qet ji vir naçî.*
11. di hin devokan de dikeve pey kirdeyên / subjeyên yekjimar yên zayendmê û wateya berdeamiya kirinê didiyê: *Xezal a dinivîse* 'Xezal aniha / vê gavê / vê kêlikê dinivîse.' *Ez a dixwim* 'Ez li ser xwarinê me.' *Tu a dixwînî* 'Tu tam vê bîskê / kêlikê dixwînî.' *Ew a dipêje* 'Ew aniha dipêje.'
12. di hin devokan de lêkera "bûn" di rewşa yekjimar ya dema nihoyî de bo kirdeyên yekjimar yên zayendmê dide: *Jiyan a li malê* 'Jiyan li malê ye.' *Ez a li malê nînim* 'Ez ne li malê me.'
13. di hin devokan de di dema borî ya dûdar de li bireserên (objeyên) yekjimar yên zayendmê zêde dibe: *Min ew kitêb a kirriye* 'Min ew pirtûk kirriye.' Bo navdêrên / cînavên yekjimar yên zayendnê binere: ê
14. di hin devokan de li şûna "e" ya forma dema nihoyî ji lêkera "bûn" bo cînava sêyem ya yekjimar: *Ew mezin a* 'Ew mezin e.'
15. destpêk: *Ji a ta z* 'ji destpêkê ta dawiyê', 'ji serî ta binî'
16. bijare, herî baş: *Ev hêk kalîte A ne* 'Ev hêk yên herî baş in.' 'Ev hêk yên bijare ne.'
17. kurtebêjeya van peyvên: *amper, ar*

-a

1. paşbendikek e bo peyvên yekjimar yê zayendmê dema nomînek (cînavêk / navdêrek / rengdêrek) diyarker li dû wê peyvê bêt: *keça wê, jina Elî, pirtûka kevn, guleka sor, dareka stûr*
2. dikeve dû hin peyvan û wateya "wê..., ya ku" didiyê: *cara, dema, bîska, gavakêlîka, sala, wexta* :*Dema ez şiyar bûm, ew hinda bûbû 'Wê demê, ya ku ez şiyar bûm, ew hinda bûbû.'*
3. di zimanê devkî de paşbendika pirrjimariyê ye dema peyv serbixwe be (ango ti nomîn li dû wê neyên): *Du pirtûka bîne lê pêûsa li wir bihêle* 'Du pirtûkan bîne lê pêûsan li wir bihêle.'
bn -an.
4. di zimanê devkî de paşbendika pirrjimariyê ya dikeve pey cînavên diyarker dema ew li pêş peyvên pirrjimar yê tewandî bin: *eva sêva yan va sêva* 'van sêvan', *ewa xoxa yan wa xoxa* 'wan xoxan'
bn -an.
5. di hin devokan de dikeve dû peyva zayendmê ya li pey cînava "ev": *Ev pirtûka xweş e* 'Ev pirtûk xweş e.' Li gor hin devokan heman riste dikare wiha jî bêt got: *Ev pirtûke xweş e / Ev pirtûka han xweş e / Ev pirtûka ha xweş e / Ev pirtûka he xweş e / Ev pirtûka hanê xweş e / Ev pirtûka henê xweş e*
6. paşbendikek e hin peyvên nû pê hatine çêkirin ku wateya "ya / yê (pirr baş) tiştêkî dizane" dide: *beza, fehma, xwenda, zana*. Bo wateya van peyvan, di ferhengê de li wan bigerre
7. xwedî-, ya/yê tiştêkî heye: *axa: xwedîax, xwedîerd, yê ax / erd heye*
8. pê hin navên jinan ji yê zelaman tên çêkirin:
Fehîm > Fehîma, Hisên > Hisna, Kerîm > Kerîma û hwd

a-

1. tam, di nêzîktirîn demê de:
aniha, anêzîk
2. pêş, pêşve, ber bi ... ve (bo çend nimûneyan binere): *anîn, asteng, avêtin, hatin*

-a-

1. Navbendikek e hin peyvan bi hev re girê dide: *rengareng*

Kêşey zimanî resmîy kurdî

Pirsgirêka zimanê kurdî yê resmî

Emîrî Hesepûr

wergerandin li kurmancî: Kulturname

Beşî yek

Beşa yek

1- Dařistinî baseke

Dariřtina behsî

Kurdî, wek zorbey zimane zîndûwekanî dinya, zimanêkî fire lehce ye û her lehceş be çend bin-lehcey rengawřeng razawetewe. Pênc sede lemew pêş, Şerefname, le naxî komełgey derebegî Kurdistan û lecengey desełatî emaretekanda, nûsî:

Kurdî, wek piraniya zimanên dinyayê yê zîndî, zimanekê pirlahceyî ye û her lehce jî bi çend bin-lehceyên (devokên) rengîn xemilî ye. Pêncsed salan berî niha Şerefnameyê, ji nîva civaka derebegî ya Kurdistanê û deshilatdariya mîrgehan nivîsî:

"Tayfeyê ekrađ çar qism est û zeban û adabêşan moxayêrê yek dîgir est (awel) Kirmanc (doyem) Lor(sêyem) Kelhor (çhareme) Guran", wate "tayfey Kurdan çuwar beşin û ziman û dab û destûryan lêk cîyawaze ..."

»*Tayfê ekrađ çihar qisim est we ziban we adab îşan mixayir yekdîger est (ewel) kurmanc (duyem) lur (siyem) kelhur (çwareme) goran*« Wate »*tayifeya kurdan çar beş in û ziman û urf û destûrên wan jêk cida ne.*

Le komełgey derebegî da, ke zorbey xelk bestirabûnewe be zewî û le ladê kişt û kaŷyan dekird û be şêwey zarekî deduwan, fire lehceyêti barî bawî jiyaniş şar û gund bû. Şerefxan, hakmî emaretî Bidlîs,

le seretay Şerefname da basî nakokî Kurdan de ka û defê: "Tewayfê akirad motabê'et û motawê'et hemdîger nimîkonend û êtêfaq nedarend", wate " tayfey Kurdan şwênî yektir nakewin û gwêrayefî yektir naken û yekkewtû nîn". Le dirêjey ew base da, hoyekanî ew çend berekîye lêk dedatewe beîam cîyawazî zimanî û lehceyî wek serçawey nakokî dananê. Le serdemî emaretekan da, çî le dezgay dewlet da û çî le komeleş da, basî resmî kirdinî lehceyêk û zimanêk nedehate goşê.

Di civaka derebegiyê de ku piraniya xelkê bi erdî ve girêdayî bû û wan li gundan çandin dikir û bi şêweyekê zarekî dipeyvîn, pirlahceyî barê belav yê jiyana bajar û gundan bû. Şerefxan, hakimê îmareta Bidlîsê, di destpêka Şerefnameyê de behsê nakokiya kurdan dike û dibêje: »we tewayifî ekirad mitabeet we mitawetî hemdîger nemî kunend we îtîfaq nedarend« wate »Tayifeyên kurdan nadin pey hevûdu û guhdariya yekûdu nakin û ne yekgirtî ne«. Ew di dirêjahiya wî behsê xwe de li ser egerên wan nakokiyên radiweste lê ew cidahiya zimanî û lehceyî wek çavkaniya nakokiyên danane. Di serdemê mîrgehan de çî di saziyên dewletê û çî di civakê de behsê resmîkirina lehceyêkê û zimanekî nedihat kirin.

Bo wêne, le derbarî emaretî Erdelan da, ziman û edebîyatî Hewramî, Farsî û 'Erebî baw bû. Le derbarî emaretî Bidlîs da, be zimanî Kurdî, Turkî, Farsî û 'Erebî qiseyan dekird û deyan nûsî. Le komeleş da, dengbêj û goranî bêjî Kurd û Hermenî û Cûleke û Azerî be zimanî yektir Goraniyan deket û beyt û bawyan degêşawe.

Ji bo mînak di mîrgeha Erdelan de ziman û edebiyata Hewramî, farsî û erebî belav bû. Di mîrgeha Bidlîsê de bi zimanê kurdî, tirkî, farsî û erebî dihat axiftin û nivîsandin. Di civakê de jî dengbêj û stiranbêjê kurd û ermenî û cuhî û azerî bi zimanên hevûdu stiran digotin û beytên yekûdu yên belav vedigêran.

Dîyar e serbaqî têkelawî ziman û lehcekan, le komeleşey fire lehceyî û fire zimanî da, zimanekan û lehcekan naberaber bûn beîam nîzamî derebegî tuwanay nawendî kirdin û resmî kirdin û dasepandinî hîç lehceyêk yan zimanekî nebû. Bo wêne, suîtanî 'Usmanî ne deyewîst ne deytuanî dekarhênanî zimanî Kurdî qedexe bika yan Turkî be ser emaretekan da dabsepênê, beîam rêjîmî nasyonalistî komarî Turkîye, duway heşita saî qedexe kirdinî zimanî Kurdî, êste ke rêge deda be nûsînî, dekarhênanî çend herifî Kurdî be curim dade nê.* Ya xu le ewcî deselatî xelafetî Îslamî da, xelîfekanî Bexdaye ne deyantuwanî û ne deyanewîst zimanî Kurdî xeyrî qanûnî biken beîam Satê'ul Husrî, nasyonalistî nasirawî 'Erebî û mudîrî me'arîfî dewletî taze damezrawî 'Êraq, rêgey ne deda

Kurdî 'Îraq bo baştir nûsînî zimanekeyan çend nîşane le ser herifî 'Erebî dabinên be biyanûy wey ke ew kare destêwerdan le zimanî xwîaye.

Diyar e li gel tevlihevîna ziman û lehceyan, di civaka pîrlehceyî û pîrzimanî de, ziman û lehce ne hevber bûn lê sistema derebegiyê pêçêbûna navendîkirin û resmîkirin û bi ser de zalkirina çî lehceyekê yan zimanekî nebû. Wek mînak, sultanê osmanî nedixwest û nedikarî zimanê kurdî qedexe bike yan tirkî bi ser mîrgehan de bisepîne, lê rijêma nasyonalîst ya komara Tirkiyeyê ku ew piştî heştê salên qedexekirina zimanê kurdî niha rê dide nivîsînê, ew hêj bikaranîna çend herfên kurdî bi cerîme hisêb dike (). Yan jî di gupîtka deshîlata xîlafeta îslamî de, xelîfeyên Bexdayê nedikarî û nedixwest zimanê kurdî bikin neqanûnî lê Satî' Elhuserî, nasyonalîstê ereb yê naskirî û rêveberê mearîfa dewleta Îraqê ya nû damezrandî rê nedida kurdên îraqê ji bo baştir nivîsandina zimanê xwe çend nîşanan li ser herfên erebî dabinin, bi hêceta hindê ku ew kar desttêwerdan e di zimanê Xudê de.*

Ke le serdemî emaretekan da nûsîn be Kurdî destpêkird (Sedey Şazde), Hewramî û Kirmancî û Soranî wek sê lehcey edebî, yek be duway yektir da û serbexo le yektir, seryan hefêna. Dekrê bihêyn fire lehceyêti heta safî 1898 (biawbûnewey hewê rojnamey Kurdî) û bigre ta damezranî dewletî 'Îraq (1918) û destpêkirdinî deselatî Sovêt le Qefqaz (1921), kêşeyêkî sîyasî nebû. Duway serheftanî nasyonalîsmî Kurd (le axiruoxirî Sedey Nozde da) û nûsînî Kurdî be çap û damezranî netewe-dewletêkan ke sîyasetî zimanî corawcoryan hebû, cîyawazî lehcekan wek kêşeyêkî sîyasî hate goşê. Mebestim le sîyaset û sîyasî bûnî kêşey le hcekan lêre da eweye ke ziman, le ruwangey nasyonalîstîyewe, wek amrazêkî girîngî pirojey netewe ronan û dewlet ronan çawî lêdekirê dena cîyawazî zimanî û lehceyî hem êste û hem le rabirdûda leget dabeşbûnî naberaberaney deselat têkefaw bûwe. Nasyonalîsm, cîyawazî lehcekan wek berheftêk le beramber pêkhatin û dařistinî netewe dadenê û amadeye bo yekgirtinî netewe lehcekan be zebir û zeng serkut bika.

Ku nivîsîna bi kurdî di serdemî mîrgehan de (sedsala şazdeyê) dest pê kir, hewramî û kirmancî û soraniyê wek sê lehceyên edebî yek li pey ya din û serbixwe ji yekûdu ser hilda. Em dikarin bibêjin pîrlehceyî heta sala 1898-ê (belavbûna rojnameya yekê ya kurdî) û bigire heta damezrandina dewleta Îraqê (1918) û destpêkirina desthilata Sovyetê li Qefqazê (1921), ne pîrsgirêkeka sîyasî bû. Piştî serhildana nasyonalîzma kurd (di dawiya sedsala nozdeyê de) û nivîsîna kurdî bi çapê û çêbûna netewe-dewletan ku sîyasetên wan yên zimanî yên cor bi cor hebûn, jêkcidahiya lehceyan wek

problemeke siyasî hate pêş. Mebesta min li vê derê ji siyasî û siyasîbûna problema lehceyan ew e ku ziman, bi dîtina nasyonalîstî, wek amrazekê giring yê projeyê neteweyên û dewletên têt dîtin, heke cidahiya zimanî û lehceyî hem niha û hem di demê borî de li gel dabeşûna newekhev ya desthilatê têkel bû. Nasyonalîzim jêcidahiya lehceyan wek astengekê di rêya pêkhatin û dariştina neteweyî de dadine û ew amade ye ji bo yekgirtina neteweyî lehceyan bi topizê zorê ji nav bibe.

Cîyawazî lehceyî xoy le xoyda serçawey naberaberî û zuhm û hefawardin (timîz, tib'îz) nîye. Deng û wuşe û rêziman hîç xisletêkî wayan nîye ke naberaberî pêkbênin. Bo nimûne, hîç dengêk yan herifêk (bo wêne: h, k, ε, x) le dengêk yan herifêkî dî (bo wêne: h, q, ' , x) baştir, cuwantir, xoştir, yan resentir nîye. Kes natuwanê, be piştbestin be zanistî zimannasî, bîselmênê ke, bo wêne, zuşey saxtey "fermî" le "resmî" baştîre yan cuwantire yan resentire, ya xo ristey " nabêt zarêk be zorî be ser zarêkî dîda bîsepêndirê" le ristey " nabît zerek bi zorî li ser zerekê dî bihête sepandin"resentir û cuwantire. Be lam zor le mêje selmandirawe ke "resenayêtî", "cuwanî", û "rastî" xoyan dîyardey mêjûyîn û be bîryar û qerarî komelayetî pêkdên. Hîç qaîdeyêkî risteyî wek fa'îl – fê'l – mef'ûl (bo wêne le Înglîsî da) baştir û cuwantir le qaîdey dî wek fa'îl – mef'ûl – fê'l (bo wêne le Kurdî da) nîye. Ya xo we pêşikewtinewey Înglîsî le gişt zimaneke dinya hîç pêwendî be rêzimanekewewe nîye. Be lam le komeleşe da, ke le ser binçîney naberaberî û nakokî abûrî û komelayetî û siyasî daşjrawe (cûtyar û axa, kirêkar û desmayedar, jin û pîyaw, ladêyî û şarsitanî, mindal û dayik/baw, htd), ziman û deselat têt dehatên: ziman – le dengekan ra bigre heta saxtî risteyî û me'neyî – hem le nûsîn û hem le qisekirdin da, debête meydanî xebatî siyasî û komelayetî.

Jêcidahiya lehceyî bi xwe ne çavkaniya newekhevî û zilm û ferqiyê ye. Deng û peyv û rêzimanî çî xesleteka weha nîne ku newekheviyê pêk bînin. Ji bo nimûne çî dengêk yan herfek (ji bo mînak: e, k, u, x) ji dengêk yan herfeka dî (ji bo mînak: 'h, q, 'i, 'x) baştir, ciwantir, xweştir yan resentir nîne. Kes nikare bi rêya zansîte zimannasîyê bîselimîne ku ji bo mînak peyva sexte ya (fermî) ji (resmî) baştir e yan ciwantir e yan resentir e, yan jî hevoka (nabêt zarêk be zorî be ser zarêkî dî da bîsepêndrê) ji hevoka (nabît zerek bi zorî li ser zerekê dî bihête sepandin) resentir û ciwantir e. Lê gelek ji mêj de hatiye selimandin ku (resenî), (ciwanî), û (rastî) bi xwe fenomenên dîrokî ne û ew bi bîryar û werara civakî pêk tîn. Çî qaîdeyeka hevokî wek fa'îl – fiil – mef'ûl (bo nimûne di Îngilîziyê de ciwantir nîne ji qaîdeyeka dî wek fa'îl – fiil – mef'ûl (bo nimûne di kurdîyê de). Yan jî pêşketina Îngilîziyê bêtir ji hemî zimaneke dî yê dînyayê çî peywendî bi rêzimanê wê ve nîne. Lê di civakan de, ku ew li ser binyatê newekhevî û nakokîya abûrî û civakî û siyasî hatine darêştin (cotyar û axa, kirêkar û sermayedar, jin

û mêr, gundî û bajarî, zarok û dayik/bab, htd.), zimanî û desthilatê lêk dializînin: Ziman -ji dengan bigire heta avahiyê hevok û manayê- hem di nivîsîn û hem di axiftinê de, dibe meydana xebata siyasî û civakî.

Nûsîn be elf û bê nizîkey 5500 saî le mewpêş destîpêkird beîam zorbey zimanekanî dinya, ke jimareyan degate hewt hezar, sunetî nûsîn û pêşîney edebîyan pêk nehênawe, eweş le ber ewey nîye ke ew zimanane nizm û duwakewtûn. Bo wêne, nûsîn be Farsî nizîkey duwazde sede lemew pêş destîpêkird û mêjûy nûsîn be Kurdî le pênc sede tênapêrê û ew naterazîye le ber ewey nîye ke Farsî le barî saxtî zimanîyewe le Kurdî baştîre yan pêşikewtûtîre. Herweha, destpêkirdinî nûsîn be Hewramî û Kirmancî û Soranî û pêgeyştinyan wek lehcey edebî hîç pêwendî be saxtî zimanî (sîstêmî dengî, wuşeyî, risteyî, û me'nayî) ew lehcanewe nebû. Hoyekan le derewey saxtî zimanî wate le barudoxî kometayetî û abûrî û sîyasî da lengeryan girtibû. Ege r lehcekanî dî (wek kirmaşanî, Dimilî...) berhemî edebî nûsrawyan nebûwe be hoy ewe nîye ke le barî zimanîyewe le Hewramî û Kirmancî û Soranî nizimtir. Herweha, jiyânî edebî sê lehcekan hawkat destîpênekird. Hewramî û Kirmancî sê sede le Soranî le pêştîr bûn. Weduwakewtinî Soranîş le ber "naresenayetî" û "duwakewtûyî" ew lehceye nebû.

Nivîsîna bi alfabeyê nêzîkî 5500 salan berî niha dest pê kir lê piraniya zimanên dinyayê, ku hejmarawan digehe heft hezaran, hêj neketine ser rêya nivîsîn û edebiyatê, ew jî ne ji ber hindê ye ku ew ziman nizm û paşketî ne. Ji bo nimûne nivîsîna bi farisyê nêzîkî duwazde sedan berî niha dest pê kir û dîroka nivîsîna bi kurdî ne bêtir e ji pênc sedan û egera ferqîya vî wextî jî ne ji ber hindê ye ku farisî di warê avahiyê zimanî de ji kurdîyê baştir e yan pêşkeftîtir e. Herweha destpêkirina nivîsînê bi hewramî û kirmancî û soranî û bûna wan wek lehceyên edebî çî peywendî bi avahiyê zimanî (sîstema dengî, peyvê, hevokê û manayê) ye wan lehceyan nebû. Sedem li derveyî avahiyê zimanî, wate di rewşa civakî û abûrî û sîyasî de bûn. Heger lehceyên dî (wek kirmaşanî, dimilî ...) berhemê xwe ye nivîskî nebû ew ne ji ber hindê ye ku ew di warê zimanî de ji hewramî û kirmancî û soranîyê nizimtir in. Herweha jiyana edebî ya sê lehceyan di eynî wextî de dest pê nekir. Hewramî û kirmancî sêsed salan berî soranîyê bûn. Paşdemana soranîyê jî ne ji ber (neresenî) û (paşketina) wê lehceyê bû.

Be serheîdanî nasyonalîzmî Kurd, cîyawazî lehcekan wek kîşeyêkî sîyasî hate rû. Bizûtinewey nasyonalîstî Kurd, wek zorbey hawtakanî, daway netewe û ziman û nîştîmanêkî yekgirtû deka. Le sereta da (1898-1918), kêşey lehcekan be şeweyêkî xoşîskî û piragmatî çareser kira. Lew serdeme da, Kurdistan le nêwan Êran û 'Usmanî da dabeş kirabû û ew Kurdaney kewtibûne Rûsîye jiyânî

'eşîretiyên hebû û çalakî edebîyan destpê ne kirdibû. Xebatî edebî û sîyasî şêwe niwêbaw (modêrn) le pêşda le Kurdistanî 'Usmanî destpêkird. Ew rojname û govaraney ke le salî 1898 he ta şerî Cîhanî Hewel le 'Usmanî bi lawbûnêwe be Kirmancî bûn û carubar babetî Soranîşyan bi lawdekirdewe. Eweş we nebê sîyasetêkî zimanî wuşyarane bûbê, û zortir le ber ewe bû ke Kirmancî zimanekan le barî komeleyetî û ferhengî û sîyasî û abûrîyewe bandest bûn.

Li gel serhildana nasyonalîzma kurd cidahiya lehceyan wek arêşeyeka siyasî hate pêş. Tevgera nasyonalîst ya kurd wek piraniya tevgerên ji wî rengî daxwaza neteweziman û nîştîmanekê yekgirtî dike. Arêşeya lehceyan di destpêkê de (1898-1918) bi awayekê xweristî û pragmatîkî hat çareser kirin. Kurdistan di wî serdemî de di navbera Îran û Osmaniyê de dabeşkirî bû û ew kurdên ketibûn Rûsyayê di jiyana eşîretiyê de bûn û bizavên wan yê edebî dest pê nekiribû. Xebata edebî û siyasî bi şêweyekê modern li berahiyê li Kurdistana osmanî dest pê kir. Ew rojname û kovarên ji sala 1898-ê heta şerê cîhanî yê yekê di ya Osmanî de belavbûne bi kirmancî bûn û wan carûbaran babetê soranî jî belav dikir. Ev jî ne ji ber hindê bû ku siyaseteka zimanî ya hişyar hebû, lê pirtir ji ber hindê bû ku kirmancîziman di warê civakî û ferhengî û siyasî û abûrî de serdest bûn.

Duway şerî Cîhanî Hewel, le Êran û Turkîye û Sûriye zimanî Kurdî serkut kira û îtir lew wîfatane cîyawazî lehcekan ney detuwanî wek kêşeyêkî sîyasî-zimanî bête goşê. Belam le 'Êraq û le Yekêtî Sovêt, Kurdî le nûsîn û xwendin û amrazî rageyandinî giştî û ta radeyêkîş le karî îdarî da dekarhêndira. Le Yekêtî Sovêt, tewawî Kurdekan be lehcey Kirmancî qiseyan dekird û mesele ewe bû ke kam bin-lehcey Kirmancî wek normî** zimanî edebî Kurdî hebjîerin. Le kongirey 1934 Yêrewan da, "Mekitebî Xanî" wek normî zimanî edebî dandira. Le Kurdistanî 'Êraq, le seretawe zorbey nûsînî çapî û îdareyî be Soranî bû leget eweşda ke wek lehceyêkî edebî sedeyêkî zîyatir temen nebû û ta damezranî dewletî 'Êraq hiç govar û rojnamey pê bi law nekira bowe. Hîçkam lew bişyarane, bêcgele bişyarî kongirey Yêrewan, berhemî rawêj û tejbîruşa û lêkofînewe û lêkdanewe û piroseyêkî dêmokratî nebû. Herweha de karhênanî Kirmancî le 'Usmanî û Soranî le 'Êraq, hiç pêwendî be radey pêşikewtûyî yan "resenî" ew lehcanewe nebû; ewey ke dewrî degêra qursayî sîyasî û abûrî axêweranî lehcekan bû. Dîyare rêbazî sîyasî û berijewendî dewlet le 'Êraq hem dewletî 'Êraq û hem Înglîs) û Yekêtî Sovêt (be taybet komarî Sosyalîstî Hermenstan) dewrêkî girîngî gêra.

Zimanê kurdî piştî şerê cîhanî yê yekê li Îran û Tirkîye û Sûriyeyê hat tepeser kirin û êdî cidahiya lehceyan di wan welatan de nedikarî wek pirsgerêkeka siyasî-zimanî bête pêş. Lê kurdî li Îraq û Yekîtiya Sovyetê di nivîsîn û xwendin û amrazên ragihandinê û heta hedekî di karê îdarî de dihat bi

kar anîn. Tevaya kurdan li Yekîtiya Sovyetê bi lehceya kurmanciyê diaxifitin û pirsgirêk ew bû ka ew kîj bin-lehceya kurmanciyê wek norma (***) zimanê kurdî yê edebî hilbijêrin. (Mekteba Xanî) di kongreya 1934-ê de li Yerîvanê wek norma zimanê edebî hat danan. Piraniya nivîsîna çapî û îdarî li Kurdistanê Îraqê bi soranî bû, li gel hindê ku wê wek lehceyeka edebî jiyekê ji sedsalan zêdetir nebû û heta damezrandina dewleta Îraqê çî kovar û rojname pê nehatibûn belav kirin. Çî ji wan biryaran, ji bilî biryarên kongreya Yerîvanê, berhemê şîret û tekbîr û lêkolîn û analîz û proseseka demokratîk nebûn. Hreweha bikaranîna kurmancî li Osmaniyê û Soranî li Îraqê, çî peywendî bi sewiyeya pêşkeftin yan (reseniya) wan lehceyan nebû; ya ku rol tê de didît giraniya siyasî û abûrî ya axêverên wan lehceyan bû. Diyar e di vê de rêbaza siyasî û berjewendiyên dewletê li Îraqê (hem dewleta Îraqê û hem îngilîzan) û Yekîtiya Sovyetê (bi taybetî komara Sosyalîst a Ermenistanê) roleka giring gêra.

Şeî Soranî- Kirmancî le Kurdistanê 'Êraq da sê car hefayîsawe. Her car şergekan û razanewey hêzekan be gwêrey barudox goşawin. Hewel car le 1931da, katêkî dewletî 'Êraq berew "serbexoyî"deroyî û basî dananî "qanûnî luxatî mehelîye" hate goşî, hukûmetî Nûrî Se'îd be biyanûy ewey ke Kurdî fire lehceye deyewîst rêge ne da be resmî kirdinî wek zimanêkî nawçeyî û le heman kat da deyewîst, her bew ew biyanûye, nawçey Badînan te'rîb bika.

Şerê soranî-kurmancî li Kurdistanê Îraqê sê caran ser hil daye. Hecar şervan û giraniya hêzan li gor rewşan hatine guhortin. Cara yekê di 1931-ê de, demê dewleta Îraqê ber bi (serbixwebûnê) diçû û behsê deynana (qanûna luxatên mehelî) peyda bû, hikûmeta Nûrî Se'îdî bi bihaneya hindê ku kurdî pir lehceyî ye, dixwest rê jê re wek lehceyeka mehelî nehêt dan û her bi wê bihaneyê dixwest devera Behdînan erebîze bike.

Duway rûxanî rêjîmî paşayetî le 14-î Temûzî 1958 da, carêkî dî kêşeke serî hefênawe, katêkî dewletî taze damezrawî komar mawey beşî Kurdî radyo Bexday le dû se'at kird be çuwar se'at û Kirmancîş wêray Soranî de karhêndira. Gişt bernamekanî radyo, bêcg le Goranî, le seretawe (safî 1939) be Soranî bûn belam le mewpaş hewaî û çend bernameyêkî dî be Kirmancî Biławdekiranewe. Ew goşane le sîyasetî zimanî beşî Kurdî bas û cedelî werêxist û dû boçûn yan sîyasetî wederxist. Hêfêk pêy wabû mebestî dewletî 'Êraq dûberekî xistine nêwan rêzî Kurd, û zimanî Kurdî her eweye ke le Kurdistanê 'Êraq da le xwêndin û çapemenî da dekadê û axêweraî Kirmancîş debê be Soranî bixwênin û binûsn. Hêfêkî dî pêy wabû zorbeş gelfî Kurd Kirmancî zimanin, edebîyatî kilasîkî Kirmancî kontir û dewlemende, hewel çapemenî Kurdî bew lehceye bûwe, û zimanî edebî Kurdî debê be her dû lehce bê. Le encamî ew cedele da, ew dû rêbaze getale kiran bê ewey pişt estûr bin be tîyorî û zanstîyekanî

zimannasî û sîyasî. Le piratîk da, lehcey Kirmancî wurde wurde le nûsîn da dekar dehat û katêkî duway e Eylûlî 1961 deseîatî Partî Dêmkirat le beşêk le gundekanî Kurdîstanda damezra, "Radyoy Dengî Kurdistan" wek radyoy Bexda be her dû lehce bernamey bihawîrdewe. Eger le saîanî 1931-1932 da, dû berey ew têkheîçûne dewlet û çend roşinbîrêkî Kurd bûn, le saî 1958 da, goşepanî şeîeke goşdira. Ew car kêşeke le nêwan dû berey roşinbîrî Kurd weşê kewit.

Pirsgirêkê careka dî piştî jinavçûna rijêma paşatîyê di 14/7 1958-ê de ser hilda ve, demê dewleta komarî ya nû damezrandî û wextê beşê kurdî yê radyoya Bexdayê ji du seetan kirî çar seet û kurmancî jî li gel soraniyê hat bi kar anîn. Gişt programên radyoyê, ji bilî stiranên, ji destpêkê ve bi sroanî bûn, lê piştî wê çendê nûçe û çend programên din bi kurmancî hatin belav kirin. Wê guhortina di siyaseta zimanî ya beşê kurdî de behs û cedel çê kir û du dîtin yan siyaseta derxistin holê. Bi dîtina aliyekî, mebesta dewleta Îraqê çêkirina duberekîyê bû di nav rêzên kurdan de, zimanê kurdî her ew e yê ku li Kurdistanê Îraqê di xwendin û çapemeniyê de dihêt bi kar anîn û divêt axêverên kurmancî jî bi soraniyê bixwînin û binivîsin. Dîtina aliyê dî jî ew bû ku piraniya gelê kurd kurmancîziman e, edebiyata kurmancî kevintir û dewlemend e, çapemeniya kurdî ya yekê bi wê lehceyê bû, divêt zimanê edebî yê kurdî bi herdu lehceyan be. Ew du rêbaz di encama wê cedelê de, bê piştevaniya teorî û zanistên zimannasî û siyasetê çê bûn. Lehceya kurmancî di pratîkê de piç piç di nivîsînê de dihat bi kar anîn û li demê piştî îlona 1961-ê desthilata Partiya Demokrat li beşêkî ji gundên Kurdistanê bi cih bû, (Radyoya Dengê Kurdistanê) wek radyoya Bexdayê, program bi herdu lehceyan belav kirin. Heger di salên 1931-1932-ê de ew du berokên wê hevrûbûnê dewlet û çend rewşenbîrên kurd bûn, di sala 1985-ê de meydana şerî hat guhortin. Wê carê pirsgirêk di navbera du berokên (blokên) rewşenbîrî yên kurdî de bi rê ket.

Diyare le serdemî hîçkam lew pêkwerbûnane da, gelî Kurd deseîatî sîyasî be şewey xudmuxtari yan serbexoyî nebû. Belam duway destpêkirdinî şeî çekdarî 1961, dekarhênanî Kirmancî le "RadYoy Dengî Kurdistan"î Partî Dêmkiratî Kurdistan da derîxist ke kêşey dû lehcekan da nemirkawe û le dahatu da ser heîdedatewe.

Diyar e gelê kurd di serdemê hîç yekê ji wan pevçûnan de desthilata sîyasî bi şeweyê otonomî yan serbixwe nebû. Lê piştî destpêkirina şerê çekdarî yê 1961-ê û bikaranîna kurmanciyê di (Radyoya Dengê Kurdistanê) ya Partiya Demokrat ya Kurdistanê de diyar bû ku pirsgirêka dulehceyan netemiriye û ew dê di paşerojê de serî hîlbide ve.

Ke le 1991 da desełatî dewletî 'Êraq le ser beşêkî Kurdistan laçû, axêweranî Kirmancî bê ewey çaweruwani bişyarî hîzbekan yan roşinbîran bin, bişyaryan da ke lehcey edebî xoyan de karbênin. Êste xelik le nawçey Badînan, le derewey desełatî dewletî Kurd (Hukûmetî Herêm), le dûkan û xuwardinge û mîwanxane, kûçe û kołan, rêgauban, ser berde qebiran, û le her cêyêk ke nûsîn de karbê, be le hcey xoyan denûsn. Le çend cêgeş ke le jêr hukmî dewletî Herêm daye, wek zanko, desełatî zimanî dirawe be lehcey Kirmancî. Êste aşkraye ke le medresey seretayî û nawendîş da, daway deris xwêndin be Kirmancî deken. Eweş seyr nîye û debê çaweruwani bikrê. Eger le safanî 1920-1930 da le Badînan tuwêjêkî roşinbîrî be hêz pêk ne hatibû, êste tuwêjêkî berîn û hemeregey roşinbîr, be jin û pîyaw, bişyarî dawey ke Kurdî zimanêkî fire lehce û dû-standardê. Ca seyr nîye ke berey Soranî xuwazî êsta nîgeranî desełatî Kirmancî bê û bîyewê be zebrî hêzî dewlet ew desełate le axêweranî Kirmancî bistênêtewe û be bernamey welanan û sûk kirdin û heşeşe kirdin, Soranî bika be zimanî yekgirtû û standardî "bira gewre" û Kirmancî û axêweranî bika be bira çikoê.

Ku di 1991-ê de desthilata dewleta Îraqê ji ser beşekê Kurdistanê rabû, axêverên kurmanciyê bê ku li benda biryara hizban yan rewşenbîran bin, biryar da ku ew lehceya xwe ya edebî bi kar bînin. Niha xelik li devera Behdînan, li derveyê desthilata dewleta kurd (hikûmeta herêmê) li dikan û xwaringeh û mêvanxaneyan, li tax û kolanan, li ser rêbaran, li ser berên qebiran, li ser her ciyekê nivîsîn bihêt bikaranîn, ew bi lehceya xwe dinivîsin. Li çend cihan jî ku ew li bin desthilata dewleta herêmê de ne, wek zanîngehê, desthilata zimanî daye lehceya kurmancî. Niha aşkere ye ku ew di medreseya destpêkê û navincî de jî daxwaza dersxwendina bi kurmancî dikin. Ev jî ne xerîb e û divêt bihêt çaverê kirin. Heger di salên 1920 û 1930-an de li Behdînanê texeka rewşenbîrî ya bi hêz pêk nehatibû, niha texeka berfereh û rengîn ya rewşenbîr, bi jin û mêran ve biryar daye ku kurdî zimanekê pîrlehceyî û du-standard e. Evca ne xerîb e ku bilokê soranîxwaziyê niha nerehet be ji wê desthilata kurmanciyê û bixwaze bi topizê hêza dewletê wê desthilatê ji axêverên kurmanciyê bistîne û bi programa redkirin û bêqîmetkirin û geflêkirinê, soraniyê bike zimanê yekgirtî û standardê (birayê mezin) û kurmanciyê û axêverên wê bike (birayê biçûk). Lê (biramezinî), hem di urf û adetên de û hem di siyasetê de berhemê civaka derebegiyê ye û kurmancîziman jî naxwazin bi çî rengêkî bibin bi xwişka biçûk û birayê biçûk. Ev pîrsgirêka newekheviyê ye û ew bi berdestkirina wekheviyê têt çareserkirin. Ew pîrsgirêka zimanî di binyatê xwe de pîrsgirêkê demokrasiyê ye.

Belam "bira gewreyî", hem le dab û nerît da û hem le sîyaset da, berhemî komeşgey Derebegî ye û Kirmancî zimanekan nayanewê be hîç biyanûyêk bibin be xuşke çikote û bira çikote. Kêşeke, kêşey naberaberî ye û ew naberaberî yeş be dabînkirdinî mafî beraberî çare serî dekirê. Ew kêşe zimanîye, le binçîne da, kêşey dêmokirasî ye.

Lê "biramezinî, hem di urf û adetan de û hem di siyasetê de berhemê civaka derebegiyê ye û kirmancîziman jî naxwazin bi çî renekî bibin bi xwişka biçûk û birayê biçûk. Ev pirsgirêka newekheviyê ye û ew bi berdestkirina wekheviyê têt çareserkin. Ew pirsgirêka zimanî di binyatê xwe de pirsgirêkeka demokrasîyê ye.

Dîyare resmî kirdin -- çî yek lehce (Sorani) bê yan dû lehce (Sorani û Kirmancî) -- kêşeyêkî aloz û fire layene, belam zortir le goşepanî sîyasetî zimanî da xul dexwatewe. Wek kêşeyêkî sîyasî. her kes boy heye basî bika, layen bigrê û rêniwênî bika. Lew kêşeye da, wek her kêşeyêkî sîyasî, pêwîste tegbîruşa be şeweyêkî berîn û cemawerî berêwe biçê. Pêwîste pirs be axêweranî lehcekan, hem xwendewar û hem nexwendewar, bikrê û wîst û nîyaz û dawakarîyekeyan bibête binçîney sîyasetî zimanî û bernamey zimanî. Desteyêk roşinbîr û sîyaset be destî Sorani ziman nabê ew mafe be xoyan biden ke Kirmancî wek lehceyêkî duwakewtû le karwanî medenîyetî Sorani le qelem biden, xoyan biken be "bira gewre" û fitway jêrçepokeyî Kurmancî û axêweranî biden.

Diyar e resmîkirin -çî yek lehceyê (sorani) be yan du lehceyan (sorani û kirmanciyê- pirsgirêkeka aloz û piralîyane ye, lê ew bêtir axê ji qada siyaseta zimanî dixwe. Wek arêşeyeka siyasî her kesî mafê behsikirinê heye, mafê hindê heye ku alîgirî û rênişanderiyê bike. Divêt di wê pirsgirêkê de wek di her pirsgirêkeka siyasî de, tekbîr û ra bi awayekê berferêh û cemawerî bi rê ve biçê. Divêt pirsîyar ji axêverên lehceyan, hem xwendewar û hem nexwendewaran bihêt kîrin û hezkîrin û daxwazên wan bibin bingehe siyaseta zimanî û programa zimanî. Nabe desteyeka rewşenbîr û siyaseta bidestên soranîziman wî mafî bidin xwe ku ew kirmanciyê wek lehceyeka paşketî ji karwanê medeniyeta soraniyê li qelem bidin. Ew xwe bikin "birayê mezin" û fetwaya bindestîya kirmanciyê û axêverên wê bidin.

Le ew basaney ke be duway bişawbûnewey namey Pencawsê nefer werêkewtûwe, zor car çemk û zaraway here girîngî ew babete be şeweyêkî naşt û nabecê de karhêndirawin. Bo wêne "zimanî standard" û "zimanî resmî" û "zimanî yekgirtû" têkef dekirên û cîyawazîyekanyan deşewêndirên. Ba

nimûneyêk bigêrmewe le serdêrêkî jimarey 6 y Rûdaw ke be gêranewe le zutûwêjêk nûsîwêtî:standerayz kirdinî zimanî Kurdî pêwîstî be biryarêkî sîyasî heye."

Di wan behsên ku piştî belavbûna nameya wan pêncihûsê neferan de hatine belav kirin, gelek caran konsept û termên herî giring yên vî babetî bi şeweyekê nerast û ne di cih de hatin bi kar anîn. Wek mînak, (zimanê standard) û (zimanê resmî) û (zimanê yekgirtî) dihên têkel kirin û ferqiyên wan tên tevlihev kirin. Bila ez nimûneyekî berçav bikim ku di binnivîseka hejmar 6-ê ya ya Rûdawê de, ku ji suhbetekê hatiye wergirtin, weha nivîsiye: »Standerayzkirina zimanê kurdî pêwîstî bi biryareka siyasî heye« (12/5 2008, r. 12).

Carê le pêşda, wuşey "standerayz", ke bê ewey pêwîst bê le Înglîsî xwazrawe th, hele ye û le Ingîlîsî da"standardized". Duwaye, le ew serdêre da, standard kirdin leget resmî kirdin têkel kirawe. Dekrê be biryarî dewletî lehceyêk resmî bikrê belam standard kirdin tenya be hêzîdewlet pêk naya. Ziman detuwanê standard bê û resmî nebê (Înglîsî le Emrîka, be qanûn û be destûr, zimanî resmî nîye). Herweha, zimanêkî standardîş nebûbê detuwanê resmî bikrê.

Carê di berahiyê de, peyva standrayz bê ku pêwîst be, ku ji îngilîziyê hatiye wergirtin, şaş e û ew di îngilîziyê de standardaiz e. Paşî, di wê sernivîsê de standardkirin li gel resmîkirinê hatiye têkel kirin. Lehceyek dikare bi biryara dewletekê bihêr resmî kirin, lê standardkirin nikare bi tenê bi hêza dewletê pêk bihêr. Ziman dikare standard be û resmî nebe (îngilîzî li Emerîkayê, bi qanûn û destûrê ne zimanê resmî ye). Herweha zimanekê ku ne standard be jî dikare bibe zimanekê resmî.

Standardkirdinî ziman kêşeyêkî tenya zimanî nîye û le pêşda sîyasîye. Belam wek her kêşeyêkî sîyasî, herweha piroceyêkî goşanî mêjûyî, zimanî, komeleyetî, abûrî, û îdeolojî ye. Pirojey resmî kirdinî lehcey Soranî mîlmilanyêkî sîyasîye bo dabeşîkrdinewey deselat, û sîyase te le goşepanî ziman da. Mebest le sîyasetîş tenya hîzbayetî nîye. Lew zincîre basane da, kêşey zimanî resmî Kurdî lêkdedemewe be umêdî ewey yarmetî bida be rûn bûnewey layene tîyorî, zimanî, mêjûyî, sîyasî, û îdeolojîyekanî ew kêşe ye. Le şewazî nûsîn da rêbazî Goran û Hêmin û Secadî reçaw dekem û xom le petî kirdinî sereşoyane deparêzim.

Standardkirina zimanî ne arêşeyeka bi tenê zimanî ye lê ew di pêşiyê de siyasî ye. Lê ew wek her arêşeyeka siyasî, herweha projeyeka guhortina dîrokî, zimanî, civakî, abûrî, ideolojî ye. Projeya resmîkirina lehceya soranî hevrikaniyeka siyasî ye bo dabeşkirina desthilat, siyasetê di qada zimanî

de. Mebest ji siyasetê jî ne bes bi tenê hizbatî ye. Ez di zîncîra van behsan de dê pirsgirêka zimanê kurdî yê resmî şirove bikim bi hêviya ku ew arîkar be ji bo zelalkirina aliyên teorî, zimanî, dîrokî, siyasî û idiolojî yên vê pirsgirêkê. Ez di şêwazê nivîsînê de rêbaza Goranî û Hêminî û Secadî li ber çav digirim û ez xwe ji petîkirina serpiyane diparêzim.

www.arasivakurdî.org

Gorani Influence on Central Kurdish

Dr. Michiel Leezenberg

Introduction

The vernaculars spoken by the Kurds fall in two groups, each again being divided into two main dialect groups. The great majority of the Kurds speak a variety of the so-called Kurmanci or Sorani dialects; smaller numbers speak Gorani or Zaza. Although the latter two dialects are close relatives of the former two, they do not strictly speaking belong to the same branch of Indo-Iranian languages. Nonetheless, both groups are commonly thought to belong to the Northwestern group of Iranian languages.

A fact of particular interest is that Sorani shares a number of clearly contact-induced features with Gorani; we can then ask what kind of contact was involved. I would like to pose this question against the background of some recent theoretical work on language contact, especially Thomason & Kaufman (1988). These authors argue that there are no linguistic constraints on the results of language interference; it is rather the sociolinguistic history of the speakers that primarily determines the linguistic outcome (p.35). Furthermore, they distinguish two basic types of interference: interference with language shift (traditionally better known as substratum) and borrowing with language maintenance. These two, they argue, have distinct linguistic results. Substratal influence need not involve extensive lexical borrowing: it typically starts with phonology and syntax, and to a lesser extent the inflectional morphology (p.39). In borrowing, by contrast, both languages are maintained throughout the period of interference; lexical items, especially items of nonbasic vocabulary, are invariably the first borrowed elements; more intensive contact may also lead to the borrowing of structural (i.e., phonological and syntactic) elements. For borrowing, but not for substratal influence, a prolonged contact between the source and the target language is necessary (p.41).

I would like to use this theoretical framework to focus on specific kinds of questions relating to the language contact phenomena mentioned above. MacKenzie (1961b: 86) argued that the

grammatical features distinguishing Sorani from Kurmanci are due to a Gorani substratum, i.e., to traces of the language spoken in the area before a presumed 'Kurdish invasion'.

My main argument, presented in part 3 of this paper, will be that these closer affinities between Central Kurdish and Gorani are best seen not as a substratum (presumably preceding the Mongol invasions), but rather as prestige borrowings of a much later date, probably not before the seventeenth century. This process need not have involved any serious language shift among the Gorani population, as an account in terms of substratal influence would imply.

Because of the relative unfamiliarity of the terrain, I will start with a survey of the Kurdish dialects in the wider sense, including a brief mention of their most salient grammatical and sociolinguistic characteristics. It turns out that there are two distinct senses of the expression 'Kurdish dialect': the one being 'dialect of the Kurdish branch of Northwestern Indo-Iranian languages', and the other 'dialect spoken by people who consider themselves Kurds'. Failure to distinguish these two senses may easily lead to needless confusion and polemics: ethnic developments should not be confused with linguistic reconstructions. Because of the lack of adequate linguistic and sociolinguistic information concerning many of the dialects involved, much of this paper is of necessity tentative and rather programmatic, at times even speculative. Moreover, the argument requires the combining of purely linguistic data with historical and sociolinguistic, if not sociological, considerations. I realize that to do so is to court disaster, the more so since in none of these areas can I claim any expert knowledge. However, I think that an approach like the one outlined here may be fruitful for seeing things in their proper perspective.

1. Kurdish dialects and 'Kurdish' dialects

Among the dialects spoken by the Kurds, there are, first, what MacKenzie (n.d.) calls the Northern Kurdish dialects, spoken by most Kurds in Turkey, Syria, the northernmost parts of Iraqi Kurdistan, and in a number of former Soviet Republics.⁽¹⁾ These dialects are better known as Kurmanci, or, to Iraqi Kurds, as Badini. The Boti or Cizre variety of Kurmanci can boast the greatest literary monument of the Kurdish language, the seventeenth century epic Mem u Zin. This literary reputation of Kurmanci, and the fact that the most important political and intellectual leaders of the Kurds in the 19th century (such as Bedir Khan Beg, the last emir of the influential Botan principality centered around Cizre, and his partly European-educated offspring) were Kurmanci speakers, made it most

likely that if the Kurds were going to have a literary language at all, this dialect would at its basis; in fact, the efforts of Emir Celadet Bedir Khan in Syria in the 1930s (ultimately published as Bedir Khan and Lescot 1970) to create a written form of Kurmanci in the Latin alphabet were as much a normative attempt at standardization as a first serious descriptive study of the Boti subvariety.(2)

However, sociopolitical circumstances, most importantly the total prohibition of both spoken and written Kurdish in the newly founded Republic of Turkey since the 1920s, have largely blocked the natural growth of the Kurmanci dialect into a standardized language for education and mass communication. Only in Soviet Armenia did Kurmanci develop smoothly into a standardized and written language at all; in Turkey, the early 1990s have seen an explosive growth of semi-clandestine publications in and on Kurmanci in Turkey, based upon Bedir Khan's work and, to some extent, upon research done by Kurds in exile. In Iraqi Kurdistan, a few books in Kurmanci written in Arabic characters have appeared, but Kurmanci has never acquired the same status as an official language as Sorani.

The Kurmanci dialects have a case inflection for nouns and pronouns; the verb has a present and a past tense root; there is no passive conjugation, but an analytic passive is formed with the auxiliary verb *hatin*, 'to come'. The most salient phonetic characteristics will be listed in table 1 below. Syntactically, the most famous feature of Kurmanci is the ergative construction in the past tense forms of transitive verbs, as opposed to a nominative-accusative construction in the present tense. The verb here agrees with the logical object, which, though in object position, stays in the absolutive case:

Ez	wî	dibînim
I_[abs]	he_[obl]	see_[lsing.pres]
'I see him'		
Mim	ew	dît
I_[obl]	he_[abs]	see_[3sing.pret]
'I saw him'		

In constructions involving the reflexive pronoun *xwe*, which does not receive any marking for case or person, this yields an 'impersonal' construction with the third person singular verb form in the past tense:

Ez	<i>xwe</i>	dibînim
I_[abs]	self	see_[lsing.pres]
'I see myself'		

Min	<i>xwe</i>	dît
I_[obl]	self	see_[3sing.pret]
'I saw myself'		

In some of the spoken subvarieties of Kurmanci, however, this ergative construction is apparently eroding, and developing into a double accusative, or even a subject-object construction.(1)

Second, the Central Kurdish dialects, also called Kurdi or, more often, Sorani, after the dialect of Sulaimaniya. They also comprise, among others, the Mukri dialect, spoken around the town of Mahabad in Iranian Kurdistan. In Kurdistan of Iraq, these dialects are spoken south of the Litfie Zab river.

Sorani was the court language of the Baban court at Sulaimaniya, where the then British consul, Claudius James Rich, spent some time (cf. Rich 1836).

This principality emerged at the turn of the 18th-19th century, and in the course of time came to overshadow the nearby court of Erdelan, located in Senna (Sanandaj), which had hitherto been the most important Kurdish principality in the Southern area.(1) In 1919, the British mandate authorities in Iraq decided to develop this dialect into the language for official use and in education, although literary texts had not been written in it before the early nineteenth century (cf. Hassanpour 1989: 66-7). Consequently, at the same time when Kurmanci was being forcibly suppressed in Turkey, the Sorani dialect was introduced by the British mandate authorities in Iraq as the official language of the Kurds there, and it has 'remained so ever since. Though spoken by a smaller number of people than Kurmanci, Sorani has thus had much better opportunities to adapt itself to the needs of modern mass communication. This development has had problems of its own, however: when Sorani was introduced as the official language of instruction in Iraqi Kurdistan, Badini (i.e. Kurmanci)

speakers in Amadiya at first preferred to send their children to schools where Arabic was the instruction language.(2) Moreover, it seems that in the 1980s, the opportunities for education in Kurdish were steadily declining as a result of attempts at arabization by the Baath government. The most distinctive features of Sorani are the loss of the case system, a passive morpheme -rêe/-ra- and the employment of suffixed forms of personal pronouns, which in transitive verbs are placed between the verbal prefix and the stem; in the preterite, inflection is dependent on whether the semantic Agent and Patient are expressed in a noun, an independent pronoun, or a clitic:(3)

'e-	tan	bîn-	im
pres.	you (p1.)	see_[pres]	1sing
I see you (p1.)			

nard-	im-	ît
send[pret]-	1sing	2sing
'I sent you'		

êwe-	m	dît
you(pl.)	1sing	see_[pret]
(êwem dît) 'I saw you'		

gurgekan-	im	dît-	in
wolf-det-plur	1sing	see_[pret]	3plur
(gurgekanim dîtin) 'I saw the wolves'			

Unlike Kurmanci, Sorani requires that the reflexive pronoun xo- receive a suffixed personal pronoun:

xo-t	'e-sho-y	
self_[2sing]	imperf-wash_[pres]	2sing
(xote shoy)	'You wash yourself'	

A minor third dialect group, which is related to the two mentioned thus far, consists' of the 'Southern Kurdish dialects, which are spoken in the south-eastern part of Kurdistan, especially around Kermanshah. According to MacKenzie (n.d.), they shade off into the Luri dialects. The vernacular spoken by the shi'ite Feyli Kurds, who used to live in the urban centers of Southern Iraq before being deported to Iran almost in their entirety in two subsequent waves in 1971 and 1980, apparently also belongs to this dialect group, although its precise position is unclear, as is that of Lakki. Several informants told me that in Iraqi Kurdistan, Luri is still spoken around Khanaqin and Mandali, and that there are, or have been, pockets of Lakki south of Arbil, and near Kirkuk. Little research has been done on these dialects, which lack a written literature; some of them, however, seem to have developed an impressive oral literary tradition (see Mann 1910 for dialect samples of Luri and Feyli).

Next, there are the Gurani or Gorani varieties, spoken by far fewer people than either Kurmanci or Sorani. Several distinct dialects of Gorani proper are spoken in Hawraman in Iranian Kurdistan and further south, and right across the border in Iraq; these varieties are most commonly called 'Hawrami' or 'Hawramani' by locals.(1) However, in Iraqi Kurdistan, there are various pockets of distinct ethnic groups speaking dialects closely akin to Gorani (see dialect map). To begin with, the Bajalan, partly living near Khanaqin, and partly north of Mossul, in the Khosar valley. Next, there are the Shabak, also living near Mossul. The precise linguistic and ethnic relations between the Shabak and the Bajalan are far from clear; earlier authors, e.g. Minorsky (1943: 76) and MacKenzie (1956: 418-420) use the terms 'Bajalan' and 'Shabak' as practically synonymous(2), but it seems that they actually should be kept distinct. Ethnically, the two are certainly different, the Bajalan being tribally organized and probably heterodox Sunnis, and the Shabak nontribal heterodox Shi'ites;(3) there are also some linguistic differences between the Bajalani from Arpachi recorded by MacKenzie 1956 and the Shabak samples I collected with the aid of a Shabak from Qahrawa village.(4) For example: Shab. *çaw*, 'eye' vs. Baj. *çam* (but Shab. *ziman*, 'tongue, language' vs. Baj. *ziwan*); Shab. *shime*, *oshan*, 'you (p1.), they' vs. Baj. *êshma*, *êshan*. There are also slight differences in e.g. numeral expressions and verbal morphology, but otherwise, the two dialects seem closely related; cf. Shab. *emin zilam ê metî*, 'I see the man', *emin zilamem tît*, 'I saw the man' with Baj. *sara yânat mat î*, 'tomorrow I'll see your house', and *emin zilamem tît*, 'I saw the man'.(5)

Another important ethnic group speaking a Hawrami variety are the Kakai, also called Ahl-e Haqq, Ali-Ilahi or, in Iran, Yaresan, who have a distinct religion and a religious literature partly written in New Persian, and partly in a Hawrami koine. Not all Kakai have Hawrami as their mother tongue: there are also Turcoman- and Sorani-speaking Kakai, and even some speaking Arabic in Mandali, Baquba, and Khanaqin; and, of course, a good number of them (as of other groups) speak several of these languages.

